



K.T.

ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ  
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEEYÊ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

**RABÊJA NETEWEPERWERIYÊ DI  
ROMANÊN KURDÊN SÛRIYEEYÊ DE**

Murat IŞÇI  
20711012

Şewirmend  
Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn-2022

K.T.  
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ  
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEEYÊ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

**RABÊJA NETEWEPERWERIYÊ DI  
ROMANÊN KURDÊN SÛRIYEEYÊ DE**

Murat İŞÇİ  
20711012

Şêwirmend  
Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn-2022

# TAAHHÜTNAME

## TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**Rabêja Neteweperweriyê Di Romanên Kurdên Sûriyeyê De**” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../.....

Murat İŞÇİ

## KABUL VE ONAY

**Murat İŞÇİ** tarafından hazırlanan Rabêja Neteteweperweriyê Di Romanên Kurdên Sûriyeyê De adındaki çalışma, 20.10.2022 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından ..... Anabilim Dalı, ..... Bilim Dalında (varsa) **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[ İ m z a ]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

Enstitü Müdürü

## PÊŞGOTIN

Piştî şoreşa Fransayê sloganên bi vî rengî belav bûn: Azadî, Wekhevî, Biratî... Van sloganên cudahiya navbêra xizan û dewlemend, bajarî û gundiyan, ji holê rakir û rê li ber netewebûnê vêkir. Helbet van ramanan ji valahiyê derneket, bi saya xurtbûna pîşesaziyê, qelsbûna îdeolojiya dînî, hilweşîna monarşiyê û pêşketinên zanistî pêş de çû û cihê xwe xurt kir. Ev pêla neteweperweriyê ewil belavî nava Ewropayê dûre jî belavî cihê herî biçûk ê cîhanê bû. Kurd jî hinek dereng be jî ji vê ramana nû para xwe girtin.

Piştî serhildanên Kurd têk çûn û komara Tirkiyê ava bû şûnde rewşenbîr berê xwe dan derveyî welêt bi taybetî jî binxetê ango Sûriyeya di bin mandetariya Fransayê de. Wan kesên hatin herêma Kurdan bi xwe re fikr û ramanên neteweperweriyê jî anîn. Di nav wan kesan de kesayetên girîng û dihat nasîn jî hebûn. Dr Nafîz û birayê wî Nûreddin Zaza, Osman Sebrî, Qedrîcan, Haco Axa, Memdûh Selîm Beg, Ekrem Cemîlpaşa, Qedrî Cemîlpaşa û birayên Celadet û Kamiran Bedirxan, hinek ji wan navan bûn. Ev rewşenbîr li koçberiyê jî vala nesekinîn û ketin nav xebatên siyasî. Ji xebatên wan rexistina Xoybûnê derket. Xoybûn di sala 1927an de li bajarê Lubnanê ava dibe û serokê pêşîn Celadet Bedirxan e. Piştî serhildana Agiriyê jî têk çû Celadet Bedirxan berê xwe da karên rewşenbîrî û kovara Hawar û Ronahiyê weşand. Van xebatan bandoreke erênî li rewşenbîr û gelê Kurdên Sûriyeyê kir. Ev reha neteweperwer piştî salan, zîl da û şax jî veda pê re têkildar jî li herêma Kurd lê dijiyan hestên neteweperwer ji nifşekî veguhezî nifşekî din.

Roman zarokê serdema modern e. Wek ramana neteweperweriyê roman jî dereng gihîşt vê erdnigariyê. Romana ewil a cîhanê wek Don Kîşot tê qebûl kirin. Don Kîşot ji aliyê Miguel De Cervantes ve hatiye nivîsîn û di sala 1605 an de jî weşiyaye. Romana ewil a kurdî jî di sala 1935 an de ji aliyê Erebe Şemo ve bi navê Şivanê Kurmanca li Erîvanê hat weşandin. Romana Kurdî ya ewil ji nav nivîskarên Kurdên Sûriyeyê, yê Dr Azad Elî (Azad Bavê Şahin) ye. Romana wî di sala 1991an de li Beyrûdê bi navê *Yên Perîşan* hatiye çapkirin. Bixwe pîranî roman jî ji ber qedexeya li ser ziman li derveyî Sûriyeyê hatine çapkirin.

Çawa netewedewlet û neteweperwerî kirûyeke nû bû roman jî cûreya wêjeyê ya vê serdema nû bû. Her du kirû mil dan hev û bi saya hev pêşketin. Êdî qinaeteke giştî heye ku di avakirina nasnemeya neteweyî de rola wêjeyê bi taybetî jî ya romanê pir girîng e. Em ê jî hewl bidin ku vê têkiliyê di nav romanên Helîm Yusiv (*Tirsa Bêdiran*), Fawaz Husên (*Piçek Jiyan Qetek Asiman*), Jan Dost (*Kobanî*), Bêwar Brahîm (*Li Bin Sîwana Xweziyan*) û Jana Seyda (*Jineke Mirî Li Cihangirê*) de bigerin.

Di serî de spasdarê mamosteyê xwe yê şewirmend Dr. Mustafa Aslan im. Her tim bi germahî û eleqeyeke mezin nêzî xebatê bû û bi pêşniyarên xwe naveroka xebatê dewlemendtir kir. Spasiyên xwe pêşkêşî endamên jûriye Dr. Abdurrahim Özmen û Dr. Mustafa Öztürk dikim ku bi nirxandin û pêşniyarên xwe xebata min xurt kirin. Herweha spasdarê hevalên xwe Mem Mukrîyanî û Rêger Mukrîyanî me ji bo xwendin û alîkariya wan. Helbet spasdarê hevjinê xwe Narînê me ji ber sebra wê û keça xwe Aryayê me ji ber fahmdariya wê.

**Murat İşçi**

**Cotmeh 2022**

## KURTE

Di vê xebatê de li ser romanên nivîskarên Kurd ên bi eslê xwe ji Sûriyeyê ne hat rawestandî û xebat jî romanên ku ji aliyê nivîskarên Kurd ve û bi Kurdî hatine nivîsîn, hat bisînorkirin. Ev bixwe jî qadeke gelekî berfireh bû ji bo vê xebatê. Hinek ji romanûsên Kurdên Sûriyeyê ev bûn: Dr. Azad Elî (Azad Bavê Şahin), Pîr Rustem, Abbas Abbas, Fawaz Husên, Xemgînê Temê, Şahînê Bekirê Soreklî, Helîm Yûsiv, Jan Dost, Mihemedê Seyid Husên, Arşevê Oskan, Bêwar Brahîm, Dîlan Şewqî, Jana Seyda. Ji nav wan pênc nivîskar û romanekê wan hat hilbijartin. Romanên hat hilbijartin ji aliyê wêjeya estetîkî ve xurt bûn û ji bo temsîliyeta romanûsiya Kurdên Sûriyeyê jî bes bûn. Ji ber ku hilbijartina nivîskar û romanên zêde, ew ê me têxista dafika dubarebûnê. Nivîskar û romanên hat hilbijartin jî ev bûn: Helîm Yusiv (*Tirsa Bêdiran*), Fawaz Husên (*Piçek Jiyan Qetek Asiman*), Jan Dost (*Kobanî*), Bêwar Brahîm (*Li Bin Sîwana Xweziyan*) û Jana Seyda (*Jineke Mirî Li Cihangirê*) ye. Di navbera roman û avakirina Rabêja Neteweperweriyê de tekiliyeke xurt heye. Di vê peywendê de di romanên navborî de rengvedanên Rabêja Neteweperweriyê hat vekolandin. Di encama vê lêkolînê de hat dîtî ku bi awayekî zelal her pênc roman jî di nava xwe de rabêjeke xurt a neteweperweriya Kurd dihundirînin.

**Peyvên Sereke:** Nasname, Neteweperwerî, Kurdên Sûriyeyê, Roman.

## ÖZET

Bu çalışmada köken olarak Suriyeli olan Kürt yazarların romanları üzerinde duruldu ve çalışma da Kürt yazarlar ve Kürtçe yazılan romanlar ile sınırlandırıldı. Bu bile bu çalışma için oldukça geniş bir sahayı oluşturuyordu. Bazı Suriyeli Kürt yazarlar şunlardı: Dr. Azad Elî (Azad Bavê Şahin), Pîr Rustem, Abbas Abbas, Fawaz Husên, Xemgînê Temê, Şahînê Bekirê Soreklî, Helîm Yûsiv, Jan Dost, Mihemedê Seyid Husên, Arşevê Oskan, Bêwar Brahîm, Dîlan Şewqî, Jana Seyda. Bunların arasından beş yazar ve birer romanları seçildi. Seçilen romanlar edebiyat estetiği açısından güçlüydüler ve Suriyeli Kürt romancılığının temsiliyeti için de yeterliydi. Çünkü daha fazla yazar ve romanın seçilmesi bizi tekrar tuzağına düşürecekti. Seçilen beş yazar ve romanları da şunlardı. Helîm Yusiv (*Tirsa Bêdiran*), Fawaz Husên(*Piçek Jiyan Qetek Asiman*), Jan Dost(*Kobanî*), Bêwar Brahîm (*Li Bin Sîwana Xweziyan*) û Jana Seyda (*Jineke Mirî Li Cihangirê*). Roman ve milliyetçi bir söylem oluşturma arasında güçlü bir ilişki vardır. Bu bağlamda adı geçen romanlarda milliyetçi söylemin yansımaları incelendi. Bu incelemenin sonunda açık bir şekilde görüldü ki her beş romanda da çok güçlü bir Kürt milliyetçi söylem vardı.

**Anahtar Kelimeler:** Kimlik, Milliyetçilik, Suriye Kürtleri, Roman.

## ABSTRACT

In this study, It was focused on the novels of Kurdish writers who were originally from Syria, and the study was limited to Kurdish novelists and novels written in Kurdish. Even this constituted a fairly wide field for this study. Some Syrian Kurdish novelists were Dr. Azad Elî (Azad Bavê Şahin), Pîr Rustem, Abbas Abbas, Fawaz Husên, Xemgînê Temê, Şahînê Bekirê Soreklî, Helîm Yûsiv, Jan Dost, Mihemedê Seyid Husên, Arşevê Oskan, Bêwar Brahîm, Dîlan Şewqî, Jana Seyda. Among these, five novelists and one of their novel were selected. The novels has been chosen were strong in terms of literary aesthetic and were sufficient to represent Syrian Kurdish novelism. The five novelists that were chosen fort his study and their novels were: Helîm Yusiv (*Tirsa Bêdiran*), Fawaz Husên (*Picek Jiyan Qetek Asiman*), Jan Dost (*Kobanî*), Bêwar Brahîm (*Li Bin Sîwana Xweziyan*) û Jana Seyda (*Jineke Mirî Li Cihangirê*). There was a strong correlation between creating a novel and a nationalist discourse. In this context, the reflections of the nationalist discourse in the aforementioned novels were examined. As a result of this analysis, it was clearly seen that there was a very strong Kurdish nationalist discourse in all five novels.

**Keywords: Identity, Nationalism, Syrian Kurds, Novel.**

## KURTEBÊJE

**amd.:** amedakar

**dnd.:** di nav de

**h.b. :** heman berhem

**h.r.:** heman rûpel

**h.w.d. :** her wekî din

**j. :** jimar

**r. :** rûpel

**s.s. :** sedsal

**wer.:** wergêr

## NAVEROK

<b>PÊŞGOTIN</b> .....	<b>I</b>
<b>KURTE</b> .....	<b>III</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>IV</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>V</b>
<b>KURTEBÊJE</b> .....	<b>VI</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
<b>BEŞA YEKEM: NETEWEPERWERÎ</b> .....	<b>8</b>
1.1.NASNAME Û NASNAMEYA NETEWYÎ .....	8
1.2. ETNÎSÎTE Û NETEWE .....	11
1.3. SERENCAMA NETEWEPERWERIYÊ .....	14
1.4. NÊRÎNA PRÎMORDIYALÎST .....	15
1.5 NÊRÎNA MODERNÎST .....	17
1.5.1. Nêzîkatiya Civakî-Aborî.....	18
1.5.2. Nêzîkatiya Civakî-Çandî.....	19
1.5.3. Nêzîkatiya Sîyasî .....	20
1.5.4. Nêzîkatiya Îdeolojîk.....	22
1.5.5. Nêzîkatiya Înşayî .....	24
1.6. NÊRÎNA ETNO-SEMBOLÎST .....	25
<b>BEŞA DUYEM: KURDÊN SÛRÎYEYÊ Û NETEWEPERWERÎ</b> .....	<b>29</b>
2.1.DÎROKA SÛRÎYEYÊ Û KURDÊN SÛRÎYEYÊ .....	29
2.1.1. Rewşa Dîrokî-Sîyasî : ji dema mandateriya Fransizan heta serxwebûnê(1920-1946) .....	31
2.1.2. Rewşa Dîrokî-Sîyasî: ji piştî serxwebûnê heta desthilatdariya partiya Baasê (1946-1963).....	34
2.1.3. Rewşa Dîrokî-Sîyasî : ji dema desthilatdariya baasê heta îro ( 1963-....) 38	
2.2. REWŞA ÇANDÎ-WÊJEYÎ YA KURDÊN SÛRÎYEYÊ .....	43
2.3. KURDÊN SÛRÎYEYÊ Û ROMAN .....	46
<b>BEŞA SÊYEM: DAHÛRANDINA ROMANAN DI PEYWENDA RABÊJA NETEWEPERWERIYÊ DE</b> .....	<b>51</b>

3.1. HELÎM YÛSÎV: <i>TIRSA BÊ DIRAN</i> .....	51
3.1.1. HELÎM YÛSÎV .....	51
3.1.2. <i>TIRSA BÊ DIRAN</i> .....	52
3.2. FAWAZ HUSÊN: <i>PÎÇEK JÎYAN QETEK ASÎMAN</i> .....	61
3.2.1. FAWAZ HUSÊN .....	61
3.2.2. <i>PÎÇEK JÎYAN QETEK ASÎMAN</i> .....	61
3.3. JAN DOST: <i>KOBANÎ</i> .....	70
3.3.1. JAN DOST.....	70
3.3.2. <i>KOBANÎ</i> .....	71
3.4. BÊWAR BRAHÎM: <i>LÎ BÎN SÎWANA XWEZÎYAN</i> .....	83
3.4.1. BÊWAR BRAHÎM.....	84
3.4.2. <i>LÎ BÎN SÎWANA XWEZÎYAN</i> .....	84
3.5. JANA SEYDA: <i>JÎNEKE MÎRÎ LÎ CÎHANGÎRÊ</i> .....	93
3.5.1. JANA SEYDA.....	93
3.5.2. <i>JÎNEKE MÎRÎ LÎ CÎHANGÎRÊ</i> .....	94
<b>ENCAM.....</b>	<b>102</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>106</b>

## DESTPÊK

Mijara neteweperweriyê qadeke fireh û aktuel e. Lê heta wexteke dereng jî wek qadeke zanistî nedihat dîtin. Umut Özkırmılı jî balê dikişînê li ser têgiha neteweperweriyê û dipirse: “Çima di nav akedemiyê de ewqas dereng cî ji xwe re dît. Li gorî wî herçiqas mirov bikaribe dîroka bingeha ramana neteweperweriyê bigihîne dawiya sedsala 18. – Herder û Fichte- jî, heta serê sedsala 20. bi awayekî objektîf û danberhevî nehatiye dahûrandin. Di salên 1920 û 1930 î de Carleton Hayes û di salên 1940î de jî bi xebatên Hans Kohn re neteweperwerî ket rojeva akademiyê. Lê guherîna mezin piştî salên 1980yî şûnde çêbû û nîqaşên neteweperweriyê di akademiyê de ket rewacê.” (Özkırmılı, 2016, r. 12) Her çiqas dereng ketibe rojeva akademiya cîhanê jî, ji ber eleqaya aktuel xebat him ji aliyê çendinî him jî ji aliyê çawaniyê ve zêde bûne. Di akademiya Tirkiyê de jî piştî salên 2000î xebatên derbara neteweperweriyê de zêde bûne. Em dikarin viya ji salên wergerên pirtûkên derbara neteweperweriyê de jî pê derxînin.

Dema em dibêjin neteweperwerî jixweber tegiha nasnameyê jî tê bîra me. Lê naveroka nasnameyê ji neteweperweriyê firehtir e. Ji ber wê, em xweyî gelek nasnameyan in. Di heman wext û şûnwarê de ji yekê zêdetir nasnameyên me hene: Ol, etnîsîte, netewe, çîn, pîşe û zayend h.w.d. Lê Anthony Smith di vir de îtiraz dike û dibêje. “Ev nêrîn bi riwangeya takekes li mijarê dinihêre. Nasnameyên bi vî rengî, ji bîranîn, mît û nirxên hevpar pêk tên. Em van nasnameyan dikarin wek komên çandî û di hin rewşan de jî wek cimeatan bifikirin. Lê pirî caran takekes û civak tên tevlihevkin. Ji ber wê divê ji hev bîr veqetandin. Her çiqas komên çandî û cimeat ji takekasan ava bibe jî, em nikarin wek yekûna hin kesên xwedî hin taybetiyan û bi hev re dijîn, binirxînin. Lê nirxên van nasnameyên hevpar bi rêya norm, bîranîn û remzan dikare bêtir tiştan bibêje.” (Smith, 2013, r. 34-35) Di vê peywendê de nasnameya neteweyî wek nasnameya raser derdikeve pêşiya me. Nasnameya neteweyî û neteweperwerî ji ber taybetiya xwe qada xebatên gelek disîplînan in. Derûnasî, civaknasî, antropolojî, felsefe hin ji wan disîplînan in. Helbet ne pêkan e ku em serî li hemû disîplînan bidin lê heta ji destê me hat em ê di nav sînorên xebatên xwe de ji wan disîplînan jî sîd werbigirin.

## Mijara Xebatê

Di avakirin û pêşketina Rabêja Neteweperweriyê de piraniya nivîskar û rewşenbîr giringiya rola wêjeyê derdixin pêş. Yek ji wan kesan Jusdanis e. Sedema nivîsîna berhema xwe wiha tîne ziman. “Projeya min a li vir, ew ê rola wêjeyê di avakirina neteweyan de, sazîbûna wê û pişt re jî bi awayekî telafiker estetîzekirina wê, vebikole. Ez dixwazim nîşan bidim ka çawa demekê vegotinê di afirandina nas-nameyên kolektîf de cih girtiye û taliya talî çawa bûye amûrek di warê lihevkerina îdeolojîk de. Jûsdanis dûre wiha berdewam dike. Wêje, neynikeke xeyalî ye ya ku netewe ango mirovên wek endamên vê yêkîtiyê dijîn, xwe tê de dibînin. Him tezhura neteweyekê bû him jî perçeyekî pêvajoya netewesaziyê bû. Kanona wêjeyê wek yekûna vegotinan, di nava xwe de çîrokên ji bo fahmkirina têkiliyên hevpar ên endamên cimeatê dihundirîne. Wêje rojnivîska neteweyekê ye û çîroka rabirdû, niha û dahatûyê vedibêje. Çanda wêjeyê ji bo cimeatên etnîkî yên ku dixwazin yekîtiya xwe wek netewe xurt bikin û nîşan bidin ku amade ne ji bo modernbûnê (bi awayekî derengmayî) jêneveger e. (Jusdanis, 1998, r. 9, 76) Benedict Anderson jî vê têkiliyê hinek din jî pêşde dibe û roleke mezin dide roman û rojnameyê. Her dûyan wek cûreyên texeyyulê dibîne. Û dibê van cûreyan ji bo temsîlkirina civata ku tê xeyalkirin amûrên teknîk didin. (Anderson, 2020, r. 43) Huxley jî bi awayekî eşkere angaşt dike ku romanûs û helbestvan heta radeyek mezin îcatkarên netewên xwe ne. (Ahmedzade H. , 2011, r. 69) Jameson hinek bi angaşt dibê ku hemû romanên dinyaya sêyemîn *alegoriyên neteweyî* ne. “Hemû metnên dinyaya sêyemîn, dikarin bibêjim mecbûr e ku bi awayekî taybet alegorîk be, herçiqas jêderka şeweyên wan xwe bigihîne navgînên temsîlên rojavayî jî, heta nexasim di rewşên wiha de divê wek *alegoriyên neteweyî* bîn xwendin.” ( Jameson, 1986, r. 69)

Êdî hatiye qebûlkirin ku wêje derbara avakirina Rabêja Neteweperweriyê de pirî caran dibe navgîn û amûrek. Bi xwe di nav cûreyên wêjeyê de jî roman cihekî taybet digire. Em ê jî şopa têkiliya romanên Kurdên Sûriyeyê û Rabêja Neteweperweriyê di pênc nivîskar û romanên wan de biajon. Ev pênc nivîskar û pênc roman jî bi vî awayî ye: Helîm Yusiv (*Tirsa Bêdiran*), Fawaz Husên (*Piçek Jiyan Qetek Asiman*), Jan Dost (*Kobanî*), Bêwar Brahîm (*Li Bin Sîwana Xweziyan*) û Jana

Seyda (*Jineke Mirî Li Cihangirê*). Em ê di van pênc romanên de bersivên pirsên li jêr bigerin.

1-Di romanên de 'ê din' ên Kurd kî ne?

2-Gelo nivîskar bi hişmendî xwestiye rabêjeke neteweperwer ava bike an na?

3-Romanê nasnameya neteweyî xurt kiriye an na?

4-Sembolên neteweyî (al, sirûd, welat, lehengên neteweyî h.w.d) di romanên de çawa hatiye bikaranîn?

5- Rûdanên di dîroka Sûriyeyê de û bandora wan a li ser Kurdan bi çi awayî derbasî nava romanê bûye?

Em ê hewl bidin li dor van pirsan têkiliya Rabêja Neteweperweriyê di romanên navborî de vekolin. Bixwe bersiva van pirsan ew ê me bigihîne encamê; ka di van romanên de rabêjeke neteweperwer heye yan tune ye.

### **Girîngiya Xebatê**

Berîya salên 2000î xebatên derbara Kurdan de bi zimanên din û pirî caran jî ji aliyê biyaniyan ve hatiye nivîsin. Bi ser de van xebatan bi piranî sosyopolîtîk an jî dîrokî ne. Ji ber wê ev xebat him jî ber zimanê xwe him jî ji ber naveroka xwe girîng e. Êdî qinaetêke giştî heye ku di avakirina Rabêja Neteweperweriyê de, rewşenbîr û xebatên wan roleke girîng dilîze. Disîplîna wêje û folklorê perçeyêke mezin a vê xebatê ye. Di nav disîplîna wêjeyê de jî roman di warê avakirina Rabêja Neteweperweriyê de cûreya herî bi bandor e. Ev xebat jî ew ê hewl bide ku di nav romanên nivîskarên Kurd ên Sûriyeyê de rabejeke neteweperwer çawa hatiye avakirin, lêbikole. Heta niha rastî xebatek li ser romanên Kurdên Sûriyeyê û derbara rola wan a avakirina nasnameya neteweyî de, nehatim. Lê ger bi vî rengî yan jî nêzî vê peywendê xebat hatibe kirin jî ev ne kêmasî ye. Ji ber her xebata baş xwedî taybetiyên cuda ye û akademî bi xebatên bi heman naverokê lê bi riwangeyêke cuda hatiye nivîsîn tijî ye.

## **Armanca Xebatê**

Armanca me ji vê xebatê ev e ku di romanên Kurdên Sûriyê de Rabêja Neteweperweriyê vekolin. Helbet ev armanca me bêyî bingehên teorîk ne pêkan e. Ji bo wê me xebata xwe wek teorîk sipart nêrînên neteweperwer. Em ê bersiva van pirsan; neteweperwerî kengî derketiye, guherînên tê de çêbûye çi ne, netewe û etnîsîte heman tişt in an na, Kurd netewe ne yan jî etnîsîte ne, cûreyên neteweperweriyê çi ye h.w.d rave bikin. Helbet bersiva van pirsan ew ê me bibe ber deriyê nêrînên cuda yên neteweperwer. Em ê jî neteweperweriyê di bin sê beşan de binirxînin. Nêrîna prîmordiyalîst, modernîst û etnosembolîst. Dûre jî em ê bi rêberiya teoriyên neteweperwer li rewşa Kurdên Sûriyeyê binêrin. Em e li vir jî bersivên van pirsan bigerin: Gelo em dikarin qala Neteweperweriya Kurdan bikin. Neteweperweriya Kurdên Sûriyeyê kengî derketiye û çawa pêş ketiye. Di vê pêşketinê de rola rewşenbîran çi ye? Xebatên wêjeyî, zimanî û folkorîk di avakirina Rabêja Neteweperweriyê de roleke çawa listiye? Bersiva van pirsan jî ew ê di beşa sisêyan de bi kêrî me were. Ji ber ku naveroka romanên bi awayekî xurt bi têkiliyên rûdanên Sûriyeyê re têkildar e. Helbet her rûdanên li Sûriyeyê rasterast bandor li Kurdan jî kiriye. Kurd çiqas rastî tahde û zilmê hatine ewqas bi hev hatine girêdan û nasnameya wan a neteweyî jî xurt bûye. Herî dawî jî em ê bi alikariya herdu beşên me li jor qal kir di romanên Kurdên Sûriyeyê de Rabêja Neteweperweriyê bigerin.

Em di wê baweriyê de ne, em ê di van romanên de rastî rabêjeke xurt a neteweperwer werin. Ev baweriyê me jî xwe dispêre çend sedemên sereke. Yek jê sedema girîng wek cûre me roman hilbijart ji ber ku roman û netewe bi awayekî diyalektîk hev diafirînin. Sedema din jî me bi hişmendî jî romanên bi kurdî hatiye nivîsîn hilbijart. Li Sûriyeyê li ser zimanê Kurdî qedexa hebû ji ber wê jî ger romanek bi Kurdî hatibe nivîsin, ev bi serê xwe helwesteke neteweyî ye. Helbet ne pêkan e ku ev helwesta neteweyî pê re tekildar jî Rabêja Neteweperweriyê sîrayetî nava romanên nebe.

## **Sînoren Xebatê**

Di xebatên akademîk de danîna sînoran bivênevê ye. Diyarkirina sînoran rê li ber xebateke tekûz vedike. Me jî wek cûreya wejeyê roman hilbijart û me sînoren vê lêkolînê li ser du bingehan ava kir. Yek jê nivîskar wek jidayîkbûnê divê ji Sûriyeyê

bin û ya din jî divê zimanê romanê Kurdî be. Me pênc nivîskar û pênc roman hîlbijart. Ji wan her sê nivîskar – Helîm Yusiv, Fawaz Husên û Jan Dost- ji Kurdên Sûriyeyê ne û bi Kurdî nivîsîne. Ev her sê nivîskar gelekî berhemdar in, berhemên wan bêtir hatine çapkirin, xebat bêhtir li ser wan hatiye kirin û di wêjeya Kurdî de jî bêhtir tên nasîn. Du nivîskarên din - Bêwar Brahîm, Jana Seyda- jin in. Herdu nivîskarên jin jî gelekî berhemdar in lê mixabin bi qasî nivîskarên mêr nayên naskirin. Armanca me ya sereke ji hîlbijartina nivîskarên jin ev bû ku ka di romanûsên jin de Rabêja Neteweperweriyê bi çi awayî sîrayetî nava metnê bûye. Di hîlbijartina hemû romanên de jî pîvana me divê naverok nêzî xebata me bûya û aliyê din jî ji aliyê estetîka wêjeyî ve xurt bûna. Me romanek hîlbijart ji ber xebat pir belewela nebe û nekevin dafika dubarebûnê.

### **Rêbaza Xebatê**

Xebata me ji ber ku teorîk e, em ê serî li şîrove, dahûrandin û agahiyên dikeve nav qada xebata me bidin. Her neteweperwerî xwedî taybetiyên cuda ne. Ji ber wê em ê nikaribin tenê bi nêrînekê mijara xwe dahûrînin. Nêrîna prîmordiyalîst êdî têra fahmkirina Rabêja Neteweperweriyê nake ji ber ku netewe ne fenomeneke qedîm berovajî fenomeneke modern e. Lê nêrînen etno-sembolîst û modernîst ji bo fahmkirina Rabêja Neteweperweriyê, rêbaz û nêrînen girîng di nav xwe de dihewînin. Em jî dema romanên xwe dahûrînin bi nêrîneke modernîst û etno-sembolîst nêzî vê meseleyê bibin.

Li gorî qinaeta giştî di navbera wêje û avakirina neteweyê de têkiliyeke xurt heye. Benedict Anderson di berhema xwe ya navdar *Hayali Cemaatler (Cimaetên Muxayyel)* de, vê angaştê hinek din jî pêşde dibe û cihekî zêde dide rola romanê. Fredric Jameson jî di gotara xwe ya navdar a *Third-World Literature in the Era Of Multinational Capitalism* de, romanên Cîhana Sêyem wek alegoriya neteweyî dibîne. Herçend ev angaşt hinek bi nîqaş û bi temamî ne rast be jî ji bo romanên ku em ê dahûrînin rast e. Em ê jî di vê çarçoweyê de li bersiva van pirsan bigerin. Kurd etnîsîte, gel an jî netew in? Gelo em dikarin qala Neteweperweriya Kurd bikin. Rola ziman di avakirina nasnameya neteweyî de çi ye. Neteweperwerî bi çi awayî sîrayetî romanên kiriye. Di van romanên de nasnameya Kurdî bi kîjan awayî hatiye avakirin. Kîjan şexsiyet û qewimînên dîrokî ji nû ve hatiye bibîrxistin? H.w.d

Ne pêkan e ku em hemû xebatên derbara vê mijarê de hatiye nivîsîn, bixwînin. Lê bêguman her xebat ji hin xebatên din feyz digire. Hin xebatên me jê feyztirine jî ev in. *Ziman û Netewesazî-Lêhûrbûnek Li Ser Kovara Hawarê-* (Onen, 2018), *Bêjara Neteweparêz Di Kovara Hawarê De*, (Zeraq, 2018), *Ulus ve Roman*, Ahmedzade, 2004), *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî (1938-1946)*, (Perteve, 2018), *Folklor û Roman -li dor texeyyulên berê rêçên îroyîn-*, (Alan, 2013), *Nerîta Neteweyî di Helbesta Nû ya Kurdî de (1880-1970)*, (Ergün, 2017). Xebatên Ronahî Onen û Dilawer Zeraq nêzî hev in û mijara wan jî têkiliya kovara Hawarê û netewesazî ye. Xebata Remezan Alan jî di peywendaya avakirina nasnameya neteweyî de bikaranîna hemanên folklorê di romanên Kurdî de vedikole. Berhema Ramazan Perteve jî rola xebatên folklorê di çarçoweya avakirina nasnameya neteweyî de vedikole. Çavkaniyên berhemê, xebatên folklorîk ên salên navbera 1938-1946an e û piranî jî ji xebatên folklorîk ên Kurdên Tirkîyê pêk tê. Berhema Haşîm Ahmedzade jî xebateke danberhevî ye. Bi rêya 5 romanên Farisî û Kurdî bi awayekî danberhevî pêvajoya avakirina nasnameya neteweyî ya Kurd û Farisî vekolaye. Berhema Zulkuf Ergun jî avakirina nasnameya neteweyî û rengvedanên wê di helbestên salên navbera 1880-1970 de, vekolaye. Hemû xebatên navborî bi aliyekî xebata me re têkildar e lê yekser wek naverok ne nêzî xebata me ye.

Heta ji me hat, me serî li çavkaniyên ewilîn da. Ji bo dîrok û rewşa çandî ya Sûriyeyê me ji bîranînen Nûreddîn Zaza û Osman Sebrî sûd wergirtin. Ji bo bingeha teorîk a neteweperweriye jî me ji berhemên Benedict Anderson, Eric Hobsbawm, Anthony Smith, Thomas Hylland Eriksen sûd wergirtin.

### **Astengiyên Xebatê**

Di nav akademîsyen û nivîskarên Kurd de ji bo têgihan lihevkirinek giştî tune bû û her akademîsyen an jî nivîskar navêkî cuda ji bo têgihan bi kar dianî. Min jî ev astengî wiha çareser kir. Him qala navlêkirinên cuda kir û him jî li ba wan Îngilîziya wan jî nivîsî. Ê min yek ji wan navan hilbijart û heta dawiyê jî min ew nav yan jî tenê navê Îngîlîzî ya têgihê bi kar anî. Astengiyêke din jî ji ber rewşa niha a Sûriyeyê ne pêkan bû me xwe bigihanda hemû romanên û romanên xwe ji wê skalaya firehtir hilbijarta.

Xebata me ji sê beşan pêk tê. Di beşa ewil de, em ê qala teoriyên neteweperweriyê bikin. Di beşa duyem de em ê qala dîroka Sûriyeyê û pê re têkildar jî qala rewşa Kurdan bikin. Di beşa dawîn de, em ê sûd ji vê bingeha teorîk bigirin û romanên her romanûsekî di bin navê niviskarê wî de li dor hêmanên neteweperweriyê dahûrînin.



## BEŞA YEKEM: NETEWEPERWERÎ

Dema em dibêjin neteweperwerî sê nêrîn derdikevin pêş: Prîmordiyalîzm, modernîzm û etno-sembolîzm. Prîmordiyalîst baweriya xwe bi cewhera neteweyî tînin û bawer dikin ji ber şer, talan, koçkirin û pişaftinê hin guherînên biçûk di dirûvên neteweyan de pêk were jî ev tişt nabe sebeb ku cewhera neteweyî xera û tune bibe. Nêrîna modernîst bala xwe dide pêvajoya kapîtalîzm, bajarîbûn, pîşesazî û dewletên navendî û avabûna neteweyan jî bi van têgihan re têkildar dinirxîne. Li gorî wan di serdemên kevn de ev rewş tune bûn ji ber wê jî em nikarin di serdemên kevn de qala neteweyan bikin. Di nav akademyê de gelek parastvanê vê nêrînê hene: Tom Nairn, Micheal Hechter, Ernest Gellner, John Breuilly, Elie Kedourie, Eric Hobsbawm, Benedict Anderson û h.w.d. Em ê jî vê nêrînê ji aliyê civakî-aborî, civakî-çandî, siyasî, îdeolojîk, însayî ve binirxînin. Nêrîna me ya dawîn a derbara avabûna neteweyê jî etno-sembolîzm e. Di navbera nêrîna prîmordiyalîst û modernîstan de wek pirekê ye. Terma etno-sembolîst ji bo kesên ku di dahûrandinên neteweperweriyê de, girîngiyê didin rabirdûya etnikî ( û çandê) tê bikaranîn. Bi saya xebatên wek Anthony D. Smith, John Hutchinson û John Armstrong hatiye avakirin. Van kesan prîmordiyalîzm red dikin û nêrînên modernîstan jî kêmbûn û dixwazin ji van herdu nêrînan bigihêjin sentezekê. Li gorî etno-sembolîstan neteweyên îro berdewama civakên etnikî yên beriya serdema modern in. Nasnameyên etnikî bi qasî ku tê fikirîn zexmtir e; li dijî dafikên dîrokê ( koçberî, îstila, zewacên navbera komên etnikî) jî cewhera xwe bi sedan sal diparêzin. Neteweyên serdema modern, di bin siya çandên qedîm de dirûv digirin. Mît, nirx, sembol û kevneşopî taybetmendiyan bingehên in di avakirin û berdewamiya nasnameyên neteweyî de. Em ê jî di vê beşê de hewl bidin ku kitekitên van nêrînan binivîsînin.

### 1.1.NASNAME Û NASNAMEYA NETEWÊYÎ

Nasname yek ji wan têgihan e ku herî zêde di navbera sedsalên 18. û 21. tê nîqaşkirin. Piştî karesatên şerê cîhana 1. û 2. bi piranî nivîskar, zanyar, siyasetmedar û ramanger serê xwe bi vê meseleyê êşandin. Ev eleqe ji ber şer û pevçûnên etnik û nijadî, daxwaza wekheviya zayendî, koçberiya çandên cuda ber bi welatên Rojavayî û arezûya hesta aîdbûnê çêbû. Nivîskarê bi eslê xwe Lubnanî Amîn Maalouf jî yek ji wan kesan bû. Sedema nivîsîna berhema xwe ya navdar a *Ölümcül Kimlikler*

(Nasnameyên Kujerî) wiha îfade dikir: Dixwest fahm bike ku ji bo çî ewqas mirov li ser navê nasnameyên xwe yên olî, etnîk, neteweyî yan jî yên din dikarin hevdû bikujin. (Maalouf, 2012, r. 15) Ji ber populeriya nasnameyê him eleqeyeke mezin û him jî ji ber naveroka wê ya xetere jî nêzîktêdayîneke bitirs heye. Bi ser de wateya şêlû ya nasnameyê jî meselê hinek din grîftir dike. Maalouf derbara vê xalê de wiha berdewam dike. “Jiyana min a nivîskariyê hînî min kir ku ez xwe ji peyvan bidim alî. Yên herî zelal xuya dikin piranî yên herî xiniz in. Yek ji wan dostên xwedêgiravî jî ‘nasname’ ye. Em giş xwe zana dihesibînin derbara ev peyv tê çî wateyê de û ew bi awayekî binkolî berovajiyê xwe bibêje jî, em her jê bawer dikin.” (h.b, h.r.) Helbet ne pêkan e ku pênameyek herkes li ser lihevbihe bê dîtî lê ez bawer dikim ku ew ê kêmtir were ji bo pênameya nefsbîçûk a Amîn Maalouf: “Nasnameya min ew tişt e ku min naşîbîne tu kesan.” (h.b, h.r.) Bi rastî jî cihê ‘ez’ an jî ‘em’ hebe ji xwe ber ‘ew’ tê bîra me ango ‘yê din û pê re jî cudabûn, resenî û newekhevbûn.

Nasname ji ber taybetiya xwe qada xebatên gelek disîplînan in. Derûnnasî, civaknasî, antropolojî, felsefe hin ji wan disîplînan in. Di van disîplînan gişan de geneateke giştî heye ew jî di avabûna nasnameyê de giringiya ‘yê din’ e. “Bi awayekî paradoksî qebûlkirina xwe ji qebûlkirina yê din derbas dibe. Di vê pêvajoyê de, divê ez yê din him wekhev – û ji ber vê sedemê, divê ez li nasnameya xwe û aîdiyeta xwe ya çandî hay bibim- him jî cuda qebûl bikim. Ji bo wê jî divê ez çand û nirxên xwe îzafî bikim. Di vê peywendê de, dibe ku hebûna yê din, di çarçoweya hişmendiya hebûna min de, wek tiştêkî şerm be. Dîsa jî ew asoya jêveneger a nasnameya min û hebûna min e. Ji bo min jî, zerengiyê jiyana ya ji him zerengiyê çandî û him jî zerengiyê şaristanî avabûye, xêz dike. Bûyîna xwedî nasnameyekê, her tim tekiliyê bi yê din re li ser me ferz dike.” (Bourse, 2009, r. 115) Eriksen jî di heman fikrê de ye. “Wek nasnameyên din ên etnîkî, nasnameyên neteweperwer jî bi yên din re têkildar ava dibe; ramana netewe, ji hebûna kesên ne ji neteweya wî ye yan jî qe nebe hebûna mirovên din qebûl dike. (Eriksen, 2002, r. 169) Çî nasnamayên mîkro çî jî nasnameyên makro dibe bira bibe teqez ‘yê din’ek heye. Nasname bi rêya texayulkirina yê din ava dibe.

Di jiyana modern de, bi awayekî hevdemî teqez ji yekê zêdetir nasnameyên me hene. Dîn, etnîsîte, netewe, çîn, pişe û zayend hwd bibe nasnameya me. Lê

Anthony Smith di vir de îtiraz dike û dibêje. Nêrîna pîrnameyî bi riwangeya takekes li mijarê dinihêre. Nasnameyên bi vî rengî, ji bîranîn, mît û nirxên hevpar pêk tên. Em van nasnameyan dikarin wek komên çandî û di hin rewşan de jî wek cimeatan bifikirin. Lê pirî caran takekes û civak tên tevlihevkin. Ji ber wê divê ji hev bîn veqetandin. Herçiqas komên çandî û cimeat ji takekasan ava bibe jî, em nikarin wek yekûna hin kesên xwedî hin taybetiyan û bi hev re dijîn, binirxînin. Lê nirxên van nasnameyên hevpar bi rêya norm, bîranîn û remzan dikare bêtir tişt bibêje. (Smith A. D., 2013, r. 34-35) Nasnameyên pişt xwe didin hêmanên çandî – Qast, Civakên Etnikî, Terîqetên Dînî û Netew- zêdetir biîstikrar in ji nasnameyên pişt xwe didin hêmanên ekonomîk û berjewendiyê –civakên çînî û herêmî-. Bi guherîna formasyonên civakê re ev nasname jî yan diguherin yan jî ji holê radibin. “Îro di nav hemû nasnameyên kollektîf ên mirovan de belkî jî nasnameya neteweyî di nav wan de, ya herî bibingeh û firehtir e. Neteweperwerî wek îdeoljîyek ne tenê nifûzî li her derê dinyayê kiriye, dinya pêşiya pêşî di dirûvê ‘netewedewlet’ an de – dewletên bi angaşt xwe netew dihesibînin- hatiye dabeşkirin. Nasnameya neteweyî li her derê, dem dem bibe sebaba dîktatorîyeke taybet jî, ji aliyê din pir caran pişt dide saîqên desthilatdariya gel û demokrasiyê. Nasnameyên din ên kollektîf –çîn, zayend, nijad, dîn h.w.d- dibê ku bi nasnamaya neteweyî li hev bikin an jî bigihînin hev û bandorê li îstîqameta wê bikin jî, lê kêman caran di warê binkolandinê wê de serkeftî bûne. (Smith A. D., 2017, r. 221) Nasnameya neteweyî li gor nasnameyên din ên kollektîf qewîntir û biîstikrar e. Di vî fikra xwe de Anthony Smith ne tenê ye. Gregory Jusdanis jî balê dikişîne ku ji 1789 an heta îro tiştê derneketiye ji bo şûna nasnameya neteweyî bigire. (Jusdanis, 1998, r. 231) Lê Hobsbawm wek wan nafikire. Ew dixwaze hestên hemwelatiyan fahm bike û hemwelatî xwe aîdî kîjan nasnameyê dibîne. Ev tişt çiqas zor be jî sê xal gelek eşkere ne. “ A yekem, îdeolojiyên fermî yê dewlet û tevgaran tu car bi temamî ne wekhev in ramanên di hişê hemwelatî yan jî alîgirî de. Ya duyem û bi awayekî taybet, ji bo pirî mirovan -ger hebe- em nikarin bibêjin ku hêmanên komikên nasnameyî ya hebûna civakî ya nasnameya neteweyî çêdike derveyî xwe dihele an jî her tim an jî demekê li ser wan e dibîne. A sêyem, nasnameya neteweyî û hêmanên vê nasnameyê di hundirîne bi demê re bi ser de di demên pir kurt de jî dibê ku biguhere.” (Hobsbawm, 2017, r. 26)

## 1.2. ETNÎSÎTE Û NETEWE

Etnîsîte û netewe du tegihên cuda ne lê pirî caran ji ber naverokên wan ên şêlû û zehmet li şûna hev jî tên bikaranîn. Ev jî dibe sebab ku xebatên derbara neteweperweriyê de bêtir tevlihev bibe. “ Li gorî Ferhenga Ingilîzî ya Oxfordê terma ‘etnîsîteyê’ dihat wateya kevn, kêmpêyda, cihana putperestiyê yan jî xurafeyên putperestiyê re eleqadar. Dawiya sedsala par (s.s. XIX) ango dema ferheng hatibû weşandin jî bikaranîna peyvê wiha bû. (Kedourie, 2004, r. 47) T. H. Eriksen jî balê dikişîne li ser guherîna wateya peyvê li gorî sedsalan. Di Ingilîzî de ji nava sedsasala 14. heta nava sedsala 19. jî, di wateya kâfir û pagan de hatiye bikaranîn. Piştî nava sedsala 19. her ku çû ji bo taybetiyên nijadî hat bikaranîn. Di Dewletên Yekbûyî de, dema şerê cihana duyem ji bo kesên wek Cihû, Îrlandî, Îtalyanî ango kesên derveyî koma raser a ji binemala Îngilîzan e dihat bikaranîn. Bikaranîna termê ya cara ewil jî îsnadî civaknasê Amerîkî David Riesman dikin(1953) Avakarên civaknasî û antropolojiya civakî zêde guh nedane etnîsîteyê -qismen Max Weber îstîsna ye- (Eriksen, 2002, r. 15) Somersan jî tevî vê fikrê dibe. Di civaknasiya klasîk de ji bo alîkariya fahmkirina etnîsîteyê bike tu nêrîn nehatibûn pêşxistin. Karl Marx etnîste wek dîn hişmendiyê çewt (false consciousness) dinirxand û bi demê re ew ê cihê xwe bida hêmanên dîn (berjewendiyên hevpar). Kevneşopiya Ferdinand Tönnies û Emile Durkheim jî ji etnîsîteyê bêtir li ser danberheviya civaka kevneşop û modern disekinîn. Ji ber wê di serê sedsala 20. de xebatên Max Weber gaveke girîng bû. Weber etnîsîtê bi tegihên wek çîn, prestîj û partî re dida berhev û ji wan jî cuda dinirxand. Herçiqas jêderkên bîyolojîk hebin jî etnîsîte ji nijadê cuda ye û baweriyê subjectîv e ku xwe dispêre kirûyên wek dîroka hevpar û dab û nêrîtê. (Somersan, 2004, r. 21-22)

Îhmalkirina mijara etnîsîteyê piştî şerê cihana yekem û duyem, serhildanên etnîk ên li welatên kolonyal û daxwazên mafên neteweyî li her deverê dinyayê bû sebab ku zanistên civakî jî bala xwe bide vê mijarê. Di nav xwe de binbeşên wê hebe jî du nêrînên sereke heye derbara pênaseya etnîsîteyê de. Yek nêrîna primordiyalîst yek jî nêrîna instrumentalîst e. Nêrîna primordiyalîst bala xwe dide çand, ziman û binemala hevpar û bawer dibe ku etnîsîte ji demên kevn ve heye. “Clifford Geertz yek ji wan kesan e ku bi primordîalîzmê re tê bîra me. Li gorî Geertz tiştê ji

pêwendiyên pêşîn tê fahmkirin jiyana civakî tişteki dayî (given) ye, ya rast wek 'dayî' tê qebûlkin. Ji ber hêmanên xwe, xwedî pêwendiyên e û pêwendiya xwîn, dîn, ziman û hin xûyên civakî mînakên vê pêwendiyê ne. Ne ji ber berjewendiyên şexsî ji ber pêwendî bixwe girîng e serî li hember van pêwendiyên tê tewandin. Tiştê girîng nezîkbûna xwezayî ye ne hevkarîgerî (interaction) ye. (Özkırımlı, 2016, r. 81) Nêrîna instrumentalist jî bala xwe dide lêrasthatinên civakan, hevkarîgeriyê û bawer dike di nava etnîsîte jî guherîn çêdibin û carna jî li gor şert û mercên nû dirûvekî nû jî digire. T.H. Eriksen ji bo derketina etnîsîteyê ya li holê temasa asgarî wek divêtiyek dibîne. Ji ber ku divê pêbihesin ku raman û çandên wan ji hev cuda ye. Ger ev şertûmerc tune be etnîsîte jî tune ye. Ji ber etnîsîte ne taybetiyên komekê ne, xuyakirina têkiliyên wan in. (Eriksen, 2002, r. 27) Bixwe me di beşa nasnameyê de qal kiribû ji bo em bikaribin qala nasnemeyeke çî mîkro çî jî makro bikin, divê 'yê din' ek hebe. Tu nasname di valahiyê de ava nabe û her tim hewceyî lêrasthatinekê ye. Fredrik Barth jî balê dikişîne lêrasthatinên etnîkî û nasnameyên etnîkî çawa li gor şertûmercên demê diguhere. Ji bo vê angaştê xwe jî mînaka Pathaniyên Başûrî dide; ev kom bi rêya pêwendiyên xwînê xwe bi rêxistin dike, ji ber wê jî komeke homojen e. Lê Pathaniyên li herêma Swatê dijîn ji aliyê rêxistina civakî ve dişibin Pencabiyan, ji ber wê jî Pathaniyên Başûrî, yê li herêma Swatê dijîn wek Pathanî qebûl nakin. Lê Barth îdda dike ku ger yek jê Pathaniyên Başûrî li Swatê bijî ew ê di warê helwest û tevgerê de wek Pathaniyên Başûrî tevbigere. Barth nêrîna xwe hinek din jî pêş dixê û balê dikişîne guherîna etnîsteyan bi rêya mekanîzmaya qebûlkin û redkirinê. Pathaniyên li Başûr dijîn dikarin bibin Belucî lê Belûciyek nikare bibe Pathan. (Barth, 2001, r. 15-16, 25-26)

Em baş dizanin ku hêjmara etnîsîteyan ji neteweyan gelekî zêde ye. Li gorî Neteweyên Yekbûyî hê jî li dora 5000 etnîsîte û 6000 ziman heye. Lê tenê 193 heb wek dewlet endamên wê hene. Wê çaxê cudahiyan di navbera etnîsîte û neteweyan de çî ye? Etnîsîte kengî û bi çî awayî dibe netewe. A. Smith jî ji bo ji navê meseleya binîqaş derkeve ewil serî netewe ne çî ye dide. Bi ya wî netewe ne dewletek û ne civakeke etnîk e. Ne dewlet e ji ber ku dewlet xwedî saziyên mafê bikaranîna şiddet û mafê derkirina sînorên xwe ye. Lê netewe, civakek e ku endamên wê xwedî welat, çand û hesteke hevpar e an jî xwedî vê hîssiyatê ne. Ji ber wê tegiha dewlet ji têngîha neteweyê pir cuda ye. Netewe ne komeke etnîk e ji ber ku herdû jî bi

heman dîyardeya malbatî (nasnameyên hevpar ên çandî) têkildar bin jî piranî etnîsîte ne xwedî wateyeke sîyasî ye û ji ber ku divetiyeye wê ya xwedîbûna welatê xwe yê dîrokî tune ye pirî caran çandeye cuda ya gel jî tune ye ji ber wê jî ji welatekî bêpar e. Li dijî vêya ji bo neteweyek xwe birêxistin bike divê demeke dirêj li ser erdê wek welatê xwe dibîne, îkamet bike. Di heman wextî de divê neteweyek bixwaze bibe netewe û ji bo wek neteweyek bê qebûlîkirin xwedî çandeye gel be û daxwaza çêkirina qedera xwe jî pêş bixe. Ji aliyê din ve ji bo netewbûnê xwedî dewlet bûn ne pêwîst e, lê netewe divê cihê ku lê îkamet dike wek welatê xwe bibîne pê re jî xwedî daxwaza xweseriyê bibe. (Smith A. D., 2013, r. 24) Benedict Anderson jî neteweyê wiha pênase dike. “Netewe civakeke sîyasî ya xeyalkirî ye – bi awayekî xwezayî him bisînor e him jî desthilat e. Li gorî wî netewe xeyalkirî ye ji ber ku endamên neteweya herî biçûk jî ew ê piraniya endamên din ên neteweya xwe nas nekin, ew ê tiştek di derheqa wan de nebihîzin lê ew ê di hişên wan de xeyala yekîtiyê û bihevrebûnê herdem bijî. Bi sînor e ji ber ku neteweyên din hene û sînorên wan jî heye ev tişt ji bo neteweyên herî mesihî jî derbasdar e. Mînaka xiristiyanan dide û dibêje ew bixwe jî xeyala cihaneke tevahî xiristiyan nakin û bi sînor e. Desthilat e ji ber ku ji nav demên Ronakgerî û Şoreşê derketiye. Mirov li dijî xanedaniya hîyerarşik derketine û li dû xewna azadbûnê çûne. Ji bo azadiya xwe jî dewleta desthilat wek kevirê mîhenk û amblem dîtine.” (Anderson, 2020, r. 23-25) Li gorî pênaseya A. Smith û Benedict Anderson em dikarin bibêjin Kurd neteweyek e lê em dizanin ku Kurd di nav sînorên netewedewletên wek Tîrkiye, Îran, Irak û Sûriyeyê de, dijîn. Rewşên wan ên sosyopolîtîk jî kêr û zêde dişibin hev û li gor rayedarên dewletê yê lê dijîn tîr binavkirin. Carna dibin etnîsîte, carna dibin komeke çandî lê pirî caran dibin bermayiya xerabe ya etnîsîteya serdest e. “Ger dewlet bi etnîsîteyekê re bûbe yek (wek Îngiliz, Tirk, Elman) dibe ku xwe wek etnîk nebînin. Ji ber ku di nav gel de etnîk, gelê xwecihî, penaber, kêmar e. Bi awayekî bê pişaftin jî piranî ‘yê din’ in. (Somersan, 2004, r. 23) A. Smith Kurdan wek neteweyeke bêdewlet (Smith A. D., 2013, r. 113), T. H. Eriksen jî Kurdan wek Sih, Filistinî Tamiliyan ji komên din – kêmarên bajarî, gelê xwecihî- bêtir nêzî neteweyê dibîne û amaje pê dike ku li gorî termînolojiya hevpar van koman wek gelên bêdewlet tê pênasekirin. (Eriksen, 2002, r. 30) Denise Natalî jî balê dikişîne ku Kurd di nava çar dewletan de hatibe perçekirin jî nasnameya xwe ya Kurdîtiyê bi rêya xwe cudakirina ji etnîsîteya

desthilat her tim parastine. Kurd jî ji ber ne Tirk, Ereb, Faris e Kurd e. (Natali, 2009, r. 17)

### 1.3. SERENCAMA NETEWEPERWERIYÊ

Mirov dikare bibêje ku ev nêzî du sed sal in neteweperwerî bondoreke mezin li ser civakan dike. Ev bandor pirî caran wek şerên mezin an jî serhildanan diqewime. Umut Özkırmılı jî balê dikişînê vê tegeha bandorker a civakê û dipirse çima di nav akedemiyê de ewqas dereng cî ji xwe re dît. Li gorî wî du sedemên sereke ya vê meselê hene. Li gorî wî sedema ewil heta wextekî dirêj neteweperwerî ji bo xebatê hêja nehatiye dîtîn û giringiya wê di ser guh re hatiye avetin. Sedema dûyem neteweperwerî bi şerên Cîhana sêyem, wek îdeolojiyên rê li ber pevçûnê vedike yan jî bi şerên kêmarên etnîkî, tevgerên ji dewletên heyî û xwecihî re pirsgirêk derdixînin re heman tişt hatiye hesibandin û ji ber wê jî li neteweperweriyê wek pirsgirêkeke demkî nêzîk bûne. (Özkırmılı, 2016, r. 13-14) Herçiqas neteweperwerî dereng ketibe rojeva akademiya jî teorîdanerên neteweperweriyê balê dikişînin ku tu raman ji valahiyê dernakeve û şopajoyê ramanên berî ya xwe ne. E. Kedourie jî nêrîna neteweperweriyê digihîne heta Immanuel Kant (1724-1804) û sînôrên mirovên azad ê Kant heta tayînkirina mafê qedera xwe (Self-Determination) fireh dike. (Kedourie, 2017, r. 46) Dûre Kedourie balê dikişîne giringiya romantîkên Almanan – Fichte, Schlegel, Schleiermacher, Arndt, Jahn, Herder- derbara avabûna ramana neteweperwer de. Hinek teorîdanerên din jî ramanên Rousseau, Mill û Abbe Sieyes derdixin pêş ji bo fahmkirina destpêka ramanên neteweperwer. Di vê mijarê de nîqaş hebin jî piranî teorîdaner heqê girîngiya ramanên romantîkên Alman didin û bi piranî jî neteweperweriyê bi şoreşa Fransayê (1789) didin destpêkirin.

Mirov bikaribe dîroka bingeha ramana neteweperweriyê bigihîne dawiya sedsala 18. – Herder û Fichte- jî, neteweperwerî ji bo wek mijareke zanistên civakî bê dîtîn û lêkolîn heta sala 1920 û 1930î sekinî. Di vê serdemê de Carleton Hayes û di salên 1940î de jî bi xebatên Hans Kohn re neteweperwerî ket rojeva akademiya. Lê guherîna mezin piştî salên 1980î şûnde çêbû û nîqaşên neteweperweriyê di akademiya ket rewacê. (Özkırmılı, 2016, r. 12) Îro qeneateke giştî heye ku ji bo fahmkirin û şîrovekirina neteweperweriyê sê nêrîn derdikevin pêş. Ew jî prîmordiyalizm, modernîzm û etno-sembolîzm e.

## 1.4. NÊRÎNA PRÎMORDIYALÎST

Ev peyv di Ingilîzî de tê du wateyan. Ji wan a ewil ‘ ji destpêkê ve heyf’ ya din ‘ ya ewil hatiye afirandin an jî hatiye pêşxistin’. (Özkırmılı, 2016, r. 80) Di vê çarçowê de di xebatên Kurdî de jî ji bo vê termê, seretayîger (Pertev, 2018), pêşînegar (Ergün, 2017), seretayîparêz (Zeraq, 2018) hatiye bikaranîn. Ji ber di xebatên Kurdî de lihevkerineke giştî tune ye em ê jî Ingilîziya wê bi kar bînin.

Ev term ji xebatên etnîsîtê derbasî nav xebatên neteweperweriyê bûye. “Nêzîkatîya prîmordiyalîst ên pişt a xwe dide nêrîna neteweperwer bêyî xebatên komên etnîkî nayê fahmkirin û em nikarin ji hev veqetînin. Ev nêzîkatî cara ewil bi rêya xebatên nasnameyên etnîk û çawaniya tekiliyên nasnameya etnîk ava dike, dirûv girt. Wekî mînak him Shils, him jî Geertz di berhemên xwe de ji bo girêdayitîyên etnîkî bi kar tînin.” (Özkırmılı, h.b. r. 81) Prîmordiyalîzm beriya nêrîna modernîst derbara nêrînen neteweperweriyê de nêrîna serwer bû. Ev nêrîn jî di nav xwe de dibin sê beş: Xwezayî, bîyolojîk û çandî.

“ Li gorî vê nêrînê, nasnameya etnîk bi qasî qabîliyeta axaftinê, bêhnstendîne, sehekên dîtinê yan jî zayendê perçeyê me ya xwezayî ye. Mensûbîyeta civaka xwe ya etnîk ji berê de hatiye dîyarkirin. Bi awayekî din em bibêjin kes çawa di nav malbatekê de tînin dinyayê bi heman awayî di nav civakeke etnîk de jî tînin dinyayê. (Özkırmılı, h.b. r. 82-83) Anthony Smith jî rehên prîmordiyalîzmê digihîne heta Rousseauyî û ramana wî ya ji bo gihîştina masûmiyeta wendakirî, çawa divê em ji bajarê çilvirî bûye birevin û dîsa vegerin xwezayê. Ê ev giyanê xwezayî bû perçeya pênaseya neteweyê. Ev giyan digihêje heta Abbe Sieyes jî. Li gorî wî divê em neteweyan derveyî tîkiliyên civakî di nav nîzama xwezayî de fahm bikin. Bi awayekî din bibêjin netewe ewil in, ji ezelê ve hene. (Smith A. D., 2013, r. 76-77) Antohny Smîth bi gazin modernîzmê di xebatên neteweperweriyê de wek ortodoksiya domînant pênase dike û li vir îtîraz dike û nêrîna perrenialîst( qedîmîger) ji nêrîna xwezayî vediqetîne. Divê *perrenializm*, bi nêzîkatîya neteweyî ya xwezayî ya ku bîngeha prîmordiyalîzma modeya dawîn ava dike, neyê tevîhevkerin. *Perrenialist* dibe ku niherîna prîmordiyalîst pesend bike û bi heman awayî dikarin pesend jî nekin. Tiştê ji *perrenialista* re pêwîst bawerîya neteweyên ku pişt a xwe didin çavderiyên ampîrîk -an jî ji bo hinek neteweyan- her ji bo çî dibe bira bibe ji zûde ye

hebûna wan e. *Perrenialist* ne mecbûr e neteweyan xwezayî, organîk, an jî ewilîn gebûl bike, a rastî raveyên derdîrokî yên bi vî awayî dikarin red bikin û red jî dikin. *Perrenialist* ne mecbûr in bibin prîmordiyalîst piranî jî ninin. Divê vê cudatîyê jî hûn bixin hişê xwe. (Smith A. D., h.b. r. 74-75)

Nûnera nêzîkatiya biyolojîk a herî girîng Pierre van den Berghe ye. Li gorî Van den Berghe, sê sehek serweriyê li ser tîkiliyên mirovan dikin: Hilbijartina yên xizm/mervên xwe, (kin selection), bihevrebûn (reciprocity), zorlêkirin (coercion). Mirov berê xwe didin kesên bi wan re tîkiliyên xwînî hene yan jî heye dihesibînin û dixwazin bi wan re bibin cot. Piştî vê seheka dahfdêr arezûya biserketina zêdebûnê heye. Hêmana dûyem, ji bo feydeya takekes a bi hev re hevkarî ye û ya sêyem jî ji bo feydeya yek alî bikaranîna hêzê ye. Li gorî Van den Berghe, van sehekan ji bo komên etnîkî jî derbasdar in. Ji ber ku komên etnîkî bi rêya fikirîna mervantiyeke fireh dikare ava bibe. Komên etnîkî şopajoyên malbat in, a rastî ‘malbatên super’ in (Özkırımlı, 2016, r. 88)

Nêzîkatiya dawîn jî ya çandî ye. Nêrîna prîmordiyalîst bi xebatên etnîkî re ji nêz ve eleqedar e. Yek ji wan kesan jî Clifford Geertz e ku em wî ji xebatên wî yên etnîkî dinasin. Geertz bêtir bala xwe dide tekiliyên ziman, dîn û xwînî. “Geertz tekiliyên ‘ewil’, bi taybetî bi nîzama rasyonel an jî sîyaseta modern û tekiliyên hemwelatîbûnê yên civakê da ber hev. Geertz di dewletên nû yên Afrîka û Asyayê de li du sehekên bihêz hay bû: Seheka nasnameya takekesî ya ku piştî xwe dide hêza berdewam a girêdana bi welatê xwe re ava dike ango merivantî, nijad, ziman, dîn, nêrît û seheka besbûnê (kafîbûnê) û îstîqrar a derbirîna xwe di nav tekiliyên hemwelatîbûnê yên nîzama sîyasî de, dibîne. A rastî arezûya nîzam û besbûniyê, di nav komên etnîkî yên di dewletên nû de bi awayekî hêsan girêdanên ewil xurt kirin, ji ber ku îqtîdara dewleta serdest û parêzvaniya wê dibe wek diyariyekê û ji bo wê jî şer tê kirin û dibe qada berxwedanê. (Smith A. D., 2013, r. 78-79) Him (Özkırımlı, 2016, r. 89-90) him jî (Smith A. D., 2013, r. 79-80) qala neheqiyekê dikin ku Geertz li tekiliyên ziman, dîn û xwînî wek ‘ewilîn’ nenihêriye û negotiye ev tekilî berî her tiştî tîn, ji tiştêkî din ava nebûne û em nikarin van tîkiliyan fahm bikin û bibêjin. Li gorî baweriya wî kesên bi hev girêdayî wiha hîs dikin.

Herçend di navbera nûnerên prîmordiyalîst fikr û nezîkatîyên cuda hebin jî ji bo riwangeheyeke giştî em dikarin kurteyekê jê derxînin. “Li gorî prîmordiyalîstan neteweyên îro berdewama pevrebûna ji beriya sedsalan ve heyî ye. Pêkan e ku em di dema serdema navîn bi ser de serdema antîk jî rastî neteweyan werin. Tiştê diguhere tenê girtina dirûva neteweyan in; cewhera neteweyî wek xwe dimîne. Li gorî nivîskarên vê nerînê diparêzin netewe, ew civaka ku çandê, dîrokeke, axeke û zimanekî hevpar parve dikin e. Herçiqas amûrên ku destê elîtîstên neteweyê birêvedibin an jî teknolojiyên bin destên wan cihewaztir bibe û pêş jî bikeve, ew taybetiyên ku bingehên neteweyê ava dikin naguhere. Prîmordiyalîst dipejirînin ku ji ber dek û dolabên dîrokê di jiyana neteweyan de paşveçûyin çê dibin. Lê belê ‘bextê xerab’ nikare cewhera neteweyî tune bike; tiştê divê bê kirin ji nû ve şiyarkirina neteweyan e û ji nû ve pêxistina agirê netewerweriyê ye.” (Özkırmılı, h.b. r. 85) Prîmordiyalîst baweriya xwe bi cewhera neteweyî tînin û bawer dikin ji ber şer, talan, koçkirin û pişafînê hin guherînên biçûk di dirûvên neteweyan de pêk were jî ev tişt nabe sebeb ku cewhera neteweyî xera û tune bibe.

## 1.5 NÊRÎNA MODERNÎST

Modernîzm îro di warê ravekirin û şîrovekirina xebatên netewerweriyê de serwer e herçiqas rexneyên tûj ên etnosebolîstan hebe jî ev rastî heta niha nehatiye guhertin. Ger em bi kurtasî qala nêrîna modernîst bikin jixweber ew ê tegihên wek kapîtalîzm, bajarîbûn, pîşesazî û dewletên navendî were. Û li gorî wan di serdemên kevn de ew şertûmerc tune bûn ji bo hebûna neteweyan û di serdemên modern de ew ji aliyê netewerweriyê ve hat afirandin an jî hat îcadkirin ango netewerwerî beriya neteweyê ye. Helbet ev xalên jor ji wan beşên pir kêr in ku modernîst giş li hev dikin. Ji ber xebatên modernîst pir zêde ne û em di nav wan xebatan de nefetisin em ê serî li senifandinê bidin. Em ê ji bo vê senifandinê jî ji Anthony D. Smith feyz bigrin. Cudahiyên modern ên fenomena neteweyî çi ye? Şertûmercên zayîna netewe, netewedewlet û netewerweriyê teşwîq dike çi ne? Smith li gor bersivên van pirsan nêrîna modernîst dike pînc cûre:

1. Civakî-aborî
2. Civakî-çandî
3. Sîyasî

#### 4. Îdeolojîk

#### 5. Înşayî (Smith A. D., 2013, r. 72-73)

Lê ev nayê wê wateyê ku ev senifandin bi sînoren hişk hatiye avakirin. Nûnerê nêzîkatiyên jor ne tenê bala xwe didin hêmanekê berovajî dikarin heq bidin nêzîkatiyên din jî. “Nêrînen faktorên ekonomîk derdixin pêş û her wekî yên sîyasî yan jî civakî-çandî derdixin pêş helbet di hin xalan de li hev dikin. Wekî mînak Gellner tenê balê nakişîne li ser avaniya civakî û guherîna çandî vêya bi pîşesaziyê bêhevseng jî girê dide. An jî Anderson tenê binê guherîna tegihîştina takekes xêz nake vêya bi çêbûna hin şertûmercên sîyasî û aborî girê dide. (Özkırmılı, h.b. r. 104) Di vê senifandinê de armanca me ew e ku ji bo xebatên neteweperwer sûdewer be û em mijara xwe zêde belawela nekin.

#### 1.5.1. Nêzîkatiya Civakî-Aborî

Nûnerên vê nêzîkatiyê Tom Nairn e. Li gorî wî netewe û neteweperwerî ji kapîtalîzma pîşeyî, geşedana neseqamgîr û newekhev û şerê çînî derdikeve. “Tom Nairn di berhema xwe ya *The Break-up of Britain* de saîka bingehîn a neteweperweriyê wek geşedana newekhev qebûl kir û parast. Lê belê li gorî Nairn saîka bingehîn ji pîşesaziyê wêdetir ji pêla neseqamgîr a kapîtalîzmê bû. Bi ser de jî kapîtalîzm tenê li derdûdorê nexist, bi zîncîrên emperyalîzmê re hat. Bûrjûwayên mezin ên bajarî yên kapîtalîst, di warê mêtina metingehan de ji rêvebir û artêşên dewletên mezin ên Rojavayî alîkariyên mezin dîtîn. Li hemberî vê erîşê giregirên derûdorên mêtinkirî bêçare bûn. Giregirên derdûdorê ne xwedî çek, pere, teknoloji û meharetê bûn ku serî bi giregirên mêtîngêr re bikişînin. Lê belê xwedî gencîneyek bûn. Serî li ya ku zêde zêde ji bêçaretiya rewşa wan – bi wateya rastîn a ‘paşdemayî’- dihat tedarekkirin dan:gel. Giregirên derûdorê tenê xwedî gel bûn lê belê gel danî ber çavan ku çawa çekeke bihêz e. Giregirên derûdorê gel xist nav livûtevgerê û bi ziman û çanda wan vexwendname nivîsî. Pê re jî ‘hesasiyetên girseyî’ arasteyî tevgerên berxwedena neteweyî kirin û wan vexwendin ji bo dîrokê. Ji ber wê neteweperwerî tevgerê her tim gelparêz, romantîk û çîna çepûrast jê dike ye û dîsa ji ber wê ji hesasiyetên etnîk ên girseyê dermale dibe.” (Smith A. D., 2013, r. 94)

Bi kurtasî em bibêjin li gorî Naîrn dewletên navend (core) li ser dewletên derûdor (periphery) ên paşdemayî serdestî dikirin û ev jî dibû sedema gengeşiyê di nav civakê de, bi taybetî jî di nav giregirên welatên derûdor de. Ev bertek rê li ber neteweperweriyê vekir. Civak him mît, çîrokên xwe yên lehengî û dîroka xwe ji nû ve vejandin him jî vêya ji bo geşepêdan û pîşesazîbûna xwe bi kar anîn. Lê ev nêrîn ji ber ku rêza bûyerên dîrokî berevajî dike, hatiye rexnekirin.

### 1.5.2. Nêzîkatiya Civakî-Çandî

Nûnerê herî girîng ê vê nêzîkatiyê Ernest Gellner e. Gellner teorîdanerekî girîng ê neteweperweriyê ye. “Gellner di dewra xwe de teoriya neteweperweriyê ya herî wêrek û resen hilberand û giringîya wî jî ji vir tê. Wêrek e ji ber bawer dike ku em dikarin bi çarçoweyeke teorîk neteweperweriyê rave bikin û pêş bixin. Angaşt dike ku bi modela xwe jî vêya kiriye. Resen e ji ber ku modela wî cara ewil neteweperweriyê bi awayekî sosyolojîk dadihûrîne û him bi peywend him bi kitekit jî xwe bi ser xebatên berê dixê.” (Özkırımlı, h.b. r. 156-157) Heta niha jî kesek bixwaze derbara neteweperweriyê de biaxive ew ê serî li hevoka wî ya navdar a ku mottoya teoriya wî ye bide. “Neteweperwerî ne berhema neteweyan e, berevajî yê ku neteweyan diafirîne neteweperwerî ye.” (Gellner, 1992, r. 105) Bi ya wî neteweperwerî hewceyîyek e di dewra modernîzmê de û ji ber wê jî em nikarin beriya modernîzmê qala neteweperweriyê bikin û pê re têkildar jî qala neteweyan. Gellner dîroka mirovahiyê dike sê beş: Beriya çandinî (nêçîrvan-berhevkar), çandinî û modern-pîşesazî. Di civakên nêçîrvan û berhevkar de hêzeke navendî ya sîyasî tune bû û ji bêr wê jî ne pêkan bû neteweperwerî derkeve holê. Lê di civakên çandiniyê de ne yê hemûyan be jî di piranî civakên çandiniyê de dewletên wan hebûne. Hin ji wan dewletan bihêz, hin ji wan despot û hin ji wan jî li hemberî zagonan rêzdar bûn. Dewra çandiniyê de hebûna dewletê li gor daxwazê bû. Di civakên çandiniyê de hêz li gor statu û çandê dihat tayînkirin. Tebaqayên rêveber ên xwenda ji gundiyan ku bi karên çandiniyê re radibûn – piraniya civakê jî ew bûn- bi awayekî hişk ji hev vediqetiya. Tebaqayên rêveber ji van çinan ava dibû: leşker, rahîp, papaz, rêvebir û bajarî. Di nav van tebaqayan de ji wekîhevbûneke çandî zêdetir cudabûneke çandî hebû û bi saya vê cudabûnê çerx dizivirî. Li aliyê din piraniya nifûsê kesên bi karên çandiniyê radibûn ava dikir. Van kesên gundî li cihên biçûk ên niştecihî û jiyaneke di

nav xwe de dijiyan. Têkiliyên wan ên bi derdûdora xwe yên nêz re jî bi sedemên ekonomîk bû ne sîyasî bû. Di nav van komên biçûk de jî cudahiyên çandî hebûn. Di vê asta civakî de berjewendiya kesî di wekhevbûna çandê de tune bû. Ji nav ewqas çînên civakî tenê ûlema ji wekîhevbûna çandî dikaribû feyde qezenç bikira lê ew jî ji şertûmercên vî tiştî bêpar bûn. Lê bi dewra pîşesaziyê her tişt diguhere. Ev guherîneke bêhempa, girîft û pir mezin e. Di dewrên berê de rolên civakî statîk bû û çand jî ji bo parastina nîzama civakê hêmaneke alîkariyê bû ango ne divêtiyek bû. Lê bi dewra pîşesaziyê re çand û perwedehî bû hêmana herî girîng ji bo parastina nîzama civakê. Êdî mirovê modern sêdaqat nîşanî kralekî nade devla wî nîşanî çand dide. Endamên vê dewrê bitevger in. Ji bo karibin ji xebatekê derbasî xebateke din bibin divê ji perwerdehiyêke organîzeyî derbas bibin. Kargehek ji kesên berê qet hev nedîtine û ne merivên hev in pêk tê û ji bo ji hev fahm bikin, bikaribin bi zimanekî hatiye standardîze kirin, binivîsîn û biaxivin. Ji bo van tiştan jî xwendewariyêke gerdûnî û perwerdehiyêke organîzeyî hewce ye. Êdî ji bo piraniya civakê asta wan a perwedehiyê ji bo dîtina kar diyarker e. Edî bi saya perwerdehiyê dibe xwedî nasnameyek. Di dewra pîşesaziyê de rolên civakê guherbar e û derfetên derbasbûna di nav çînan de jî hêsantir e. Di dewra pîşesaziyê de 'ev çanda berz' dibe bingeha parastina nîzama civakê. Perwerdehiyêke organîzeyî û wekîhevbûna çandî jî tenê bi dewleteke navendî dikare pêk were. Û di dewra modern de dewlet jî rewabûna xwe ji Rabêja Neteweperweriyê distîne. Ger Rabêja Neteweperweriyê nebûya çi çandêke hevpar çi jî wekîhevbûneke çandî çêdibû. Ji ber wê Gellner angaşt dike ku netewe fenomeneke dewra modern e û bi rêya Rabêja Neteweperweriyê tê afirandin. (Gellner, h.b. r. 25,47,73-74, 105)

### **1.5.3. Nêzîkatiya Sîyasî**

Di vê nêzîkatiyê de neteweperwerî di nav çarçoweya desthilatdariyê de tê nirxandin. Li gorî wan neteweperwerî ji bo bidestxistina desthilatdariyê navgînek e. Nûnerê herî girîng ê vê nêzîkatiyê John Breuilly e. Li gorî wî neteweperwerî tevgerêke sîyasî û modern e. Beriya her tiştî neteweperwerî ji bo kontrolkirina dewletê re têkildar e ango bi xwedîbûna hêz û desthilatdariyê re. Û neteweperwerî jî ji bo bidestxistina desthilatdariyê wek hincet tê bikaranîn. Di berhema xwe ya navdar

Nationalism and the State – Neteweperwerî û Dewlet- de neteweperweriyê wek doktrînek a li ser sê angaştan ava dibe, pêname dike.

1- Neteweyeke xwedî kesayeteke xweser ya bi hêsanî dikare were dîtin, heye.

2- Berjewendî û nirxên neteweyê li pêşiya hemû berjewendî û nirxên din tê.

3- Netewe dibê heta tu bibêjî xweser be, ev jî bi kêmanî tê wateya bidestxistina serdestiya sîyasî. (Breuilly, 1993, r. 2)

Em nikarin nêzîkatiya Breuilly wek teoriyek binirxînin. Bixwe ew jî di destpêka berhema xwe de, armanca xwe wiha îfade dike: “Armanca min ji bo bikaribim neteweperweriyê binirxînim, avakirina tespîtîkirin û sepandina rêbazeke giştî ye.” (Breuilly, h.b. r. 1) Breuilly bixwe li teoriyên giştî bawer nake û kesên teoriyên giştî ava dikin ji ber mînakên wan ên hilbijartî nunertiyê nakin û ji peywenda dîrokî hatiye veqetandin rexne dike. Li gorî nivîskar rêbazeke giştî yan jî nêrînek, tenê bi awayê dahûrandîna hîn mînakên dîyarkirî ya bibandor û bikitekit dikare were qebûlîkirin.

Neteweperwerî bi rêbazeke giştî nikare were nirxandin ji ber ku kirûyeke guherbar e. Neteweperwerî ji bo armancên sîyasî kêrhatî ye ev jî dibe sebab ku bikeve dirûvên cûrbecûr. Ji bo vê rêbazê pêvajoyeke bi du qonaxan pêk tê pêşniyar dike. Di qonaxa ewil de divê tîpolojîyê neteweperweriyê were pêş xistin. Di qonaxa duyem de jî cureyên cuda bi rêbaza danberheviyê dîrokî divê were nirxandin. Ji bo wê jî di qonaxa ewil de, divê tîpolojîyê neteweperweriyê were pêş xistin. Breuilly dema tîpolojîya xwe pêş dixwe li ser du xalan dîsekin. Ji wan xala ewil bi têkiliya di navbera tevgerên sîyasî û dewletê re eleqedar e. Tevgerên neteweperwer ên dema rewabûna sîyasî wek palpiştî têgiha neteweperweriyê dihat dîtin, hatibûn dînyayê jixweber li dijî dewletê bûn. Ji bo neteweperwerî bibe normek divê bi ser keve. Tenê piştî rêveberî û hikumetên bi destê tevgerên serkeftî ava bûbû, dikarin neteweperweriyê wek palpiştî rewabûna sîyasî bi kar bînin. Xala girîng a duyem jî armaca tevgera neteweperwer a dewleta li dijî wê ye çî ye. Dibe ku tevger bixwaze ji dewletê cihê bibe, dewletê nû bike yan jî bi dewletên din re bike yek. Breuilly piştî van şîroveyan tîpolojîya xwe tespît dike. Tevgerên neteweperwer ewil li gorî aramancên wan ( cihêwaz, reformîst, yekbûnîhez) dûre jî li gorî li dijî

dewletekê yan jî li dijî rexistineke sîyasî ya ne dewlet e, diseniffîne. Hîn mînakên tîpolojiya Breuilly li jêr e.

	Li dijî tevgerên sîyasî yên ne dewlet	Li dijî dewletan
Cîhewaz	Macar, Yewnan, Nîjerya	Bask, Îbo
Reformîst	Turk, Japon	Faşîzm, Nazîzm
Yekbûnîhez	Elman, Îtalyan	Ereb, Pan- Efrîqa

Breuilly dûre berê xwe dide fonksiyona neteweperweriyê. Li gorî nivîskar sê fonksiyonên bingehîn hene: Hevkarî, bi tevger xistin, rewabûn. Hevkarî ji bo lihevciwandina elîtîstên xweyî berjewendiyên cuda; bi tevger xistin, ji bo piştgiriya komên derveyî pêvajoyên sîyasî mane; rewabûn jî, ji bo mafdar derketina dewlet û hêzên derveyî yên li dijî wê ne. Breuilly dûre jî di nav vê çarçoweyê de tevgerên neteweperwer lédikole. (Breuilly, h.b. r. 9-15)

#### 1.5.4. Nêzîkatiya Îdeolojîk

Nûnerê herî girîng ê vê nêzîkatiyê Elie Kedourie ye. Li gorî Kedourie neteweperwerî li Ewropayê di serê sedsalên 19. de doktrînek e ku hatiye îcadkirin. (Kedeoure, 2017, r. 22) Em ê di vê beşê de ji berhema wî ya Avrupa'da Milliyetçilik-Neteweperwerî Li Ewropayê- sîd bigirin. Li gorî wî ji bo em bikaribin neteweperweriyê fahm bikin divê em berê xwe bidin bingeha ramanî û felsefî. Ji bo wê jî divê em bala xwe bidin fîlozofê navdar Kant. Helbet tu armanc û niyeta Kant ji bo avakirina teoriya neteweperweriyê tune bû lê felsefeya wî encamên mezin ên sîyasî derxist holê. Felsefeya Kant bi cihêkirina dinyaya diyardeyan (phenomenal world) û dinyaya hindurîn a takekesan dest pê dike. Li gorî Kant çavkaniyên zanînên me ji dinyaya diyardeyan tê û em tenê dikarin zahirî fahm bikin. Lê belê divê sinc bi dinyaya diyardeyan negirêdayî bûya. Ji ber ku di dinyaya dîyardeyan de, îhtimal û qanûnên guherbar hebû. Ger bingeha sinc dinyaya dîyardeya be, wê çaxê takakes ew ê bibe xulamên van qanûnên nedîyar. Ji ber wê divê bingeha sinc bibe dinya hindurîn

a kesan. Meriv tènê bi rêya qanûnên gerdûnî yên dinyaya hindûrin dikare bigihijê fezîlet û azadiyê. Ango vîna baş, vîna azad û serbixwe ye. “ Kant dibêje; mirovê serbixwe qaçibo dike li hemberî dinyayê, bi hêza rihê xwe, ji vîna xwe re dike xulam. Ji ber ku bawerî dikare çiyayan hilweşîne; serê wî mirovî xwîn dibe lê natewe... Ev coşiya meriv diheyirîne berhema, prensîba tayînkirina qedera xwe ye.” (Kedeoure, h.b. r. 46)

Johann Gottlieb Fichte angaşt kir kû, wî zehmetiyên di felsefeya Kant de ji holê rakirîye û tiştên ew rê dide jî doktrîna Kant a rast hatîye fahmkirin bixwe ye. Li gorî Kant tenê em dikarin dîyardeyan zahîrî fahm bikin, û ew zanîn jî bi rêya çavderî û ceribînên me pêk tê. Lê him qalkirina *tiştê di xwe de heyî* û him jî qalkirina nepêkaniya fahmkirina vî tiştî nakokî ye. Lê li gorî Fichte her tişt teyîsandina bîreweriyeke gerdûnî yan jî Ego'yê ye. Ev jî tê wateya dinyayaya derveyî bi bîreweriyeke gerdûnî girêdayî ye û divê dinya wek tevahiyeke organîk were fahmkirin. Helbet nêrîna organîk a Fichte bandor li sîyasetê jî kir. Li gorî Fichte takekes xeyalet in tenê di nav tevahiyek dibin xwedî rasteqîniyek. Ji ber wê azadî û xwepêşxistina takekes bi hemû re bibe yek û di nav wê de bihele. Fichte ji wir jî berê xwe dide ramana dewleta organîk. Dewlet ji takekasan girîngtir e ji ber ku xwedî tevahiyek bixwe ye. Lê belê tenê takekes û dewlet bibe yek azadî pêk tê. Him Fichte him jî F. W. Schelling, Schleiermacher û Johann Gottfried ji bo jinûve vejandina rihê Elman xebîtin. Her çar ramanger jî xelasiya neteweya Elman di resenbûnê de, bi taybetî jî di zimanê Elmaniya pak de dîtin. Li gorî Fichte ziman rihê neteweyê ye. Ji ber wê jî divê ziman ji peyvên biyanî bê parastin. Ewê ev tişt jî rê li ber parastina rihê neteweyî veke.

Li gorî Kedourie neteweperwerî ji nav van ramanan derket. Bi ser de angaşt a xwe hinek din jî pêşde dibe. Nivîskarên piştî Kant ên ku teoriya dewletê pêş xistin, ji aliyê civakî ve endamên çînên jêr bûn. Piraniya wan zarokên papaz, esnaf û cotkarên biçûk bûn. Qedera li pêşiya wan jî ji ya bavê wan ne dûr bû. Lê belê wan di hiş û dilê de hêzek mezin hîs dikirin. Xwedî çand, zanîn û qabîliyetê bûn lê belê dewlet bêruh, sar û vasat bû. Xwe di nav prensiyên nezan û mûteasip ên Elmanan de an jî di bin nîrê hikumdariyê de xwe fetisandî hîs dikirin. Ji ber wê jî şerê ciwanên neteweperwer ne tenê li dijî biyaniyan di heman wextî di navbera nifşan de bû jî lê helbet ev şerekî

bêçek bû. “Tevgerên neteweperwer, seferên xaçrewî yên zarokan e: navê wan bixwe jî li dijî îxtîyariyê ye: Îtalyanên Ciwan, Misriyên Ciwan, Tirkên Ciwan, Partiya Ereben Ciwan.” (Kedeoure, h.b. r. 121-122)

### 1.5.5. Nêzîkatiya Înşayî

Du navên girîng ên vê nêzîkatiyê hene: Eric Hobsbawm û Benedict Anderson. Dema em qala Hobsbawm dikin jixweber berhema wî ya bi Terence Ranger nivîsiye *Geleneşin Îcadî* (Îcada Kevneşopiyê) tê bîra me. Hê di destpêka berhema xwe de qala kevneşopiyên îcadkirî dîke û dibêje kevneşopiyên xwedî dîrokeke dirêj xuya dikin piranî xwedî dîrokeke nêzîk in. “Li dinyayê tiştê întîbaya herî kevn -bi rabirdûyeke pir li dû mayî girêdayî- dide me, herhal rûdanên merasîmên kamûyî yên ku merasîmên bi ezamet ên monarşiya Brîtanî dorpeç dîke ye. Lê belê bi awayên xwe yên modern van merasîman herî dereng berên sedsala nozdemîn a dereng û bîstemîn e. Kevneşopiyên ku kevn xuya dikin an jî kevneşopiyên ku bi angaştê kevn in, çavkaniyên wan piranî digihîje rabirdûyeke nêzîk û hin caran rastiyeke eşkereye ku van kevneşopan hatiye îcadkirin.” (Eric Hobsbawm, Terence Ranger, 2020, r. 1) Hobsbawm hişmendiya neteweyî yek ji wan kevneşopiyên ku herî şênber û berbelav dibîne. Hobsbawm netewe û netewperweriyê berên wek endezyariya civakî dibîne û li gorî wî di vê pêvajoyê de tiştê herî girîng ê divê bê lêkolînkirin û ronîkirin jî ‘kevneşopiyên îcadkirî’ ye. Kevneşopên îcadkirî bi rêya dubarekirina berdewamî dibê sebeb ku hin nirx û tevger daxilî nav jiyana me bibe û pireke di nav rabirdû û îro de çêbibe. Ev jî hesta berdewamiyê diafirîne. Li gorî wî hişmendiya neteweyî, kevneşopa herî berbelav û şênber a îcadkirî ye. Herçiqas ev kevneşopî di demên modern de hatibin hilberandin jî îro û rabirdûya munasîb bi hev girê didin û hewl dide ku piştgirî û yekîtiya di navbera endamên komên civakê pêş bixe. (Eric Hobsbawm, Terence Ranger, h.b. r. 2-5)

Yek ji nûnera nêzîkatiya însayî jî Benedict Anderson e. Berhema wî ya herî navdar jî *Hayali Cemaatler* (*Cimaetên Muxayyel*) e. Di serî de pênaseya neteweyê dîke: Netewe civakeke siyasî ya xeyalkirî ye – bi awayekî xwezayî him bisînor e him jî desthilat e. Li gorî wî netewe xeyalkirî ye ji ber ku endamên neteweya herî biçûk jî ew ê piraniya endamên din ên neteweya xwe nas nekin, ew ê tiştêk di derheqê wan de nebihîzin lê ew ê di hişên wan de xeyala yekîtiyê û bihevrebûnê herdem bijî. Bi

sînor e ji ber ku neteweyên din hene û sînorên wan jî heye ev tişt ji bo neteweyên herî mesîhî jî derbasdar e. Mînaka xiristiyanan dide û dibêje ew bixwe jî xeyala cihaneke tevahî xiristiyan nakin û bi sînor e. Desthilat e ji ber ku ji nav demên Ronakgerî û Şoreşê derketiye. Mirov li dijî xanedaniya hîyerarşîk derketine û li dû xewna azadbûnê çûne. Ji bo azadiya xwe jî dewleta desthilat wek kevirê mîhenk û amblem dîtine. (Anderson, 2020, r. 23-25) Rexneya herî mezin jî li dijî însayîyan ev e. Ger netewe diyardeyeke îcatkirî yan jî xeyalî be çima kes an jî kom ew ê xwe ji bo vê têgiha çêkirî bike qurban. Anderson wiha dibersivîne: Taliya talî netewe wek civak an jî cimeat tê xeyalkirin. Di nav civakekê de newekhevî û mêtin di çî astê de be jî netewe wek rêhevaltiyeke kûr û berwarî tê sêwirandin. Bersiva pîrsa kes an jî kom ji bo neteweya xwe, xwe dikin qurban jî ev hesta biratiyê ye. (Anderson, h.b. r. 26)

## 1.6. NÊRÎNA ETNO-SEMBOLÎST

Nêrîna me ya dawîn a derbara avabûna neteweyê de etno-sembolîzm e. Di navbera nêrîna pîmordiyalîst û modernîstan de wek pirrek e. Terma etno-sembolîst ji bo kesên ku di dahûrandinên neteweperweriyê de, girîngî didin rabirdûya etnikî ( û çandê) tê bikaranîn. Bi saya xebatên wek Anthony D. Smith, John Hutchinson û John Armstrong hatiye avakirin. Lê ji wan navê Anthony Smith bêtir derdikeve pêş û em ê jî ji bo nêrîna etno-sembolîst fahm bikin, jê sûd werbigirin. Anthony Smith di destpêka *Etno-Sembolizm ve Milliyetçilikê* de dibêje; divê etnosembolîzm wek teoriyek zanistî neyê dîtin. Berovajî derbara netewe û xebatên neteweperweriyê de divê wek riwangeyek an jî bernameyeke lêkolînê were dîtin. Li gorî wî nêzîkatiya etnosembolîst ji bo doktrînen heyî û kevn tamamker û rastkereke girîng e. Temamker e ji ber ku hewl dide valahiyên vebêja modernîstan tijî bike. Rastker e çawa hîn argumanên perrenialîstan ( qedîmîger) nîqaş dike û pê re jî tadîl dike. Ev rewş ji bo modernîstan jî derbasdar e. (Smith A. , 2017, r. 11) Rexneyên xwe dijî modernîstan didomîne û lê zêde dike: Ger em zehmetiyên têgihî yên wek “netewe”, “nasnameya neteweyî” û “neteweperwerî” bidin ber çavan, ew ê ji me re cazîp were ku em wek pêkhatineke rabêjî nêzîk bibin û neteweyan jî ji aliyê dewlet û çînen elîtîst ve hatiye afirandin û beralîkirin, binirxînin. Lê belê bi vê nêzîkatiyê pîrsgirêka “azweriyê” ango gelek mirovên ji bo neteweya “xwe”, xwe dikin gorî û girêdayîna azwerî tê

piştguh kirin. Mirov ji bo pêkhatineke rabêjî jiyana xwe feda nakin. “Netewe” li kêleka xeyalkirinê bi hestkirinê bi azwerkirinê û dest bi çalakî kirinê çêdibe. (Smith A. , h.b. r. 27)

Anthony Smith ji bo jêderk û geşedena neteweyan fahm bike bersiva sê pirsan girîng dibîne.

- 1- Netewe kî ye? Modelên neteweyên modern û bingehên wê yên etnîkî çi ne? Netewe yek bi yek çima derket holê?
- 2- Neteweyek çima û çawa diwelide? Ango mekanîzmayên etnîsîtiyên xweyî guherbarî û curbicurî ber bi avabûna neteweyê dibir çi ne?
- 3- Netewe kengî û li ku derketiye holê?

Ji bo em karibin bersiva netewe kî ye bidin divê em berê xwe bidin jêderkên etnîkî ji ber ku piranî neteweyên îroyîn berdewema civakeke etnîkî ye. Taybetiya civakeke etnîkî jî ev in( an jî bi navê wê ya Frensî bibêjîn ya *etnî* );

- 1- Naveke taybet a kollektîf
- 2- Mîteke hevpar a binemalî
- 3- Bîranînên dîrokî yên tînan parvekirin
- 4- Cudabûna çanda hevpar dibe ku ev hêmanek be yan jî ji yekê zêdetir be.
- 5- Têkiliya bi “wargeheke” taybet
- 6- Hesta hevgirtine di nav piraniya beşên girîng ên nifûsê de

Nifûsek çiqas xweyî van taybetiyan be an jî parve bike ( û çiqas zêde xweyîyê van wesfan be an jî parve bike) ewqas nêzî civaka etnîk a îdeal an jî tîpa etnî dibe.

Etniyek çawa dirûv digire an jî çêdibe? Wek ampîrîk du şeweya wê hene; biyekbûn û dabeşbûn. Ji biyekbûnê pêkhetina etnîkî ya ku bi tevîhevbûna di nav hev a yekîneyên cuda tê qestkirin. Ev jî pevkelîjîna dewletbajaran an jî pişaftina kabîleyan a di nav hev de ye. Ango daqurtandina yekîneyekê ji aliyê yekineke din ve ye. Ji aliyê din ve etnî, wek mînaka mezheba Şîyan bi rêya dabeşbûnê yan jî wek mînaka li Bangledeşê beşek ji nav cimeata etnîk komeke nû ava dike û bi vî awayî dabeşî binbeşan dibin. Li gorî Smith nasnameyên etnîkî xurt in. Lê ev nayê wê wateya ku qet guherîn di nav wan de çênebûye. Wek mînak şer û fetih, sirgûn û

kolebûyin, pêlên koçê û guhertina dîn, yek ji wan sedaman e ku guherîna çandî di nav nasnameya etnîk de çêdike. Lê ev rê li ber bi temamî ji holê rakirina nasnameya etnîkî venekirîye ji ber ku nasnameya etnîkî li dijî dafikên dîrokê qewîn e. Gelo nasnameya etnîkî saya çî xurt e û ya ku mekanîzmaya nûkirina etnîkî çî ne. Ji bo bersiva van pirsan çar mekanîzma hene:

- 1- Reforma Dînî: Herçiqas ji bo nemiriya potansiyela etnîkî dîne rêxistinkirî girîng be jî, divê em tevgerên reformên dînî ji bo hişyarkirina xwenûkirina etnîkî bidin ber çavan. Em vêya di dîroka Cihûyan de dibînîn. Wek mîna di sedsala B.Z 7 û 8. de tevgerên piştî xwe didin Kitab-i Mûkaddes û Pêxember, di nava sedsala P. Z 5. de reformên Ezra, di sedsalên 18. û 19. de tevgerên Hasîdîk h.w.d. Di wan mînan hemûyan de reformên dînî û nûkirina etnîkî derbasî nava hev bûne.
- 2- Deyngirtina Çandî: Nemiriya etnîkî, ne bi tecrîtbûnê berovajî bi saya bi têkiliyeke çandî ya bikontrol û deyngirtineke hûrbijarî pêk tê. Wek mînak Cihû ji Îskender şûnde bi çanda Helenîstîk xwe nû kirin. Wek mînakên din jî em dikarin bala xwe bidin Japonya, Rûsya û Misira sedsala 19.
- 3- Tevlîbûna Gel: Tevlîbûna girseyî ya gel ji bo jiyana çandî û siyasî rê li ber jiholêrabûna etnîk digire. Wek mînak tevgera mezin a Mazdakî ya civakî-dînî herçend bingeha Îrana Sasanî qels kiribe jî, ji aliyê din ve avaniya xisareke mezin dîtiye, nû jî kiriye. Bi heman miqamê em dikarin mînaka tevgerên gel ên di nav civaka Cihûyan de qewimiye jî bidin
- 4- Mîten derbara etnîka bîjartî de: Mîten derbara etnîka bîjartî de, xwe li dilê nemiriya etnîkî bi cî kiriye. Beriya her tiştî, tiştê bala me dikişîne ew etnîyên ji mîten etnonavendî bêpar in, piştî serxwebûna xwe wenda dikin, zûtir ji aliyê cimeateke din ve tîndarî dan. Ev xal ji bo Cihûyên ji kerasetên ewqas mezin xilasbûyî û hê jî li ser piya mayî bivênevê ye. Ji bo vê xalê çend mînakên din jî ev in: Amharayên Etopyayî, Ermenî, Yewnanên derbasî Ortodoksî bûne, Rûsên Ortodoks, Durzî, Sîhî, li tenîştî vana Polonî, Elman, Îngilîz, Kastîlî, Îrlandayî, Îskoçî û Gallî h.w.d.

Bi saya wan mekanîzmayên jor civakên etnîkî bi sedan sal hebûna xwe domandin. Di nav vê pêvajoyê de avaniyên tovên etnîkî ( ethnic cores) çêbûn.

Zanîna tovên etnîkî ji me re dibe alîkar ku em netewe kî ye û li ku ye bibersivînin. Împaratorî û dewlet li derdora etnîya serdest ava bûn. Di netewedewletan de piranî etniya serdest bi rêya pişaftin an jî dagirkirinê etniyên din di nava xwe de helandin. (Smith A. D., Milli Kimlik, 2017, r. 39-88)



## **BEŞA DUYEM: KURDÊN SÛRIYÊ Û NETEWEPERWERÎ**

Ger em bixwazin xebatekê li ser Kurdan binivîsinin em bêgav in, serî li dîrokê bidin. Ji ber Kurd perçebûyî ye û pê re têkildar jî rûdanên dîrokî bi awayekî rasterast bandor li jiyana wan dike. Hamit Bozarslan jî vê rewşê wiha îfade dike. “Xebateteke entellektuel a neteweperwer a Kurd, dixwaze bira lînguîstîk be, yan jî hunerî, dixwaze polîtîk yan jî îdeolojîk be, serî li dîrokê dide û wê jî diteyîsîne.” (Bozarslan H. , 2005, r. 35) Em jî di vê qinaetê de ne; bêyî dîroka Sûriyeyê û pê re têkildar dîroka Kurdan, em ê dahûrandineke rast nikaribin çêbikin. Ji ber naveroka romanên bi awayekî xurt van bûyeran diteyîsîne. Ger em ji rûdanên dîrokî bêhay bin em ê şîroveyên şaş bikin. Ji ber wê jî me dîroka Sûriyeyê li gor pîvana rûdanên girîng kir sê beş û nirxand: ji dema mandateriya Fransîzan heta serxwebûnê(1920-1946), ji piştî serxwebûnê heta desthilatdariya partiya Baasê (1946-1963), ji dema desthilatdariya baasê heta îro ( 1963-....)

Helbet me qala rewşa wêjeyî ya Kurdan nekira ew ê xebata me kêma bima. Ji ber wê me beşên bi navê Rewşa Çandî-Wêjeyî Ya Kurdên Sûriyeyê û bi navê Kurdên Sûriyeyê û Roman nivîsî.

### **2.1.DÎROKA SÛRIYÊ Û KURDÊN SÛRIYÊ**

Di sala 1516an de bi şerê Mercîdabîkê Sûriyeya îroyîn ket destê Împaratoriya Osmanî û ev desthilatdariya Osmanî heta dawiya şerê cihana yekemîn domiya. Piştî şer wenda kir şûnde di cotmeha sala 1918an de bi îmzekirina peymana Mondrosê desthilatdariya Osmanî li ser Sûriyeyê bi dawî bû. Lê beriya vê peymanê ji aliyê dewletên wek Rûsya, Britanya û Fransa di 16ê Gulana 1916an de bi peymana Sykes-Picotê erdnigariya Osmanî û pê re têkildar jî erdnigariya Kurdan di nav hev de hatibû parvekirin. “Piştî peymana Saykes-Picot û projeya Parçekirina Paşmayên Osmanîyan ku di navbera Îngilîz û Fransa û Rûsan de çêbû û Kurdistan bi vê encamê bû çar perçe û bi encama peymana San Rîmo ya ku di 19-26 Avrêla sala 1920an de pêkhatî de; Cizêra Kurdî tevî Sûrye bû û cîyên din jî di sala 1921an de tevî bûn. Û goriya vê yekê jî sînora navbera Sûrye û Tirkiyê hate danîn. Ev peyman di navbera dewleta Fransa û Tirkiyê de, di 09.03.1921ê de, li Londonê hate mohrîkirin. Ev peyman bi xwe

du caran hate rastkirin û guhertin. Ya yekemîn li Enqerê di 20ê Çiriya pêşî ya sala 1921an de çêbû. Ya duyemîn bi peymana Covnan a di sala 1926an de bû. Lê sînora forma xwe ya dawîn nestand heta sala 1939an. Gava herêma Eskenderûn tevli Tirkîyayê bû, li hember vê jî sê herêmên Kurda dane Sûrye, ew jî : Cizirê, Kobanî û Efrînê bûn.” (Temo, 2012, r. 39) Di 14ê Tîrmeha sala 1922’an mandateriya Fransa ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve hat qebûlkirin û bi awayekî fermî heta rizgariya Sûriyeyê ya di sala 1946an dewam kir.

Li gorî çavakniyên klasîk ên Erebi hebûna Kurdan a li Sûriyeyê herî kem hezar sal e. Bi serdema Hamdaniyan (905-1004) dest pê dibe û bi dema Eyyûbiyan re hêzên xwe zêde dikin û piştî wê jî hebûna xwe li vê erdnigariyê didomînin. (Yıldırım, 2015, r. 29,37,43) Kurd herçend li Şamê jî xwedî hejmareke têra xwe hebin jî piraî di bin sînorê Tirkîyê de ango li bakurê Sûriyeyê dijîn. Herêma Kurdên ku li Sûriyeyê dijîn wek Rojava tê nasîn. “Di dokumentên Îngiliz û Fransîzan de ji bo Kurdistanê Sûriyeyê têgiha Rojavayê Kurdistanê hatiye bikaranîn. Ev têgih ji aliyê hin nivîskarên Kurd ve di berhemên xwe de jî hatiye bikaranîn. Wek Salah Bedruddîn di sala 1998 an de, di xebata xwe ya bi Erebi nivîsîye de navê Garbu Kurdistan (Rojavayê Kurdistan) lê kiriye. (Yıldırım, h.b, r. 27) Piştî serhildanên li tevahiya Sûriyeyê dest pê kir û Kurd jî serî hildan û gelek bajarên xwe rizgar kirin. Bi taybetî jî piştî berxwedana Kobanî û şerê li dijî DAÎŞê di nav rayagiştî ya cîhanê de herêmên Kurd lê dijîn wek Rojava hat nasîn.

Hebûna Kurdan a li Sûriyeyê herçend bigihêje beriya hezar salan jî di dema Osmaniyan de ev hêjmar zêdetir bû. “Di nav Kurdên ku ji demên qedîm ve li bakurê Sûriyeyê dijîn de, rêjeyeke mezin civakên koçber ên ku ji Kurdistanê Iraq û Tirkîyê dihatin hebû. Koçberkirina bi zorê ya eşîretên Kurd û ji bo parastina rêya Hecê avakirina hêzên leşkerî yê ji Kurdan pêk dihat bû sebeb ku Li Sûriyeyê bi taybetî jî li Şamê bi rêjeyeke zêde hejmara Kurdan di dema Osmaniyan de zêde bibe.” (Fuccaro, 2012, r. 89-90) Di dîroka nêz de jî piştî têkçûna serhildana Şêx Seîd kesên ku xwestin ji Tirkîyê birevin berê xwe dan Sûriyaya di bin mandetariya Fransayê de. Hinek Kurd jî di serê salên 1940î ji ber xela û xizaniyê hatin Sûriyeyê. (Altuğ, 2013, r. 43-44) Serjimara Kurdên li Sûriyeyê û Rojavayê Kurdistanê dijîn her tim bûye cihê gengeşî ye. Ji ber tu car jimartineke taybet ji bo Kurdan çênebûye. Bixwe

netewperwerên Ereb jî hemû kesên li Sûriyeyê dijîn wek ereb qebûl kirine. Ev jî her tim bûye asteng ji bo hînbûna serjimara rast a Kurdan. Li gorî David McDowall bixwe ew jî texmînên M. Van Bruinessen ên ji bo sala 1979an e û ji xwe re esas digire û van doneyan jî ji bo sala 1993yan rojane dike. Li gorî wî serjimara Sûriyeyê 13.200.000 e û Kurd jî 1.100.000 e û wek rêje jî % 8 e. (McDowall, 1996, r. 30) Di serê salên 1950î de çavkaniyên Sûriyeyê, nîşanî me dide ku ji serjimara Sûriyeyê ya di serê salên 1940î de %8.5ên wan bi Kurdî piraniyan wan jî bi zaravaya Kurmancî diaxivin. Ev rêje, ji rêjeya etnîkî ya Kurdan a ku li gorî îstastîkên serdemên berê yên Fransizan dihat qebûlkirin (%7.5-8) hinek zêde ye. Vê nehevgerîna mirov bi cudabûna çavkaniyan bikare rave bike jî, mirov dikare wiha jî rave bike ku Fransizên ku millet dijimart haya wan ji rastiya ku kurdên Xiristiyan û Cihû yên ku bi kurdî diaxivîn tune bû û wan wek Kurd hesab nedikir. (Fuccaro, 2012, r. 89-90) Kurd zêdetirî % 10an ya nifûsa Sûriyeyê pêk tînin. (Montgomery, 2007, r. 12) ...Û mirov dikare bêje ku gelê Kurd nifûsa wî jî tevahiya hejmara nifûsa % 15 ya Sûryê ye. (Temo, 2012, r. 41)

Em ê rewşa dîrokî-sîyasî ya Kurdan di sê beşan de binirxînin.

- 1.) Rewşa dîrokî-Sîyasî : ji dema mandateriya Fransizan heta serxwebûnê(1920-1946)
- 2.) Rewşa dîrokî-Sîyasî: ji piştî serxwebûnê heta desthilatdariya partiya Baasê (1946-1963)
- 3.) Rewşa dîrokî-Sîyasî : ji dema desthilatdariya baasê heta îro ( 1963-....)

### **2.1.1. Rewşa Dîrokî-Sîyasî : ji dema mandateriya Fransizan heta serxwebûnê(1920-1946)**

Dr Nafiz dema dibîne ku nikare li Tirkiyê bixebite û ew ê bê girtin bi birayê xwe û hîn hevalên xwe ji Tirkiyê direve û berê xwe dide Sûriyeyê. Nûreddin Zaza jî di otobiyografiya xwe de qala wan deman û dû rûyên ji hev cuda yên mandateriya Fransayê dike. Rûyê ewil erênî ye û dibêje li Helebê em nedihatîn şopandin, îşkence nedidîtin û xwedî azadiya guhdarkirin û gotina stranên Kurdî bûn. Rûyê duyem jî neyînî ye û bi têkiliyên Fransa û Tirkiyê re tekîldar e. Dr Nafiz û hevalên wî di serî

de ji rêveberiya mandater pir bi hevî ne û heta bawer dikin ku ew ê mandaterî piştgiriyê jî bide wan ji bo doza Kurdistan. Lê zû lê hay dibin ku ev hevî pûç e. Bi ser de Fransa bi zor û zehmetî serlêdana wan a ji bo mayîna Sûriyeyê qebûl dike. Zaza li ser vîya dibêje ku me wê çaxê nizanîbû ku siyaseta Fransayê ya li hemberî Kurdistan bi têkiliyên Tirkiyê re têkildar teşe digire. (Zaza, 1994, r. 85-86) Ev her du rewş gelek baş helwesta Mandateriya Sûriyeyê ya li hemberî Kurdistan bi me dide fahmkirin. Rêveberiya mandater destûr daye xebatên çandî heta raddeyekê jî xebatên siyasî. Lê her tim li dijî rêvebirineke serbixwe ya Kurdistan sekiniye. Mandaterî ji bo rêvebirina tevahiya Sûriyeyê jî berê xwe daye cihewaziyên navxweyî. Li Sûriyeyê gelek komên etnikî û dînî dijîyan. Wek Kurd, Ermen, Tirkmen, Çerkez, Çeçen, Durzî, Elewî, Sunni, Cihû, Xiristiyan, h.w.d Fransiz jî li hemberî yekîtiya netewperweriya Ereban piştgirî da kêmaran. Bi vî awayî pêşî li navendbûna hêzekê girt û bi saya vî siyaseta xwe ya hevsengiyê bi salan desthilatdariya xwe domand. “Fransiz ligel cihewaziyên herêmî yên mezin jî Sûriyeyê heta sala 1936an bi polîtikayên otonom û alîgirtina kêmarên dînî yên ne sunnî bi rê ve bir. Li ser vî esasî Sûriyeyê li gorî herêmên ku kêmar lê dijîn wek pênc herêmên îdarî hatin parvekirin.

- 1-) Sencaqa Îskenderûn
- 2-) Sencaqa Durziyan
- 3-) Sencaqa Çiyayê Elewî
- 4-) Sencaqa Cizîrê
- 5-) Herêma ku ji Hama, Halep û Şamê pêk dihat.” (Altuğ, 2012, r. 28)

Rêveberiya Mandater a Fransizan li hemberî maf û daxwaza otonomiya Kurdistan jî heman polîtikayê meşandin. Destûr nedan rêveberiyeyeke otonom ji bo Kurdistan lê xebatên çandî û siyasî yên Kurdistan jî qedexe nekirin. Fransizan nedixwest yekitiyeke neteweperwer a Ereban çêbibe him jî ji ber têkiliyên xwe yên Tirkiyê jî otonomiya Kurdistan li dijî berjewendiyên xwe didîtin. “Fransiyan li gor berjewendiyên xwe danûstendin bi Kurdistan re kirin. Ew jî bêtir bi xwesteka têkeliyên Fransa ve girêdayî bûn û hedarnebûna wan têkeliyan jî heta astekê jî bi Tirkan re hebû çimkî tim ew têkilî dilolijîn (diçû û dihat). Lê meriv dikare bibêje ku tu projeyên wan tune bûn. Ne ji bo danpêdan û ne jî ji bo pişaftin û tunekirina Kurdistan.” (Temo, 2012, r. 46) Piştî têkçûna serhildana Şêx Said kesên ji desthilatdariya Tirkiyê reviyên

berê xwe dan Sûriyeyê. Wan kesên hatin herêma Kurdan bi xwe re fikr û ramanên neteweperwer jî anîn. Di nav wan kesan de kesayetên girîng û dihat nasîn jî hebûn. Dr Nafîz û birayê wî Nûreddin Zaza, Osman Sebrî, Qedrîcan, Haco Axa, Memdûh Selîm Beg, Ekrem Cemîlpaşa, Qedrî Cemîlpaşa û birayên Celadet û Kamiran Bedirxan, hinek ji wan navan bûn. Ev rewşenbîr li koçberiyê jî vala nesekinîn û ketin nav xebatên siyasî. Ji xebatên wan rexistina Xoybûnê derket. "Xoybûn di sala 1927an de li bajarê Lubnanê yê Bhamdunê ava dibe û serokê pêşîn Celadet Bedirxan e." (Alakom, 2011, r. 28) Ne tenê serokê Xoybûnê ji me re nas e rêvebiriya rexistinê jî ji navên nas u navdar pêk tên. "Rewşenbîrên wek Memdûh Selîm û Mehmed Şukru Sekban perwerdehiya xwe li Stenbolê dîtibûn û mejiyê Xoybunê pêk dianîn. Di rêza pêşîn de jî wek kesên karîzmatîk Haco Axa, Emînê Perîxanê û lawê Şêx Seîd Alî Riza hebû. Van kesan ji cihên ku hatibûn gelek dihatin nasîn û hêza civaka keneşopî ya Kurdan ango temsîla eşîretan bûn. Kesên wek Kerîm Beg, Kamil Beg û Tewfik Begên ku di ordiya Osmanî de xebitibûn jî kadroya leşkerî ya Xoybûnê ava dikirin." (Alakom, h.b. r. 39-40) Aramanca Xoybûnê birêxistinkirina serhildana Kurdên li Tirkîyê bû. Bi alîkarî û pêşengiya Xoybûnê serhildana Agiriyê jî di sala 1927an de dest pê kir. Îhsan Nûrî Paşa ji aliyê Xoybûnê ve wek serleşker tê tayîn kirin û şerên giran li çiyayê Agiriyê û hawirdora wê diqewimin. Dewlet vê serhildanê jî wek serhildanên din bi rêbazên tund ên leşkerî ditepisîne. Yek ji endamê Xoybûnê jî Osman Sebrî bû. Ji aliyê Xoybûnê ve ji bo nameyek bigihîne ji Seyîd Riza re tê peywirdarkirin. Ji ber vî karî Osman Sebrî dîsa vedigere nava Tirkîyê û haya mandateriya Fransîz jî ji vêya çêdibe. Dema vedigere ji aliyê mişteşarê Fransîz ve sirgûnî Reqqayê dibe. (Sebrî, 2003, r. 111) Ji vê mînakê jî em fahm dikin ku mandateriya Fransîz naxwaze têkiliyên wan bi Tirkîyê re xera bibe. Lê aliyê din jî wek Nelida Fuccaro jî ifade dike ku Fransîzan pir guh nedan xebatên Xoybûnê. Armanca xebata Xoybûnê jî teşwîkkirin û belavkirina nasnameya Kurdîtiyê bû. Fransîz bal dikişandin li ser piranî Kurdên li Sûriyeyê xwe bi armanca vê partiyê pênasê dikirin. (Fuccaro, 2012, r. 108-109) Jordî Tejel jî ifade dike ku ger mandaterî bixwesta bi hesanî dikarîbû hemû xebatên Xoybûnê asteng bike lê dixwest Kurdan wek qartek li hemberî rijîma Kemalîst di destê xwe de bigire. Di dawîya dawîn de mandaterî her tim li dijî berjewendîya Kurdan bi Enqerê re li hev kiriye. (Tejel, 2015, r. 46-47) Giringiya Xoybûnê ew bû ku cara ewil ne ji aliyê şêx, axa û eşîretan ve ji

aliyê rewşenbîrên Kurd ve bi hestên neteweperwer tevgereke çekdarî hatibû birêxistinkirin. Helbet di nav partiyê de şêx, axa û serekên eşîran jî hebû lê hemû ji bo aramanceke hevpar hatibûn ba hev. Kesê ku bixwesta bibûya endam sond dixwar ku ew ê berjewendiyên Kurdan li ser nasnameyê xwe yê malbatî û eşîrî bigire. Partiya Xoybûnê digel şerê cîhana duyem car din çalak bû jî piştî serhildana Agiriyê têk çû hêza xwe wenda kir

Di salên 1930iyan de du nêrîn di nav Kurdan de hebû. Eşîretên xiristiyan û hin eşîretên misilman ên Kurd piştgirî didan mandateriya Fransiyayê. “ Di sala 1932an de serokên herêmî yên Kurd û Xiristiyanan, ji bo li Cezîrê rêvebiriyeke taybet were avakirin serî li rêveberên Fransîzan dabûn” (Fuccaro, h.b. r. 112) Hinek eşîretên Kurd jî bi eşîretên Ereban li dijî mandateriya Fransiyayê bû. Di sala 1936 an de navbera Bloka Neteweyî ya ku pîranî ji kesên erebên neteweperwer pêk dihat û Fransayê peyman hat îmzêkirin. Ev peyman jî destûr da Sûriyeyê bibe serbixwe û erebên neteweperwer hêzên xwe zêde bikin. Di hezîran û tebaxa 1937an de hin eşîretên Kurd ên ku piştgirî didan erebên neteweperwer li Qamişlo, Haseke û Amûdê erîş birin li ser Xiristiyanan. Helbet ev jî bû sebeb ku tifaqa navbera Kurd û Xiristiyanan xisareke mezin bibîne. Li ser van bûyeran Fransa mudaxele kir û desthilatdarî carekî din ket destê wan. Lê pir zêde neajot “ Herçend Sûriyeyê di sala 1943yan de serxwebûna xwe ragihand jî, leşkerên Fransîz heta 17 Nîsana sala 1946an de li Sûriyeyê man. (Yıldırım, 2015, r. 95)

### **2.1.2. Rewşa Dîrokî-Sîyasî: ji piştî serxwebûnê heta desthilatdariya partiya Baasê (1946-1963)**

Di sala 1946an de welatekî nû bi navê Dewleta Sûriyeyê Ereban tevî Neteweyên Yekbûyî bû. Salên navbera 1946 û 1958an de ji bo Sûriyeyê wek dema serxwebûnê tê binavkirin. Ev serdem wek serdemên darbeyan jî tê zanîn. Di eslê xwe de ne tenê ev serdem tevahî dîroka Sûriyeyê piştî Fransîzan bi darbeyên leşkerî teşe digire. “Hinek darbeyên li Sûriyeyê yên ku li dû hev dihatin, bi pêşengiya efsêrên Kurd yên ku piştî sala 1933an tevî arteşê bûbûn, çêbû. Lê belê vana hemû ( wek mînak Edip Çiçekli/ Şişikli û Husnu Zaim) Kurdên bûbûn Ereban bûn. Ligel vêya jî piştî di sala 1954an de Şişiklî tê daxistin, li ba Ereban antîpatiya Kurdan hê zedetir xuya dibe. Ji arteşê efsêrên Kurd tê tasfîyekirin.” (Hür, 2014) Di sala 1954an de

pergala komarî vedigere û heta sala 1958an ji bo Sûriyeyê aramiyeke demborî çêdibe. Ev aramî bandoreke erênî li aborî, perwerdehî û jiyana civakî dike û di van waran de pêşketin çêdibin. Lê wek Nûreddin zaza jî îşaret dike artêş wek gewdeyekî mezin yê ku %50 butçeya dewletê dixwar li nava civaka Sûriyeyê xwe bi cî kiribû. Ev artêş jî di bin bandora partiyên panereb de bûn. (Zaza, 1994, r. 85-86) Nûreddin zaza û hevalên wî jî ji vê bayê neteweperweriyê xwestin îstifade bikin û di dawiya sala 1957an de bi serokatiya Nûreddin Zaza Partiya Dimoqrata Kurdî li Sûriyeyê (PDKS) ava bû. Di demeke nêz de ev partî di nav Kurdan de bi hêz bû. Di wê salê de Cegerxwîn û hin kadroyên li Cizîrê ji partiya komînîst a Sûriyeyê veqetiyabûn û partiyeke bi navê ‘Azadî’ vekiribûn. Piştî damezrandina PDKSê Cegerxwîn û hevalên wî partiya Azadiyê ji hev dixin û tevî PDKSê dibin. Hinek kurd jî ji çiyayê Kurmenc ji partiya komînîst veqetiyabû û navên wek Reşîd Hemo Mihemed Alî Xoce, Şewket Henan, Xelîl Mihemed û hin kadroyên din jî tevî PDKSê bûn. Di demeke kurt de endam û hogirê partiyê gelek zêde bûn û ji bo propagandaya partiyê bi navê ‘Dengê Kurd’ rojnameyek bi Kurdî û tîpên Latînî hat weşandin û belavkirin. (Temo, 2012, r. 52-53) Jordi Tejel jî îfade dike ku PDKS di demeke kin de ji xwe re li Cezîre, Cerablûs û cihên biçûk ên Çiyayê Kurmenc piştgirî dît. Piştî îlana Komara Yêkîtiya Erebî ya Sûriyeyê-Misirê hejmara endamên PDKSê gihabû 30000 û di warê rexistinkirina bi hezaran sêmpatîzanan de jî bi ser ketibû. (Tejel, 2015, r. 182) Lê mixabin hundirê Sûriyeyê dîsa bi fikrên panerebîzmê re dikeliya. Partiya Baasê ya ku ji bo hilbijartina herêmî ya 1957an xwe têr nedidît û ji bo hilbijartin betal an jî taloq bibe ketibû nav hewldanan. Li Misrê di sala 1952an de bi darbeyeke leşkerî Cemal Abdunnasir hatibû ser kar. Pirsgirêka Filîstiniyan û di vî warî de piştgiriya Fransiz û Îngilîzan ji bo Îsraîl jî agirê panerebîzmê li Sûriyeyê xurttir dikir. Di sala 1958an de li Sûriyeyê di desthilatdariyê de Eniya Neteweyî hebû û bi piştgiriya Baasê re biryara yekbûyina bi Misrê re hat qebûlkirin. Di 22ê Sibata sala 1958an de komara Komara Yêkîtiya Erebî ya Sûriyeyê-Misirê ava bû. “ Bi vî awayî Baas, giha mirazên xwe yê di demeke dirêj li bendê bû: Yekîtiya Ereban û wek hêzeke serdest cihê xwe li Sûriyeyê xurttir kir.” ( Tejel 2015, r. 103 ) Piştî vê biryarê ewrên reş him li ser gelên Sûriyeyê him jî li ser Kurdan carekî din xuya bûn. Hemû partiyên sîyasî hatin girtin. Ewil rejîma nû bere xwe da komînîstan û gelek endamên vê partiyê hatin girtin û îşeknceyên giran dîtin. Dûre jî berê xwe dan Kurdan. “ Di tebaxa sala 1960an de li

tevahiya Sûriyeyê zarokên temenê wan navbera 12 û 15 an de jî tevde wek hejmar bi ser pênc hezarî mirov hatin girtin, mîmkirin û îşkence dîtin. Hin beşek ji vana hat berdan. Ez jî 8ê tebaxa di sala 1960 î de hatim girtin.” (Zaza, 1994, r. 197) Nûreddin Zaza û hevalên wan bi xinizî, sixûrtî û dijminahiya Ereben tên tawanbarkirin. Gelek îşkenceyên mezin dibînin. Di lêpîrsîneke de ji Nûreddin Zaza bi awayekî nivîskî sedema avakirina PDKSê tê xwestin. Di vê rapora xwe de helwesta Sûriyeyê ya li hemberî Kurdan bi awayekî zelal rave dike. “ Darbeyên ku li dû hev hatin tenê li Sûryê demokrasiyê neavêt bin lingan di heman wextî de mafên Kurdan jî hêdî hêdî ji holê rakirin. Piştî sala 1955an, rêvebirên xwedî yan jî di bin bandora ramana şovenîzma Baasê de bûn, dest bi şikandina plaqên Kurdî yên ku di qehwe û aşxaneyan de dihat guhdarîkirin û girtina Kurdên ku li ba wan berhemên ku bi zimanê wan hatibû nivîsîn hebû, kirin. Yekbûna Sûriyeyê û Misrê ji pêşîgirtina vê rêya komkujiya çandî dûr bû û bi ser de rewşeke hê nijadperest, hê faşîst û hê zordestane ava kir. Îro di artêşê de efserên Kurd, di dewletê de karmendên Kurd ên xwedî erk û di herêmên Kurdan de tu polîs û mamosteyên Kurd tune ye. Êdî em nikarin bi rehetî bi zimanê xwe biaxivin. Pêşeroj ji me re tarî xuya dibe û zorê dide me ku em bibin yek. Ji ber van tiştan me PDKSê ava kir.” (Zaza, h.b. r. 206-207) Pêşbîniya Nûreddîn Zaza rast derdikeve her ku diçe rewşa heyî ji bo Kurdan zehmettir dibe. Dîsa bi darbeyeke leşkerî yekîtiya Misr û Sûriyeyê xera dibe û navê wê diguhere û dibe Komara Ereba Sûriyeyê. Bixwe ji navê wê dîyar dibe ka ev dewlet li ser kîjan bigehan ava dibe. Hemû kesên li Sûriyeyê dijîn wek Ereba tê qebûlkirin. Kesên li dijî vîya bisekîniya jî wek xiniz û dijmin dihat qebûlkirin. Pê re têkildar jî zext û zor her ku diçû li ser Kurdan giran dibû. Di 23.08.1962an de bi nimreya 93yan zagonek hat derxistin û bi vê zagonê biryara di rojekê de li herêma Cezîrê jimartineke nifûsê ya awarte bê çêkirin hat standin. Rêveberiya Sûriyeyê armanca vê serjimartinê wek tespîtîkirina kesên piştî di sala 1945an hatibû Sûriyeyê nîşan dan. Fehim Taştekin îfade dike ku wê çaxê garis û pemboya ku li Cezîreyê dihat çandin di nav tevahiya Sûriyeyê de wek rêje %80 bû. Bi ser de dîtina petrolê jî qiymeta Cezîrê zêde kiribû. (Taştekin, 2016, r. 52) Di meha çirriya paşîn(mijdar) a sala 1962an de ev serjimartin pêk hat û 200000(du sed hezar) kurd ji mafên welatîbûnê bêpar hat hiştin û bûn ecnebî ango welatîyên bênasname.

“*Ecnebî-Ecnebiye* (Biyânî): Mêrên ku ji welatîbûna Sûriyeyê hatibû derxistin di watêya biyanî de ji wan re ‘ecnebî’ û ji jinan re jî di heman wateyê de ‘ecnebiye’ hat gotin û bi vî awayê hatin qeydkirin. Ev kom ji hemû mafên welatîbûnê bêpar hat hiştin. Zarokên ku di maleke ecnebî de hatibe dinyayê ew zarok jî wek ecnebî hatin qebûlkirin. Nêzî 200.000 hezar welatîyên Sûriyeyê wek ecnebî hat qeydkirin û devla dokumentên standart ên welatîbûnê documenteke sor a ku rewşa wan tê de hatiye nivîsîn ji wan re hat dayîn. Kesên di vê rewşê de bûn êdi nikaribûn bibin xwedî milk û erd, ji piştgiriya dewletê îstîfade bikin, biçin nexweşxaneyên dewletê, bibin xwedî wesayitan û di karên dewletê de bixebitin.

*Mektûm-Mektûme* (Bêqeyd, Veşartî) : Ji ber ku zewaca Kurdên Ecnebî ya bi welatîyên Sûriyeyê re qedexe bû, zarokên çêdibûn ji wan ên lawik re di wateya bêqeyd an jî veşartî de ‘mektûm’ û ji keçan re jî di heman wateyê de wek ‘mektûme’ hatiye qebûlkirin û muameleya ne meşrû dîtine. Hejmarên wê komê jî li ser sed hezarî bû û ji bo wek mektûm bê qebûlkirin ji şertên jêr yek jî hebûya bes bû.

1. Dê û bav her dû jî mektûm bûya.
2. Ji dê û bav tenê yek mektûm bûya
3. Dê welatîyê Sûriyeyê bûya û bav jî ecnebî bûya

Statuyên mektûman ji ecnebiyan xirabtir bû û ji tu mafên welatîyan nedikarîn îstîfade bikin.” (Montgomery, 2007, r. 108-115) Kesên ku bikaribûyana îsbata hatina xwe ya beriya di sala 1945 an a Sûriyeyê bikirana wek welatî dihatin qebûlkirin. Ji ber ku armanca vê serjimartinê qelskirin û pişaftina Kurdan bû ew kesên ku xwedî dokumentên ( qeyda tapûyê, qoçanên nifûsê û dokumentên dema mandateriya Fransayê) ku îsbata hebûna wan a beriya sala 1945an dikir jî bûn ecnebî. Bi serde bi vê serjimartinê gelek Kurdên navdar ên ku di karên dewletê de dixebitin jî di rojekê de bûn ecnebî û ji hemû mafên welatîbûnê bêpar man. “ Hinek jî pê hesiyar ku hinek ferdên malbatê welatî ye hinek ji wan jî nîn in. Wek mînak hinek bav welatî bûn lê zarokên wan nîn bûn; ji zarokên yek jê welatî bû lê birayê wî ne welatî bû.” (Tejel, 2015, r. 109) McDowall jî îfade dike tiştê ecêb ew bû ku Kurdên ku ji welatîbûnê hatibûn derxistin dîsa jî xwe ji xizmeta leşkeriya mecbûrî nedikarîn xelas bikin.(McDowall 2000, r. 118) Ew ê rewşa heyî her ku biçûya ji bo Kurdan xerabtir

bibûya. Li Sûriyeyê carekî din darbeyeke leşkerî çêdibû û îcar desthilatdarî tevahî diket destê Baasiyan.

### **2.1.3. Rewşa Dîrokî-Sîyasî : ji dema desthilatdariya baasê heta îro ( 1963-....)**

Di 08.03.1963an de bi darbeya Albay Harîrî re partiya baasê hat ser kar. Ev partî xwe li ser bingeha nijadperestî û şovenîzma Erebi damezrandibû. Ji bo em Baasê baştir nas bikin, em li damezrînerên wê binerîn ew ê baştir bibe.” Avakarê vê partiyê reşenbîrê xiristiyan Michel Eflak e. Ew jî yek ji wan propagandîstekî coşdar ê Nazîzmê bû yê ku di salên şer û beriya şer a ku navbera 1939-1945an de. “ (Zaza, 1994, r. 193) Bixwe fikra nijada raser a Ereban rasterast ji Nazîzmê hatibû girtin. Yek jê dirûşmeyên wan jî ev bû: Em ê rê nedin Cezîre bibe Îsraîla düyem. “ Xalên 10, 11, 15 û 20 ên rêznameya Partiya Baasê di vî warî de pir zelal bû. Di welatên Ereban de hemû kesên sîyasî û komên civakî yên ku tevlî fikra îdeala neteweya Erebi nedibû îlegal dihat qebûlkin. Ger em bînin li ser polîtîkaya ziman, zimanê dewleta dahatûyê jî ew ê Erebi bûya.” (Tejel, 2015, r. 123) Baasî Kurdan li dijî îdeala neteweya Erebi wek astengiyek didît. Ji ber wê jî biryara pişaftina Kurdan dabûn ber xwe û hemû gavên dijmirovahî li dû hev diavêtin.

Berpirsyarê Şaxa Parastina Sîyasî ya Hesekeyê Mihemed Teleb Hîlal Kurdan wek ûreke xebîs ya di gewdeya Ereban de derketiye qebûl dikir û li gorî wî bêyî jêkirin û avêtina vê ûrê tu xelasî tune bû. Mihemed Teleb Hîlal di sala 1963an de de, raporek li ser pişaftin û qelskirina Kurdan amade kir û ev rapor bi navê ‘Ji Aliyê Neteweyî, Civakî û Sîyasî ve Lêkolînek Derbara Cezîreyê De’ ji rayederên dewletê re tê hat peşkeşkirin. 12 xalên vê raporê bi vî awayî ne.

“1. Bila Kurd ber bi herêmên hundir ên Sûriyeyê ve bînin sirgûnkin.

2. Bila Kurd ji mafên perwerdehiyê bêpar bînin.

3. Bila Kurdên ji aliyê Tirkiyê ve tînin xwestin bînin îadekin.

4. Bila ji bo Kurdan derfeta kar neyê dayîn.

5. Bila li dijî Kurdan propagandeyek bînin destpêkin.

6. Bila ûlemayên Kurd bên sirgûnkirin û devla wan jî ûlemayên Ereb bên peywirdarkirin.
7. Bila li dijî Kurdan polîtîkaya parvebike-birêvebibe bê tatbîqkirin.
8. Bila li ser erdên Kurd, Ereb bên bicîkirin.
9. Bila ‘ Xeta Erebî ya Bakur’ bibe cihê leşkerî ye û Kurd ji van herêman bên derxistin
10. Bila ji bo Erebên nû tîn çewligên kollektîf bên avakirin
11. Bila kesên ku Erebî nizanin ji mafên hilibijartinê bêpar bên hiştin.
12. Kesên ku dixwazin li vir bijîn ji wan kesên ne Ereb be bila mafê welatîbûnê neyê dayîn. “(Tejel 2015, r. 130)

Pir wext di ser nivîsîna vê raporê re derbas nebûbû ku xalên wê yek bi yek hat tatbîqkirin. Yek ji van ya ku herî baş tê zanîn li hemberî xeta Kurd kembera Ereb bû. “Ev biryara ku di sala 1966an de hate standin û pêkanîna xalên projeyê dest pê kir, ji piyagirtina zemînan û pêkolên sirgûnkirina Kurdan xwe xurt kir. Ev proje li seranserî sînorê Tirkyayê û hinek jî ber bi sînorên Iraqê ve di nav dirêjîya 375 km û pahnûna 10-15 km an de pêk hat. Ji Dêrikê dest pê dikir û heta bi bajarê Serêkaniyê didomiya. Ango ji çemê Dîclê heta ber bi Xabûr dirêj dibû. Di destpêka sala 1967an de bi awayekî fermî xelkên herêma kemberê agahdar kiribûn ku ji gundên xwe bar bikin.” (Temo, 2012, r. 66-67) Her sala ku çû ev kembera Erebî firehtir û berbelavtir bû. Kurd ji gundên xwe bi zorê hatin koçkirin û li cihê wan çewligên nû hatin sazkirin û li wan çewligan jî Erebên ku ji Heleb û Reqqayê anîbûn bicîkirin. Bi van kiryanan paralel jî navên Kurdî yên gundan hat guherandin. Kes nikarîbû navên Kurdî li zarokên xwe bike.

Di dawiya hin rikeberiyên Baasê yên navxweyî di sala 1970an bi darbeyeke leşkerî desthilatdarî ket destê Hafîz el-Esad. Hafîz el-Esad heta mirina xwe angê heta sala 2000an desthilatdariya xwe domand. Hafîz el-Esed li hemberî xetereya mûxelefeta sunnî Ereb xwe nêzî Kurd û Elewîyan kir. Vêya jî bi xwe re di polîtîkaya tund a şovenîzma Erebî de hinek sistbûn çêkir. Erebkirina Cezîrê di sala 1976an de ji

aliyê Hafiz el-Esad ve hat sekinandin lê rewşa heyî bêyî biguhere wek berê ma. Sebeba vê sistbûnê ne ji ber tenê pîrsgirêkên navxweyî bû di heman wextî ji ber polîtîkayên karê derve yê Sûriyeyê bû jî. Di serê salên 1970î de di navbera Iraq û Sûriyeyê de ji ber bikaranîna çemê Feratê û xeta boriya petrolê hîn pîrsgirêk hebû. Ew jî bû sebeb ku Hafiz el-Esad piştgirî bide KDP û YNKê. Jordî Tejel jî îfade dika ku di salên 1970î de buroyên her dû partiyên li Şamê hebû. Bi ser de Rêveberiya Sûriyeyê ji bo yekitiya her dû partiyên xebitî û ev jî encam da û di sala 1987an de Eniya Yekgirtî ava bû. (Tejel, 2015, r. 123) Rijîma Sûriyeyê bi Tirkiyê re jî hin pîrsgirêk dijiya. “Rêveberiya Şamê ji ber piştî salên 1980î li ser Sencaqa Îskenderûnê ya ku di sala 1939 an de winda kiribû heq îddia kir û avakirina bendavên nû yê bi GAPê re û pê re têkildar guherandina herikîna çemê Ferat li hember Tirkiyê piştgirî da PKKê. Piştî salên 1980î rêxistinên çepgir jî ji aliyê Şamê ve hat parastin.” (Taştekin, 2016, r. 70) Hafiz el-Esad bi awayekî pragmatîst nêzî meseleya Kurdan bû. Li hemberî dewletên rikeber ‘qarta Kurd’ bi kar anî. Helwesta li hemberî Kurdan li hundirê Sûriyeyê jî bi heman miqamî meşiya. Piştî salên 1970î ji bo entegrasyona Kurdan, hin gav jî hatin avêtin. Thomas Schmidinger van gavan wiha bi rêz dika: Kurd ji bo endamtiya Baasê hatin qebûl kirin. Heta di salên navbera 1972-1976 an de bi Mahmud Eyyub re endamekî Baasê yê Kurd bû serokwezîr. Helbet berdelek qebûl kirina endamtiyê hebû. Ew jî divê ew kes ji Kurdîtî û meseleya Kurd xwe dûr bixista. Bi taybetî jî di qada olî ya Sûriyeyê de Kurd di peywîrên pîr girîng de cih girtin. Yek ji wan jî sermiftuyê Sûriyeyê yê Ahmed Kuftaru bû. Ji ber ji aliyê rijîmê ve hatibû tayînkirin û qada wî ya peywîrê gelek fireh bû. Berdevkê nêrîna olî ya Sûriyeyê bû. Helbet ev rewş ji ber du aliyên ji bo rijîmê bikêr hatibû. Ji aliyekî ve li dijî dijminê xwe yê herî xeternak ê navxweyî Birayên Misilman, bi saya olnasekî rêzdar wek Ahmed Kuftaru îslama mutedîl belav kir. Ji aliyê din ve dixwest Kurdan bi rêya dîn bipişivîne. (Schmidinger, 2016, r. 85-86) Hafiz el-Esad ji ber pragmatîk nêzî meseleya Kurdan dibû heta raddeyekê destûr dida xebatên siyasî, çandî û wêjeyî. Ji ber em ê di beşa pêş de li ser rewşa çandî û wejeyî ya li Sûriyeyê binerin. Em ê li vir bala xwe bidin helwesta rijîmê li hemberî tevgara sîyasi ya Kurdî çawa bû. Rojava ji aliyê rewşa partiyên siyasî ve pîr perçebûyî bû. “Di rastiyê de di warê rojevê de di nav partiyên Kurd ên li Sûriyeyê de cudahî pîr kêma bû. Piraniya partiyên Kurd partiyên sîyasi yê ne li herêma Kurdan şopand û bîrdoziya Marksîst û

antîempyralîst qebûl kirin. Ji bo Kurdan jî li hemberî piraniya Ereb mafên zagonî û bi îfadeyeke din xweserî dixwestin. (Tejel, 2015, r. 184) Herçend li ser kaxez partiyên Kurd ne legal bûn jî haya mûxeberata Sûriyeyê ji serok û avahiya partiyên Kurd hebûn. Schminder jî îddîfa dike ku navbera rijîm û partiyên Kurd têkiliyên ne resmî hebûn. Heta tekiliyên hinek partiyên bi rijîma Sûriyeyê re kûrtir bû û ev jî dibû sebeb ku di nav gel de ji bo wan partiyên bêbaweriyek çêdibû. Haya rijîmê ji xebatên wan jî hebû. Heta partiyek xeta sor a rijîmê bin pê nekira ji xebatên wan re jî çav dihat girtin. Xeta sor a rijîmê jî daxwaza welatekî azad li Sûriyeyê û tevgereke çekdarî li dijî rijîmê bû. (Schmidinger, h.b. r. 88-89) Partiyên wek PKK, KDP û YNK jî ji ber piştgiriya rijîmê berê xwe nedidan piştgirêka Kurdan a li nava Sûriyeyê. Ev têkiliyên baş a rijîmê bi PKKê re heta sala 1998an domiya. Tirkiyê bi mûdaxeleyeke leşkerî gefan li Sûriyeyê xwar û xwest ku hemû piştgiriya Sûriyeyê ya ji PKKê re bê qutkirin. Sûriye nikaribû li ber xwe bide û şertên Tirkiyê qebûl kir. Serokê PKKê Abdullah Ocalan 9ê Îlona di sala 1998an de ji Sûriyeyê derket û kampên nav li Sûriyeyê jî hat belavkirin.

Piştî mirina Hafîz el-Esad a di 10ê Hezîrana sala 2000î de lawê wî Beşar el-Esad derbasî şûna bavê xwe bû. Hatina Beşar el-Esad di nav gel de ji bo demokratîzebûna pergale hêviyên nû vejand. Ev hêvî bi rêya rewşenbîrên Sûriyeyê wek belavok li rojnameyan hat belavkirin. “ Di 26ê Îlona 2000î de ji aliyê 99 rewşenbîrên Sûriyeyê ve ji bo rakirina rewşa awarte û rêveberiya awarte deqeke kin bi navê ‘Belavoka 99an’ li *el-Hayat* ê hat weşandin. Viya di 11ê Çiriya Paşîn a 2000î de ‘Belavoka 1000an’ an jî ‘Dokumenta Bingehîn’, ‘Peymana Giştî Ya Neteweyî’ û ‘Belavoka 185 Sirgunî Ya Sûriyeyê’ şopand. Dokumentên herî dirêj û analîtîk ên ji nav belavokên ku di çapemeniyê de hatibû weşandin ‘Belavoka 1000an’ bû. Ev belavok diyaloga neteweyî û dayîna biryara destpêkirina hin tedbîran diparast. Hin ji wan tedbîr jî ev bûn: rakirina rewşa awarte û rêveberiya awarte, dayîna mafê axaftin, kanaat û sîyasetê, rakirina qontrolê ya li ser weşanan û derbaskirina zagona hîlbijartina demokratîk a meriyetê...Partiyên Kurd û aktîvîstên çandê yên Kurd jî tevî vê ‘Bihara Şamê’ dibûn. Li Qamişlo ji aliyê komeke rewşenbîrên Kurd ve forûma Bedirxan hat avakirin.” (Tejel, 2015, r. 229-230) Lê ev ‘bihar’ zêde neajot û piştî salekê kesên mûxalif hatin girtin û bi taybetî jî zext li ser Kurdan zêde bû. Di 12ê Adara sala 2004an di navbera tîmên Kurdên Qamişlo û Erebên Deyrezûrê li

stadyûma Qamişloyê maçeke fûtbolê hat lidarxistin. Lê alîgirên tîma Deyrezûrê li dî serokên Kurd çêran kirin û posterên Seddam Huseyîn derxistin. Piştî alîgirên Kurd jî bersiv da wan, navbera her dû alîgirên tîman de bi kêr û çoyan şer derket. Bi fermana waliyê Hesekê leşkerên rijîmê êrîş bir ser alîgirên Kurd û hinek ji wan zarok li gor çavkaniyan navbera 6 û 9 kesan mirin. (Li gorî Jerdel sê jê zarok 6 kes, Li gorî Schmidinger 9 kes, li gorî Yildirim jî 7 kes) Li Qamişlo ji bo veşartina miriyan merasîmeke mezin hat lidarxistin û dîsa rijîm erîş bir ser girseyê. Li ser viya tenê ne li Qamişloyê li Amûde, Afrîn, Dêrik, Serêkanî û Kobaniyê xwepêşand hat lidarxistin. Xwepêşander peykerên Hafîz el-Ûsad xera kirin, êrîş birin li ser hin sazîyên dewletê û otobûsên rijîmê şewitandin. Xwepêşand tene ne li herêma Rojavayê cihên wek Hama, Reqqa, Heleb û Şamê jî pêk hat. Di şêva 12ê Adarê de xwendekarên Kurd li zanîngeha Şamê êrîşa rijîmê şermezar kirin û xwepêşandek li dar xistin. Van çalakîyan heta dawîya meha adarê domiyan. “Dema meha adarê diqediya bîlanço ev bû: 43 mirî (7 jê Ereb), bi sedan brîndar, li ser 2500î girtî û wek hejmar li ser 40î xwendekar ji zanîngehan hatin avêtin.” (Tejel, h.b. r. 240) Schmidinger îfade dike ku sedema berteka zêde ya rijîmê li hemberî bûyeran ji ber hin tirsan welidî. Serokê Amerîkayê George W. Bush di axaftina xwe ya ‘Mihver-î Şer’ de Sûriyeyê jî tevî vê komê kir. Di sala 2003 an de jî Kurdên li Iraqê xweseriya xwe mîsoger kirin. Tîrsa mudaxeleyeke derveyî û xweseriya Kurdan bû sebeb ku rijîm bi tundûtîjiyeke zêde biçê ser bûyerên 2004an.” (Schmidinger, h.b. r. 95) “Jordî Tejel van bûyeran wek serhildanek û ji bo Kurdên Sûriyeyê jî wek konaxeke girîng dinirxîne. Kurd cara ewil ne tenê li bajarên xwe di heman wextî de li her cihê ku lê dijiyan bi hemwextî bi hev re rabûn ser piyan. Xwepêşandanan rasterast li dijî rijîma Baasê hat lidarxistin. Bi saya vê serhildanê Kurd di sazkirina yekîtiya sembolîk a Kurdistana li Sûriyeyê de bi ser ket.” (Tejel, h.b. r. 227-228)

Di dawîya sala 2010an de bûyerên li Tûnisê destpêka rêzebûyerên li Rojhilata Navîn bû. Piştî Tûnisê dor hat Misrê û pir neçû di sala 2011an de îcar dot hat li ser Sûriyeyê. Şer pir zû belavî nava Sûriyeyê bû. Bi wayekî hevdemî li bajarên Kurdan jî xwepêşand hatin li dar xistin lê şerekî çalak neqewimî. “Rijîma Beşşar Esed piştî du salê şerê navxweyî biryara paşvekişandina leşkerên xwe ji Rojava stend. Piştî vê biryarê hêzên PYDê di tîrmeha sala 2012an de kontrola hin herêmên sereke bi dest xist. Di vê peywendê de di 19ê Tîrmehê de rêveberiya Kobaniyê ket destê Kurdan.

Vêya di 20ê Tîrmehê de Efrîn, di 23ê Tîrmehê de Dirbêsiyê û hin navçeyên girêdayî Heseke şopand. Beriya havîn biqediya ji bilî bajarê Qamişloyê gelek cî ketibû destê Kurdan.” ( Yıldırım, 2015, r. 117) Îro jî ev pêvajoyê neqediya û şer li tevahî Sûriyeyê didome.

## 2.2. REWŞA ÇANDÎ-WÊJEYÎ YA KURDÊN SÛRIYÊYÊ

Li Rojavayê bi zaravayê Kurmancî tê axavtin. Rewşa li vir ji aliyê zaravayên ve li gor perçeyên din ên Kurd lê dijîn homojentir e. Lê belê hin îstîsna jî hene. “ Li Serêkaniyê derdora sed mal bi zaravayê Zazakî diaxivin û li Heseke jî kesên soranî diaxivin hene. Hejmara wan jî kêmtir û zêde bi qansî yê li Serêkaniyê ne. Ev kom jî ji Kurdistana Iraqê koçkirine û hatine li vir bi cî bûne.” (Schmidinger, 2016, r. 27) Rewş û pêşketina zimanê Kurdî wekî perçeyên din bi helwesta dewletên ku lê dijîn re têkildar bûye. Dema mandateriyê qedexeyeke li ser zimanê Kurdî tune bûye lê xwesteka wan a perwedehiya bi zimanê xwe jî nehatiye qebûl kirin. Kurd ji bo otonomî di 23ê Hezîrana sala 1928an de daxwaznameyek dan rêveberiya mandateriyê û xwestikên wan jî ev bûn:

- 1- Bila zimanê Kurdî li herêmê bi zimanên fermî yê din re bi hev re bê bikaranîn.
- 2- Bila li vê herêmê bi zimanê Kurdî perwerdehî hebe.
- 3- Bila li vê herêmê peywirdarên hikûmetê bi Kurdan bê guherandin. (Hassanpour 2005, r. 238)

Van pêşniyaran nehat qebûl kirin. Sûriyeyê ji ber têkiliyên xwe yê bi Tirkiyê re herêmeke otonom nedixwest. Hişê mandateriyê di meseleya Kurdan de hinek tevlihev bû. Ji bîranînên Nûreddîn Zaza û Osman Sebrî em têdigêhêjin ku rêveberiya herêmî ya mandateriyê xwe nêzî Kurdan dikir û piştgirî jî dida Kurdan. Jordî Tejel jî îfade dike ku Pierre Rondot û Roger Lescot ev her du rêveberên mandateriyê piştgirî didan rewşenbîrên neteweperwer ên Kurd û di nav van rewşenbîran de birayên Bedirxanî jî hebû. (Tejel, 2015, r. 54) Nûreddîn Zaza jî di bîranînên xwe de qala mişterê Ayn-Dîwarê Alphonsi dike. Dibêje ev ji rêveberên din ên mandateriyê cuda bû û ji karê xwe hez dikir. Alphonsi gelek piştgirî dida birayê wî Dr Nafiz.

Rojekê jî nivîskarekî ciwan Mistefa Botî ji wî daxwaza dibistanek û fêkirina Kurdî dike. Ew jî pir erênî nêzî vê daxwazê dibe û soz dide ku ew ê fikra komîseriya bilind a Beyrûtê ji bo vê daxwazê bipirse. Lê ew ewqasî ji bersiva erênî bawer e ku ji Mistefa Botî re dibêje demildest dest bi xebatên xwe bike. Lê bersiv neyînî ye. (Zaza, 1994, r. 113) Rêveberiya mandateriyê Kurdan li dijî dewleta Tirk û neteweperweriya Erebi li gor berjewendiyên xwe bi kar tanîn. Di vê peywendê de hin teşwîq didan Kurdan lê bi helwesteke eşkere jî li dijî xwe bi rê ve birina Kurdan bûn.

Dema mandateriyê tu qedexa li ser weşandin û bikaranîna zimanê Kurdî tune bû. Destpekê bi pêşengiya rewşenbîrên Kurd ên ku ji Tirkiyê hatibûn weşangerî pêş de çû. Ji wan pêşengan herî girîng jî Celadet Elî Bedirxan bû. Piştî têkçûna Serhildana Agiriyê Celadet Elî Bedirxan xwe ji nav sîyaseta aktîf kişand û li ser çand û wêjeya kurdî xebitî. Ji wan xebatan a herî girîng jî Kovara Hawarê bû. Kovara Hawarê di 15ê Gulana 1932an de li Şamê dest bi weşanê kir. Piştî 26 hejmaran di 18ê Tebaxa 1935an de navberekê dide û cardin di 15 Nîsana 1941an dest bi weşanê dike. Di 15ê Tebaxa sala 1943an de dawî li weşana Hawarê tê. Di maweya yazdeh salan de 57 hejmar derdikevin. Heta hejmara 23an kovar bi tîpên Latînî û Erebi derket. Bi hejmara 24an re tenê bi tîpên Latînî weşiya. Em di van hejmaran de rastî her cure xebatên wejeyî tên. Hawar ne tenê kovarek bû; di heman wextî de dibistanek bû û ji vê dibistanê navên wek Qedrîcan, Osman Sebrî, Cegerxwin û Nûreddîn Zaza derketin. “ Dîsa Celadet Bedirxan li Şamê bi navê Ronahiyê( 1942-1945) kovareke din birayê wî Kamiran jî li Beyrûtê bi navên Roja Nû (1943-1946) û Stêr (1943-1945) du rojname diweşîne” (Malmîsanij, 2006, r. 118) Tenê xebatên birayên Bedirxan bi van ne sînor kiriye. Di salên 1930 iyan de di bin navê kitabxana Hawarê 17 pirtûk çap dike û nav û nivîskarê van berheman bi hejmara 27an a Hawarê re bi awayekî pergali heta hejmara dawîn di rûpela dawîn de jî wek agahî tê weşandin. Cûreyên van berheman jî ji hev cuda ne. Helbest, name, rêziman û werger jî heye. Di her berhemê de jî yek ji navê birayê Bedirxan heye. “Li gor agahiyên Malmîsanij dide, di salên 1940iyan de nivîskarê her pênc pirtûkên hatiye weşandin jî ji Bakurê Kurdistanê koçkiribû. Dîsa di vê serdemê de pirtûka Ehmedê Xanî ya Mem û Zîn tê weşandin.” (Malmîsanij, h.b. r. 106) Amîr Hassanpour îfade dike piştî serdema mandateriyê heta serdema yekbûna Sûriyeyê û Misrê herçend rojnamê ji holê rabin jî ji bo weşanên Kurdî musamaha dewam kir. (Hassanpour, h.b. r. 239) Bi rastî jî wê

demê hê jî weşanên Kurdî li Sûriyeyê tê çapkirin. “ Di salên 1950iyan de ligel her pênc pirtûkên Cegerxwîn û Osman Sebrî pirtûkeke rêzimanê ya ji aliyê Reşîdê Kurd ve hatiye amedekirin tên çapkirin. Di sala 1955an de Osman Sebrî û hin hevalên wî li Şamê Komela Vejîna Çanda Kurdî ava dikin. Yek jê armanca vê komeleyê fêrkirina nivîsîn û xwendina zimanê Kurdî ye. (Malmîsanij,2006;106) Nûreddin Zaza û hevalên wî jî piştî PDKSê ava dikin ji bo Kurdan perwerde bike û haybûneke ji bo nasnameya Kurdîti çêkin bi awayekî veşartî berhemên ku bi Erebi û Kurdî diweşînin. Ji wan berheman yek jî wergera Kurdî ya Divided Country e. (Zaza, h.b. r. 196-207) Û em dizanin ku ji aliyê PDKSê ve ji bo armanca partiyên xwe parve bikin bi navê ‘Dengê Kurd’ bi Kurdî û bi awayekî perîyodîk rojnameyek tê weşandin.

Piştî Sûriye û Misir dibin yek û birdoziya panerebîzmê xurt dibe, Kurd wek dijminekî navxweyî tê dîtin û hemû tiştên bi Kurdî re têkildar tê qedexekirin. Di nav qedexeyan de çapkirina berhem hetta peydabûna berhemê bi xwe jî, guhdarkirina plaqên Kurdî û hemû xebatên fêrkirin û hînbûna Kurdî jî hebû. Ev qedexe bandor li ser weşangeriya Kurdî dike û berê weşangeriya Kurdî dide Beyrûdê. “ Di salên 1960î û 1970iyan de berhemek jî li Sûriyeyê nehat çapkirin. Di nav vê bîst salê de ji nivîskarên Kurd Ekrem Cemîl Paşa ( bi destnîşana C.P.C.ê) û Cegerxwîn berhemek li Beyrûdê çapkirine.” (Malmîsanij, h.b. r. 106) Navbera salên 1960 û 1980î de weşanên periyodîk jî kêman û hemû li ser navê partiyekê derketiye. “ Di sala 1966an de ji aliyê Hesên Hîşyar Serdî ve rojnameya ‘Agahî’ bi Kurdî derdixîne. Cegerxwîn jî li ser navê partiya pêşverû ya Kurd kovara ‘Gulistan’ê(1968) derxistiye. Dîsa yek jê ji ekola Hawarê Osman Sebrî jî li ser navê PDKSê kovara ‘Gelawêj’ê (1979) bi rê ve dibir.” (Yıldırım, 2015, r. 357) Ev rewş heta sala 1976an didome. Vê salê Hafîz el-Esad ji ber polîtîkayên xwe yê navxweyî û derveyî helwesta xwe ya li hemberî Kurdan hinek nerm dike. Lê ev nedihat wê wateya ku zext bi tevahî li ser wan û li ser xebatên çandî rabûbû. “ Piştî salên 1980î bi pêşketina têkiliyên navbera partiyên siyasî yê Kurd û rêveberiya Sûriyeyê, ev rê li ber geşbûna çalakiyên çandî vekir. Ev tişt jî piranî ji aliyê xwendekarên dewlemend ên li Şam û Helebê bi rêya pîrozkirina Newrozê, şanogerî, komên govendê , kûlûbên sporê û weşanxaneyên li Beyrûdê pêk hat.” ( Tejel, 2015, r.192-193) Bi rastî jî ev sistbûna polîtîkaya tund a li dijî Kurdan encamên xwe di salên 1990î de nîşanî me da. Him ji aliyê çendîni him ji aliyê çawaniyê ve weşanên Kurdî zêde bûn. “ Wek mînak li vir di salên 1970iyan de

tevahî 3, di salên 1980iyan de 20 pirtûk hatiye weşandin lê di salên 1990iyan de 111 pirtûk hat weşandin. Bi ser de di salên 1990iyan de cûreyên berê nehatibû weşandin wek bîranîn û bîyografî jî hat weşandin. “ (Malmîsanij, 2006, r. 126) Em dikarin vê geşbûnê di weşanên perîyodîk de jî bibînin. “ Kovara ewil a bêyî li ser navê rexistinekê ‘ Gurzek Gul’ (1989-1992) derket. Vê kovarê hin kovarên din ên wêjeyî û çandî şopand: ‘Zanîn’(1991-1997), ‘Aso’(1992), ‘Pirs’ (1993), ‘Hêvî’(1993), ‘Delav’ (1995) û ‘Xwendevan’ (1995) Ev rewşa qismî erênî piştî hatina Beşar Esad û di 22.09.2001an de bi derxistina karnameyeke nû ya derbara weşangeriyê de rewşa weşangeriya Kurdî xera bû. “Malmîsanij li gorî agahiyên Konê Reş daye îfade dike ku piştî vê karnameyê di vê çapxane ji bo her pirtûka ku ew ê çap bike ji dewletê destûr bistîne. Wek mînak çapxaneyê mezîni ji ber ku beyî destûra dewletê ferhengeke Kurdî çap kir hat mohrkirin. Bi ser de pirtûkfirosên ku pirtûkên bêdestûr difiroşin jî hatin girtin. Kone Reş îfade dike ku ji ber van sedeman nivîskarên Rojavayê êdî berhemên xwe li derweyî Sûriyeyê ( Li Başûrê Kurdistanê, Ewropa û Stenbol) çap dikirin.” (Malmîsanij, h.b. r. 129) Bi avakirina kantonan re îro rewşa guheriyê. Kurd defacto serbixwe ne û di dibistanan bi zimanê xwe perwedehî dibînin û tu astengî li ber bikaranîna zimanê Kurdî jî tune ye. Helbet ew ê ev rewşa erênî di salên pêş de, di warê rewşa wejeyî de geşbûnek jî çêbike.

### **2.3. KURDÊN SÛRIYÊ û ROMAN**

Dema em dibêjin roman kengî û çawa derketiye holê. Bêhemd em berê xwe didin têgihên wek takekesbûn, bajarîbûn, modernîte û çîna bûrjûwazî. Bi şoreşa pîşesaziyê re têkiliyên civakê yê feodal ji holê rabû. Êdî sînorên mirovan ne tenê gund û herî dûr jî navçeyên wan bû. Êdî mirov ji gund û navçeyên xwe derdikevin û berê xwe didan bajaran. Helbet di vê pêvajoyê de piştgiriya bûrjûwayan jî zêde bû. Hewcedariya wan bi mirovên azad ên bikaribin li fabrîkayan bixebitin hebû. Ji ber vî tiştî mirovan teşwîq dikirin û bi pêşxistina zagonên mafên mirovan re jî ji vî tiştî re zemînekî hiqûqî ava dikirin. Bi vê pêvajoyê re malbatên mezîni perçe dibûn û rêjeya kêsên xwendin û nivîsînê di nav civakê de zêde dibû. Ev guherînên sosyolojîk bandora xwe li ser derûniya mirovan jî kir. Ev dinyaya nû ya tevlihev hiş û giyanê mirovan jî tevlihev kir. Ji her demê bêtir mirov ji xwe re pirsên ‘ ez kî me’ kirin. Ev destpêka pêvajoya takekesbûnê bû. “ Pêvajoyên pêkhatina takekesbûnê û veqetîna

takekesan ji komên cûrbecûr wek encamên guherînên civakî, aborî û epîstemolojîk ên di sedsalên wek 17. û 18.an de hêdî hêdî derketiye holê û di eslê xwe de jî ev pêvajoyê berdewam e. Nivîskar li gor xwestekên nû yên mirovan tevgeriyan. Ev jî xwesteka formeke nû ye ku takekes ew ê teyisandina taybetiya xwe tê de bidîta, ev forma nû jî roman bû.” (Ahmedzade, 2004, r. 21-22) Ev nêrîna Haşîm Ahmedzade nêrîna Lukacs a derbara romanê de tîne bîra meriv. “Li gorî Lukacs di epîkê de tenê lehengek heye û naveroka epîkê ji enînivîsa lehengê nin ji enînivîsa civakê ava dibe. Kes ne li bendê ye ku ev lehengê model pirsan li xwe bike. Ew, nîzama çandî dide berdewamkirin. Lê roman, bi rêya lehengên xwe pirsê dîke û lê digere.” (Lucas, 2017, r. 68-74)

Derketin û geşbûna yêk jê cûreya wêjeyî ya romanê bi pêvajoyên pişesazî, bajarîbûn û modernîzmê hevterîb pêkhatiye. Gelo di nav cikavên van pêvajoyên wan qels de roman çawa derketiye û pêş ketiye. Haşîm Ahmedzade vê pirsê wiha dibersivîne. Ewil balê dikişîne li ser wêjeyên Erebb, Pencan, Fars û Tirkan. Di her çar wêjeyan de helbest herî cûreyê wêjeyî yê xurt e û tiştê herî balkêş di heman wextan de roman di van her çar wêjeyan de dîtî. Roman îcadeke Rojavayî bû bi rêya wergerê bû malê cîhanê. Neteweyên Rojhilat jî ewil bi rêya wergerê vê cûreya nû nas kirin. Helbet rasthatinên bi modernîteyê re, pêvajoyên çapê, pergaleke nû a perwerdehiyê, werger, rojnamegerî û xêdebûna rêjeya kesên xwendin-nivîsandinê dizanin jî vê pevajoyê bi leztir kiriye. (Ahmedzade, h.b. r. 84-87) Di civakên rojhilatî de roman ewil bi awayê teqlîtkirinê dest pê kiriye. Ji ber vî tiştî jî mînakên ewil ên romanên jî pir ne serkeftî ye. Ger em mînakek bidin em dikirin mînaka romanê dema tanzîmatê bidin. Ji bo romanên wê demê rexne hevpar in: Temsîliyeta civaka xwe nedikir, lehengên romanê nîkarîbû bibûya takekes ji ber wê ji rastiye dûr bûn û rasterast mînakên rojavayî dihat teqlîtkirin.

Helbet serancama romana Kurdî ji serancama romanên rojhilatî jî cuda bû. Ev cudabûn jî ji rewşa siyasî ya Kurdan diwêlîdî. Kurd li pênc herêmên cuda dijiyan: Li Tirkîyê, Îranê, Sûriyeyê, Sovyetê û Iraqê. Ji ber vê perçebûnê tekiliyên Kurdan ên bi hev re qels bû. Wêjeya Kurdî jî di her perçê de li gor taybetiya dewleta ku tê de dijîn pêş ket. Di nav dewletan de jî ji bilî Sovyetê û hin demên taybet zimanê Kurdî her tim di bin nîrê qedexeyan de bû. Sovyetê wek dewlet piştgirî dida mafê perwedehî û

pêxistina zimanê kêmaran. Ji ber van şert û mercan em pê naheyirin ku romana ewil a Kurdî di sala 1935an de ji aliyê Erebe Şemo ve bi navê Şivanê Kurmanca li Êrewanê tê çapkirin. “Yekem romana bi zaravayê Soranî jî ku Janî Gela Îbrahîm Ahmed e, di sala 1969an de hatiye çapkirin.” (Aydoğan, 2014, r. 107)

Ji ber rewşa siyasî ya nava Sûriyeyê romanûsên Rojavayî bêgav mane ku berhemên xwe li diyasporayê binivîsinin û çap bikin. Em ê li jer navê romanûs û romanên wan binivîsinin. Helbet ev angaşt me tune ye ku ev lîste hemû romanên nivîskarên Rojavayî dihewîne. Ev lîste ji sêdwergirtina lîsteya romana Kurdî a Îbrahîm Seydo Aydoğan û hinek malperên Kurdî hatiye amedekirin.

#### Abbas Abbas

- 1- Şivanê Berxan (Pêrî, 2004, 111 r.)
- 2- Xewnên şiyarî (Pêrî, 2004, 111 r.)
- 3- Dengbêjê piçûk (Pêrî, 2005, 96 r.)
- 4- Helbestvan (Pêrî, 2005, 95 r.)
- 5- Neviya çiyayekî (Pêrî, 2006, 112 r.)

#### Arşevê Oskan

- 1- Keştiya penaberan (2010, Do, 111 r.)

#### Dr Azad Elî (Azad Bavê Şahin)

- 1- Yên Perîşan (1991- Beyrûd)
- 2- Berxikê Kesk( 2008-Semakurd)

#### Bavê Nazê

- 1- Stockholmê te çi dîtiye bêje (Förtattores Bokmaskin-1987, 122 r.)
- 2- Çiyayên bi xwînê avdayî (Wesanên Komela Jinên Kurdistanê li Swêdê-1989, 240 r.)
- 3- Dara Pelweşiyayî (Duhok, 2002)
- 4- Mirîyê Heram (Weşanên Lîs, 2009, 93 r.)

#### Bêwar Brahîm

- 1-Li Bin Sîwana Xweziyan ( Avesta, 2021, 266 r.)
- 2-Payîzokinê Çavşil Ji Dilê Xewnê ( Lîs, 2014, 366 r.)

#### Dîlan Şewqî

- 1-Şekirê Di Bêrika Bavê Min De ( Avesta, 2021, 144 r.)

#### Fawaz Husên

- 1-Parîsabad (Avesta, 2010, 102 r.)
- 2-Barê Şevê ( Avesta, 2012, 131 r.)
- 3- Evdo û Çend Bêhnîkên Şadiyê ( Avesta, 2013, 122 r.)
- 4-Piçek Jiyan Qetek Asiman (Avesta, 2014, 264 r.)
- 5- Heftiyêke dirêj li Amedê (Avesta, 2015, 176 r.)
- 6- Nameyek ji bavê min re (Avesta, 2021, 117 r.)

#### Helîm Yûsiv

- 1- Sobarto (Avesta, 1999, 203 r.)
- 2- Tirsî bê diran (Avesta, 2006, 182 r.)
- 3- Gava ku masî tî dibin (Lîs, 2008, 238 r.)
- 4- 99 Morîkên Belavbûyî ( Peywend, 2015,150 r.)
- 5- Weşê Di Hundirê Min De (Peywend, 2018, 144 r.)

#### Jan Dost

- 1- Mijabad (Belkî, 2004, 234 r.)
- 2- Sê Gav û Sêdarek (Avesta, 2007, 204 r.)
- 3- Mîrname (Avesta, 2008, 232 r.)
- 4-Martînê Bextewer ( Avesta, 2012, 262 r.)
- 5- Kobanî ( Dara, 2017, 408 r.)

#### Jana Seyda

- 1-Jineke Mirî Li Cihangirê (Avesta, 2021, 143 r.)

Menaf Osman

1- Girê Şêran “Serhildan” (Aram, 2003, 435 r.)

Mihemedê Seyid Husên

1-Tava Mirinê (2010)

Pîr Rustem

1- Zarotiya Neynikekê û Tiştin Din ( 2005, bi awayekî elektronîk hatiye belavkirin.)

Sahînê Bekirê Soreklî

1- Wendabûn (Institutuya Kurdî Besê Elmanî, 1987, 118 r.)

2- Veger (Duhok, 2006)

Xemgînê Temê

1- Pala Bêşop (Sara, 1983, 76 r.)

## **BEŞA SÊYEM: DAHÛRANDINA ROMANAN DI PEYWENDA RABÊJA NETEWEPERWERIYÊ DE**

Helbet her neteweperwerî bi heman awayî û bi heman rengî neqewimî. Her netewe li gorî xwe kincekî neteweperweriyê li xwe fesiland. Di vî warî de karê Kurdan bi du awayî zehmet bû. Yek ne xweyî dewlet bûn ji ber pîrî caran dewlet bi xwe neteweperweriyê diafirîne. Ya diduyan jî Kurd di nav sînorên netewedewletên cuda de dijîn û neteweperweriya her perçeyekî jî li gorî vêya dirûv digire. Bi xwe him Abbas Valî him jî Denise Natalî vê rewşê wiha tînin zimên. “Taybetiya neteweperweriya Kurdî ew e ku bi têkiliya xwe ya guherbar a bi “yê din”ê xwe re tê pênasekirin” (Vali, 2013, r. 56) Herçiqas hestên hevpar ên komên Kurd hebin jî, kurdayetî di nava her dewletekê de, li gorî çawaniya sîyaseta wê dewletê, bûye beşek ji repertuara fireh. (Natali, 2009, r. 18) Em ê jî di vê beşê de hewl bidin ku rûdanên sosyopolîtîk ên Sûriyeyê û rengvedanên wan ên li ser Kurdan bi rêya romanên Kurdên Sûriyeyê binirxînin.

### **3.1. HELÎM YÛSIV: *TIRSA BÊ DIRAN***

Roman ji 182 rûpelan pêk tê. Cara ewil di sala 2006an de li Stenbolê ji nav weşanên avestayê hatiye weşandin. Edîtoriya wê jî ji aliyê Abdullah Keskin ve hatiye kirin.

#### **3.1.1. HELÎM YÛSIV**

“Helîm Yusiv di sala 1967an de li Amûdê, rojavayê Kurdistanê ji dayîk bûye. Li zanîngeha Helebê Fakulteya Hiquqê qedandiyê û ji sala 2000î ve li Elmanyayê dijî. Bi dehan gotarên wî yê wêjeyî di kovar û rojnameyên erebî û kurdî de weşiyane. Heta niha berhemên wî bi kurdî, erebî, tirkî û elmanî çap bûne. Ji nivîsên wî bi navê ‘Komara Dînan’, Bidarvekirina Pozekî’ û ‘Sol û Serî’ lîstikên şanoyê hatiye çêkirin.” (Yusiv, 2015) Di serî de bi kurteçîrokan dest bi nivîsê kiriye û di romanên wî de jî em bandora çîroknûsiya wî dibînin. Berhemên wî yê çapkirî ev in:

Helîm Yûsiv

1- Mirî Ranazin (çîrok, 1996)

2- Mêrê Avis (çîrok, 1997)

- 3- Jinên Qatên Bilind (çîrok, 1998)
- 4- Sobarto (roman, 1999)
- 5- Memê bê Zîn (çîrok, 2003)
- 6- Tirsê bê diran (roman, 2006)
- 7- Gava ku masî tî dibin (roman, 2008)
- 8- Romana Kurdî (lêkokîn, 2011)
- 9- 99 Morîkên Belavbûyî (roman, 2015)
- 10- Wehşê Di Hundirê Min De (roman, 2018)

### 3.1.2. TIRSA BÊ DIRAN

Roman ji beşên çavên sêyem, dilek ji welatê tirsê û dîroka tirse 1, 2, 3 û 4an pêk tê. Di beşên çavê sêyem de vebêjer nivîskar bixwe ye. Beşên dilek ji welatê tirsê û dîroka 1,2 û 3an jî vebêjer serlehengê me Mûsa ye. Di beşa dîroka tirsê 4an de jî vebêjer hevalê Mûsa yê zarokatiyê Qado ye. Romanêke alegorîk e. Roman bi beşa çavê sêyem dest pê dike. Nivîskar herçend me hişyar bike û bibêje ku ew nikare bibe çavê herkesî û ew ê tenê bibe çavê Mûsayê Qamişlokî jî em dikarin çîroka wî wek çîroka tevahiya gelê Kurd bixwînin.

*Toza bêdengiyê ne tenê li Qamişlo, belê li seranserê vî welatî, ghiştiye qirikê. Divê li xwe mikur bêm ku ez nikarim bibim çavê herkesî, ji ber ku ez tenê çavê Mûsa yê Qamişlokî me. (Yusiv, 2006, r. 7)*

Bajarê Qamişlo warê êş, tirs û nexweşiyên e. Li wî bajarî bi navê xirtikî nexweşiyek belav dibe û kes nikare pêşî lê bigire. Ev nexweşiya xirtikî metafora tirsê li hemberî desthilatê ye. Bi vî nexweşiyê mirov nikarin bipeyivin û ev tirs wek şewbê belav dibe. Mûsa jî pê dikeve û lê ev bi saya Telîso rehet dibe

*Li gorî tê bîra min, carekê di zarotiya xwe de, Mûsa pê ketibû. Kuxikeke ziwa dikuxiya, xizîni ji dêvla dengê kuxikê ve ji qirika wî dihat. Şewt û jana kuxikê hêsir dixistin çavên wî... Dawî ew birin ba Telîso yê ku kêra xwe berevajî yan jî aliyê ko ji kêrê di ser piştê histê wî re dibir û dianî ew mîna lawirekî biçûçik serjêdikir. Piştî vê serjekirinê Mûsa rehet bû. (r. 8)*

Piştî Telîso dimire herkes heta bi tixtoran jî xirtikî dibin. Dengê kesî ji kuxikan naçe kesî. Mûsa dixwaze zora xirtikî bibe û dengê xwe bigihîne xwendekarên xwe. Dengê dîroka nefermî ya nenivîsandî.

*Mûsa yê mamostayê dîrokê, yek ji wan kesan bû ku dixwest zora xirtikî bibe û karibe dersan bi dengê bilind ji xwendekarên xwe re şîrove bike. Ev demeke ku zoreke mezin di vî warî de dikişîne û xirtikîbûna wî nema rê dida ku karibe cudayiya di navbera dîroka fermî, ya di pirtûkên dibistanê de nivîsandî û dîroka nefermî ya ku nehatiye nivîsandin de, ji xwendekaran re rave bike. (r. 8)*

Mûsa dîsa diramiya û fahm nedikir çima zarokên Kurd nikare bi zimanê xwe perwerdehî bibînin. Ev qedexa li hemû netewdewlatan ya ku li ser zimanek û neteweyek avabûne hevpar e.

*Ji zarokê kurdî ku li ber mamostê ereb lal dîma û nizanîbû çî dibêje û çima bi zimanê diya xwe naxwîne, heta bi zimanê mamosteyê erebî yê zarokên kurd ku di navbera kurdiya malê û erebiya dibistanan û dayîreyên dewletê de, zimanherbilî diman. Peyvên herdû zimanan di serê wan de dibûn şorbeyeke kelê ji zimanekî nû ku ne erebî bû û ne jî kurdî bû.*

*Şorba ku ji ava serdestiyê û nîskên bindestiyê pêk dihat û li ser agirê zorê dikeliya. (r. 9)*

Deqeke sor mîna pizikeke mezin di paş wî de hatibû û kengî tirsî serok û zilm zêde bibe ew pizik jan dida û Mûsa ditirsiya li şûna pizikê teriyek jê derkeve. Dema êşa bindestiyê zor lê dikir di heman wextî de êşa pizikê jî zêde dikir. Rojek li ser sûra ku li dora peykerê serok hatibû çêkirin, bi hevalên xwe re rûniştine. Pasvanekî tê û wan radike û dibêje rûniştina min peykerê serok qedexa ye.

*Mûsa bi çavekî li mêrikê zirz dinêrî û bi çavê din li serê kevîrî yê serokê welêt dinêrî û destê wî hêdî hêdî çûbûn ser herdû felqên qûna wî, cihê êşa xedar ku bi salan e bijişkan jî tiştê jê fahm nekirine. Cara yekem, bi tirs, berê xwe da dixtor. Piştî kontrtolkirineke giştî, jê ra got ku tiştê nîne. Navnîşana psikologekî dabû dest. (r.10)*

Mûsa kaxezê diqetîne û naçe ba psîkologekî. Beşa çavê sêyem diqede û beşa dilek ji welatê tirsê dest pê dike. Mûsa di vî beşî de qala zarokatiya xwe dike. Çawa ew û hevalên xwe teriyên kûçik, pisîk û keran jê dikirin. Helbet qala zehmetiya dibistanê û hînbûna zimanê fermî jî dike.

*Zimanê mamoste seyr bû. Dengên ku ji devê wî derdiketin, kenê guran pê dihat. Gava em dikeniyên bi me re dixeyîdî, guhê me dikişand û bi zimanekî ne fêmkirî, bi ser me de dikir qelabalix. Hevok ser hev ji devê wî difiriyên. Min zanîbû pirsan ji min dike. Lê bersivên wan çi ne? Xwedê zane. Roja din ez giriyam gava bavê min ez bi zorê şandim van şahiyên azar û êşê yen ku weke “ders” bi nav dikirin. (r. 13)*

Mûsa xwe wek zarokê tirsê pênase dike. Em dikarin bibêjin ku tirs bingêha romanê ye. Tirsê ji deshilatdarî, muxaberat, mamosteyên fermî, serok û pizika li paş wî hatî û h.w.d.

*Ez zarokê tirsê me. Tirsê ji teqandina bombeyên derdora sînorê ku bajarokê me yê axîni hembêz dike. Bajarokê di navbera “serxet” û “binxetê” de avetî... (r. 15)*

Lê li wî welatî tirsê serok li ser her tiştî ye. Her tiştê bi serok têkildar jî wek cejn tê pîroz kirin. Rojê girîng jî wan rojan mamoste wan amade dike ji bo meşê. Mamosteyekî wan ê qop li du xwendekaran siwar bûye û ferman li derdora xwe dibarîne. Ji nişkave mamosteyê qop dikeve erdê û piştî wê jî rêzên zarokan xera dibe û herkes li bin guhê hev dikeve.

*Yek li mamosteyê qop siwar hat, yê din xwe avêt ser piyê wî, yê dîtir pênek lêxist û reviya. Û di nav vê xirecira ecêb de sûretê serok ji serê darê Qado ket erdê, nav lingên zarokan. Zarokan guh nedidan sûretê di bin lingan perçiqî ji ber ku bi mamosteyê xwe yê zengelork zêrînî daketibûn, yê ku ji bo jiyana serok qirika xwe çirandibû. Tirseke bê ziman ketibû nav mamosteyên de gava dîtî çawa wêneyê serok di bin lingan de tê perçiqandin. (Yusiv, r. 18)*

Piştî vê bûyerê gerînendeyê dibistanê Qado zevt dike û darê bêwêne ji destê wî digire. Gerînende bi wî darî dest, qûn rûyê wî dide ber daran. Zarok lêxistina li Qado dibe, dîbînî şûnde ciddiyeta meselê fahm dikin û ji tirsê diqutifin. Helbet piştî vê bûyerê bavê Qado Qasimo jî ji lêxistinê bêpar namîne.

*Qasimo mabû di bin kulmên zilamên behnok de. Her ku derb ji darê wî yê sergupik dixwarin, stexfara xwe tanî. Zilam çî digot wî jî bêyî ku fêm bike serê xwe dihejand....Soz da ku lawê xwe yê xerab li malê bi edeb bike. Bi şiqameke desmala Qasimo ku weke şaşika li ser serê wî bû hate xwarê, kete ber lingê zilamên behnok.*  
(r. 20)

Qado îcar li malê ji aliyê bavê xwe jî lêxistineke xweş dixwe û girîngiya serok baş fahm dike. Ev ji bo zarokên din jî dibe ders. Rihê zarokan carekî din bi tirsê tên strandin.

Dikana bavê Mûsa li sûka dizan e û bavê wî jî dixwaze wî zû bikişîne nava jiyana mezinan. Îcar bi dilê Mûsa ye ji ber ku şîrikê bavê wî, bavê evîndara wî Leyla ye û wî jî hêvî dikir ku bi saya vî tiştî belkî Leylayê bibîne. Mûsa li destnivîsên xwe vedigere û li wir em pê dihesin ku mêrêkî sergirtî li dû wî ye.

*Aniha kete bala min ku ez vegerim xwendina çend rûpelên destnivîsa “dîroka tirsê” ya bêxwedîmayî, da ku piştî ez çîroka xwe bi mêrêkî sergirtî re ji we re bêjim. Niştecihekî mezelan bû. Bi çavên xwe yên zer tim dida dû min. Ji çavên wî yên mîna du şikeftên ku di bin eniya wî de hatibin veşartin de, xuya dikir ku rûya wî ziwa, qermîçî û kirêt e.* (r. 25)

Ev beş diqede û beşên dîroka tirsê dest pê dikin. Di vê beşê de jî qala tirsên xwe dike. Qala tirsên xwe yên zarokatiyê, tirsê desthilatdariyê, tirsê tarîbûnê h.w.d. Tirsê wek miqnatisê tirsên din jî dikişîne nava xwe û ev jî dibe sebeb ku tirs li hev biherbin û her ku biçe mezintir bibe.

*Ez li cihekî çêbûm ku desthilatdarî li wir tenê ya tirsê ye. Di nav deverên cuda de, ez belewela bûm, dewlet, sînor, deşt, çiya rê, daristan, bûs, pasvan, balafir, mûxaberat, gemî, balinde, polîs û lawir û tişteke ewqas dever nagihîne hev ji bilî tirsê. Ax, tirsê.*  
(r. 33)

Mûsa dema li sûkê ye bala wî bêtir li ser Tûtino û Kalo ye. Herdû jî hevalên baş in. Tûtino piştî xwendina felsefê mejî çelqandiye û ji ber tîryakiyê cixarê ye navê wî bûye Tûtino.

*Ev xelk çawa min bê hiş û beredayî dibînin, ez jî wan wilo dibînim. Ew jî rast in, ez jî rast im. Îca hesab li cem te ye. Dibe tu bibêjî Tûtino hingî felsefe xwendiyê serê wî tevlihev bûye. Na! Rastî bixwe weke qehpikeke erzan e dibe ku bi herkesê re be...*  
(r.37)

Kalo li qorziyeke sûkê ji xwe re firaxên kevnîk, guharbazin, tizbî, pirtûkên pelzer û herweha tiştê dibe ku bihata firotin çî bûya difirot. Kalo li pey şopa zarokê xwe yê sîyasî bû ya ku şevê kesên biçek biribûn û heya niha deng jê derneketibû. Kalo bîra kollektîf a gel e. Tûrikê wî bi serhildan, dîrok û êşê dagirtiyê û dema wextê wî tê tûrikê xwe vedike û dibêje.

Mûsa wan rojan Leyla bi evîna xwe hesandibû lê bersiva Lêyla zelal û hêvîbir bû.

*Ne tenê zimanê Kurdî qedexe ye li vir, dema zimanê mirov qedexe be xewnên wî jî qedexe ne. Hezîkirin jî ji bo me xewn e.* (r. 41)

Piştî vê bersivê derbekî din jî li evîna wî dikeve. Şîrikatiya dê û bavên wê diqede û mala xwe bar dîkin, diçin Heseke. Bi vî êşî ji bêzarî li sûkê digere û piranî jî diçe ba Kalo û Tûtino. Wê rojê Kalo qala serhildana Ubêdulahê Nehrî dike. Hilbijartina serhildana Nehrî ne tesadufek e ji ber ku ev serhildan ji aliyê rewşenbîran ve wek serhildana ewil a neteweyî tê qebûlkirin. “Armanca Şêx a bingehîn ew bû ku yekîtiya Kurd û avakirina dewleteke Kurd a serbixwe bû.” (Jwaideh, 2009, r. 161) “Derketina Şêx Ubeydullah a pêşiya sahnê, qonaxa ewil a zêdebûna hişmendiya netewperweriya Kurd destnîşan dike. (Olson, 1992, r. 17) Celîlê Celîl jî xebata xwe ya derbara serhildana Nehrî de, serhildanê wek lûtkeya herî bilinda a tevgera Kurd a sedsala 19. qebûl dike. (Celîl, 1998, r. 6)

*Ubêdulahê Nehrî ne desthilatdariya îraniyan qebûl dikir, ne jî ya osmaniyên. Dixwest welatekî serbixwe çêbike, ne bacê û ne leşkeran, ne bide van û bide wan. Mîna min ez çawa dixwazim bibim padişahê erd û ezmên, weha jî Nehriyê serhildêr dixwest bibe padişahê Kurdistanê.* (r. 48)

Van gotinên Kalo li ser Mûsa bandoreke mezin dike. Bi ya wî hemû sûcên ku Kurd di vî halî de ye li hustuyê Sykes û Picotê ye. Êdî em ê di nav herikîna romanê

de bêtir rastî xeyalên wan her duyan bibin. Mûsa bi Qadoya ku resmê Kalo çêdike re dikeve nava civatê û dibêje.

*Weke ev êşa ku em dikişînin hemû ji ber destê wan hatibe. Dukes li dor masakê rûniştin û nexşeya vî erdî bi serê pênûsê xêz kirin. Va ye zêdeyî heştê salî derbas bû, hîn em êşa wî karê wan dikişînin. (r. 51)*

Em di romanê de dibînin ku navê Sykes ji ya Picot bêtir derbas dibe û ev jî dibe ku ji van gotinên jêr ên Sykes be. Lehengê me dixwaze heyfa kirinên û van gotinan hilîne.

*Tu zanî Sykes pirtûkek li ser êlên Kurdan nivîsiye? ( Êlên kurdan di imperatoriya osmanî de) Li ser kurdan digot ku hestên wan ên neteweyî tune ne. Yanî heta bi êlan jî nas dikir û bêbavo ev millet weha di nav van dewletan de perçe perçe kir!.. (r. 51)*

Nexweşiya xirtikî nava gel belav dibe û Hevalên Mûsa Qado û Simko ji bo zanîngê diçin bajarên din. Simko berê xwe dide Helebê ji bo xwendina hiqûqê. Qado jî berê xwe dide Şamê ji bo xwendina felsefê. Mûsa jî li Qamişlo dimîne da ku piştî du salan dest bi mamostetiya dîrokê bike.

Mihemed Teleb Hîlal di sala 1963an de de, raporek li ser pişaftin û qelskirina Kurdan amade kir û ev rapor bi navê ‘Ji Aliyê Neteweyî, Civakî û Sîyasî ve Lêkolînek Derbara Cezîreyê De’ ji rayederên dewletê re tê hat peşkeşkirin. Armanca vê raporê jî ew bû ku pişaftin û guhertina rewşa demografîk a Kurdan. Gunde Mûsa wan jî dikeve ber vê pêlê pişaftinê.

*Ji bo azadiyê xwedêgiravî kalikên me destên xwe xistin destên birayên xwe yên ereb de. Ew fransiyên xweşik ji welêt derxistin. Pişt re jî, birayên me yên ereb, ji hezkirina zêde, xwestin ku me jî bikin ereb, lê koranî bi çavê birayên me de hatibû û nema em didîtin, ji ber vê jî digotin hûn tune ne!.....Hikumeta pîroz ya birayên me li ser çemê Firatê pirek avakirin. Li derdorên wê pirê gund di nav avê de mabûn, weha jî bi hezaran birayên me bêmal mabûn. Ji bo ku wan bi mal û erd û cih bikin û me û serxetiyên, bi şerîtekî erebî, ji hev qut bikin, birayên me anîn di nav me de bi cih û war kirin. (r. 60)*

Piştî vê bûyerê malbata Mûsa bi nêçarî dev ji gundê xwe berdidin û berê xwe didin bajarê Qamişloyê. Di 12ê Adara sala 2004an di navbera tîmên Kurdên Qamişlo û Ereben Deyrezûrê li stadyûma Qamişloyê maçeke fûtbolê hat lidarxistin. Lê alîgirên tîma Deyrezûrê li djî serokên Kurd çêran kirin û posterên Saddam Huseyîn derxistin. Piştî alîgirên Kurd jî bersiv da wan, navbera her dû alîgirên tîman de bi kêr û çoyan şer derket. Bi fermana waliyê Heskê leşkerên rijîmê êriş bir ser alîgirên Kurd û hinek ji wan zarok li gor çavkaniyan navbera 6 û 9 kesan mirin. Lê ev bûyer ji bo Kurdên Sûriyeyê bû mîlateke nû. “Jordî Tejel van bûyeran wek serhildanek û ji bo Kurdên Sûriyeyê jî wek konaxeke girîng dinirxîne. Kurd cara ewil ne tenê li bajarên xwe di heman wextî de li her cihê ku lê dijiyan bi hemwextî bi hev re rabûn ser piyan. Xwepêşandan rasterast li dijî rijîma Baasê hat lidarxistin. Bi saya vê serhildanê Kurd di sazkirina yekîtiya sembolîk a Kurdistana li Sûriyeyê de bi ser ket.” (Tejel, 2015, r. 227-228)

*Ji piştî nîvro pê ve Stada Cihad (cihê lîstikê) tije dibû. Li vî alî bi hezaran mêvanên ku bêrîkên xwe tije kevir kiribûn, mêvanên ecêb ku ji dêvla rahêjin gul û alên tîmê xwe, rahiştibûn dar û çekan û posterê dîktatorekî tîkçûyî. Mêvanên ku gef li xelkên mazûvan dixwarin li bajarê wan xeber ji wan re didan û heqaret li wan dikirin. (r. 76)*

Piştî êrişa hêzên rejîmê sê zarok dimire û ev jî dibe sebeb ku hêrsa Qamişlokiyan zêde bibe. Roja veşartina cenazeyan hêrs gihîşt asta dawî. Zarokên tirsê dîwarê tirsê hilweşand û tevde rabûn ser peyan.

*Weha xuyabû lehiya mirovan radibe, ji ya avê zehmettir û girantir e, hetanî radeya ku li çî peykerî rast dihat, dihat xwarê. Li seranserê welêt bi hezaran zarokên peykerên serokê mirî û yê lawê wî yê mirî jî hebûn. Zêdeyî çil salî ye ku kesek newêre dest bide wan, lê îro ew tirs ketibû û pê re jî peyker diketin û dihatin xêrakirin. Çar cenazeyên bi alên rengîn pêçayî xelk kiribûn pêlên ji êgir.*

*Ez li vî xelkî şaş û mat mabûm, evên ku di rojên berê de ji bo mirîşkekê yan ji bo du quriş pere gef li hevdû dixwarin û bi hev re pev diçûn. Îro herkes amade bû xwîna xwe ji bo yê din bide. (r. 83-84-85)*

Helbet ev serhildan belavî tevahî cihên Kurd lê dijî dibin. Li wir jî peykerên serok tê hilweşandin û xwepêşandan tên li darxistin.

*Li Dêrikê jî weha, jixwe Dirbêsiyê jî dabû ser riya Amûdê û pelixandin li dar bû. Di cih de agirê hêrsê li Zoravayê Şamê deng da, weha jî Kobanî û Efrîn û herdu taxên Helebê yên bilind Eşrefiyê û Şêxmeqsûd ku kurd bi piranî li wir bicih bûne. (r. 92)*

Qado tê girtin û piştî tê berdan jî berê xwe dide Ewrûpayê û xwe digihîne Elmanyayê. Beşên dîroka tirse a 3an diqede û beşa çavê sêyem dest pê dike. Serhildan tê tepisandin û pêlê girtinê dest pê dike. Di wan rojan de jî kalê Mûsa rehmet dike.

*Di nav wê xirecira ku bajêr tê de ku her ji çend rojan mirovekî nû yan ji hepsê yan jî ji leşkeriyê di tabûtê de bi ser malbata xwe de vedigeriya, mirina kalikê wî tenê di derdoreke teng de deng dabû. (r. 101)*

Rojek mêrikekî çekdar û cilxaqî li deriyê Mûsa jî dide jê re dibêje divê tu sibê biçî ba muelim. Serê sibê seat di heftan de li ber deriyê muxaberatê ye. Bi tirs dikeve hundir ji ber ku gelek kes piştî ketin hundir panzdeh sal şûnde veşeriyên hinek jî qet venegeriyên. Muelim dibê dosyeya te çûye li ber destê muelimê mezin divê demildest tu biçî Şamê beşa 235 an.

*Mûsa bilez rabû, kaxet ji dest girt û li rehetiya wî matmayî mabû, çimkî ev cih ne cihekî weha bû ku mirov saxlem derbas bibe û saxlem jî jê derkeve. (r. 105-106)*

Radibe diçe beşa muxaberatên leşkerî. Wî dibin odeyekê ji sih û sê wêneyên serokê nemir û bist û heft yên lawê wî pêk tê. Bi hewildana perçekira welêt, ajantî û dijminayiya bi fikir û ramanên serok re tê tawanbarkirin. Piştî lêpirsîn û îşkenceyan bi şertekî tê berdan. Muelim jê re dibêje:

*Ji ber vê divê tu ji vê yekê re baş amade bî û ev têkiliya me berdewam be. Yanî eger belavokeke qedexe ji kesekî xêrnexwaz gihişt destên te, divê yekser tu ji me re bibêjî, da em bi hev re vî welatî ji xerabkaran paqij bikin.*

*Va ye ez ê kaxeta serbestbûna te imze dikim, lê tu ji bîr nekî ku em ê gelek carên din hev bibînin ha, jixwe va ne telefonên me jî û niha tu dikarî biçî. (r. 116-117)*

Wî berdidin tê mala xwe lê êdî dizane sitare jê re nema ye. Ya ew ê biçê Ewrûpa ya jî ew bibe mûxbîr yan jî ew ê bê girtin. Malbata Mûsa jî dinêre tu çare tune ye çî yê wan hebe difiroşin. Mûsa pere hal dike û dide qaçaxçiyên. Ewil wî dibin Bişkekê ya paytexta Kirgizîstanê li wir demekê dirêj dimîne ji ber ku qaçaxçî nikarin wî bişînin Ewrûpa. Beşa dîroka tirsê 4an dest pê dike. Ev beş ji destxetên Qado pêk tên. Qala çîroka Qado çawa digihê Elmanyayê û tiştên tên serê wî pêk tên. Qado bi jineke Elmanî Anêt re dibe heval û Anêt ji Qado himle dimîne lê Elmanya doza penaberiye ya Qado betal dike. Li ser vîya Qado Elmanyayê diterikîne.

Mûsa jî bi tesadufî diçe qampa berê Qado lê mayî. Li qampê dema çîroka xwe ji Salihê Amûdî re dibêje, Salih lê hay dibe ku Mûsa hevalê Qado ye. Li ser vîya Mûsa dibe ba Anêtê û Anêt jî destnivîsa Qado dide Mûsa. Dema destnivîsan dixwîne ji ber eşên hevpar diheyire û taliya talî ew mêrikê rûzer û rûgirtî ya ku hertim li pey wî bû, zevt dike.

*Li odê, min bilez destnivîsa dîroka tirsê ya qado xwend. Nêzîkahiya di navbera hest û serboriyên min û wî de ez şaş kiribûm. Nivîsên Qado ez vegerandim tirsê. Wê şevê ez baş ranezam. Roja din, ez bê armanc derketim derve. Bi derketina min re dengê lingê zilamên çavzer û sergirtî carekê din hate guhê min.*

*Min destekî bi qepera wî girt û bi destê din desmal ji ser serê wî hilanî. Min li rûyê nihêrî. Min bawer nekir. Ez rû bi rû bi xwe re mabûm. Rûyê wî rûyê min bû û çavên wî çêavên min bûn... Ew, ez bi xwe bûm. (r. 178)*

Beşa dawîn çavê sêyem e. Mûsa jî wek Qado rojekê wenda dibe. Salihê Amûdî çiqas dikeve li pey şopa wî jî, Mûsa nabîne. Salih dûre bi saya rojnameyekê bi çîroka wî dihese.

*Mûsa li Londonê hatibû dîtin. Li kolanê êrişî mirovekî porspî bi navê Sykes kiribû. Mêrik li ber xwe dabû. Him gazî polîsan kiribû him jî di dadgehê de doz lê vekiribû. (r. 180)*

Polîsên Îngilîz piştî fahm dikin cihê wî yê penaberiye Elmanya ye, wî dişînin Elmanyayê. Bi awayekî Mûsa ji destê polîsan xelas dibe û heta vê kêlikê jî bi awayekî qaçax dijî. Roman bi vî awayî diqede.

## **3.2. FAWAZ HUSÊN: *PİÇEK JİYAN QETEK ASIMAN***

Roman ji 262 rûpelan pêk tê. Cara ewil di sala 2014an de li Stenbolê ji nav weşanên avestayê hatiye weşandin. Edîtoriya wê jî ji aliyê Abdullah Keskin ve hatiye kirin.

### **3.2.1. FAWAZ HUSÊN**

“Fawaz Husên li gundê Kurdoyê li derdora Amûdê tê dinyayê. Ew li Amûdê mezin dibe û xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û navîn lê dixwîne. Piştî beşa edebiyata fransî li zanîngeha Helebê, ew di sala 1978an de digihîje Parîsê û xwendina xwe ya bilind li Sorbonnê di sala 1988an de kuta dike. Fawaz Husên li wezaretê perwerdekirinê, li şaredariya Parîsê û li zanîngeha Sorbonnê mamosteyê zimanê fransî ye. Ew endamê rêxistina nivîskarên Fransayê ye û hem bi fransî, hem bi Kurdî dinivîse.” (Husên, 2014) Berhemên wî yên çapkirî ev in:

- 1-Parîsabad (roman, 2010)
- 2-Barê Şevê (roman, 2012,)
- 3- Evdo û Çend Bêhnikên Şadiyê (roman, 2013)
- 4-Piçek Jiyan Qetek Asiman (roman, 2014)
- 5- Heftiyêke dirêj li Amedê (roman, 2015)
- 6- Nameyek ji bavê min re (roman, 2021)

### **3.2.2. *PİÇEK JİYAN QETEK ASIMAN***

Ji romana Fawaz Husên a *Piçek Jiyan Qetek Asiman* behnek otobiyografîk jê tê. Bixwe di destpêka romanê de jî beşek bi navê Spasguzarî û dîyarî heye. “Armanca min bi vê berhemê ne piçûkkirina tu kesî ye. Ew tenê vejîn û zîndekirina bîr û bîranîna Amûdê ye, Amûda şewîtî, paytexta evînê, navnîşana hêvî û birînê.” (Husên, 2014, r. 9) Dûrre jî spasiya wan navên lehengên romanê dike û em pê dihesin ku ew bi rastî jî ne lehengên xeyalî ne.

Roman ji şanzdeh beşan pêk tê. Nivîskar beş bi beş qala jiyana xwe, rewşa sosyopolîtîk a Sûriyeyê û Kurdan dike. Di beşa ewil de qala zarokatiya xwe dike. Diya wî ji ber anîna hêwiye çawa diqehere û zarokên xwe digire û berê xwe dide

Amûdê. Vebêjer wê çaxê sê yan çar salî ye. Li Amûdê dapîra wan Alya dijiya. Helbet bavê vebêjer demeke ne pir dirêj li mala dapîra wî xuya dibe û ne bi dilê wî be jî qaneh dibe ku ew li Amûde bimînin. Êdî bavê vebêjer carna li gund carna jî li Amûdê ye. Vebêjer qala çavderiyên xwe yê derbara rewşa civakî ya salên 1957an ên li Amûdê de dike. Vebêjer xwe ji aliyê nasname ve ji Ereb û filehen vediqetîne û balê dikişîne li ser parvekirina nedadî ya ekonomîk.

*“ Belê, wekî me, hemû reh, nijad, ol û eşîr ji wê erda fireh a Xwedê hatibûn, ji herêma Mêrdînê, ji Ermenîstanê, ji deşt û beriyên Mezopotamyayê. Bi kurtî, Amûdê ne kêmtî Babîlonê, bajarê efsanewî, bû. Mirov bi hemû zimanan lê diaxivîn, bi kurdî, bi erebî, bi suryanî, bi ermenî û belkî bi gelek zimanên din jî. Wekî nimûne, qereçî bi zimanên çûkan di nav xwe de dipeyvîn.*

.....

*Ereb û fileh ne Kurd bûn û desthilata sîyasî û aborî xistibûn nav lepên xwe. (Husên, h.b. r. 20)*

Vebêjerê me hêdî hêdî mezin dibe û wexta çûyina ber destê mele ji bo hînbûna Quranê û pê re jî pêvajoya çûyîna dibistana fermî dest pê dike. Ji bo hînbûna Quranê diçe ber destê seydayê li taxa wan Mele Ehmedê Herbî. Mele Ehmedê Herbî bi eslê xwe Kurd e û bi zimanê Kurdî dersa Quranê dide. Ev jî dibe hesaniyek ku zarok zû fêrî zimanê Quranê bibin. Vebêjerê me dibe heft an jî heşt salî bavê wî ji gund bi du birayên wî yê ji dêmarî vedigere û her sêyan dibe sûkê. Wan dibe ba Wanêsê Wanêsyarê ku solan çê dike. Piştî çend rojan, bavê wî bi solên nîkinû û sê çenteyên bi rengên cihêwaz vedigere malê. Pişt re jî wan qeydî dibîstana filehan dike. Vebêjer wek hemû zarokên kurd bi destpêkirina dibistanê re li dubendiya zimanê malê û derve dihese.

*Mirov, ne li Amûdê û ne li tu derê ji erda Xwedê ya fireh, nikaribû zimanê me yê kurdî ne bixwenda û ne jî bida xwendin. Her kesî ji me re digot ku ev ziman ne wekî tu zimanên din bû. Ne pirtûkên dibistanên bi kurdî hebûn, ne jî edebiyata nivîskî. Eger me bixwesta kirasê gundîtiyê biavêta û xwe nezîkî bajarvaniyê bikira, gerek me ew “devoka” gundî û nexwendeyan bi hezarên kîlometran li paş xwe bihiştta. Gerek*

*me erebên ku ji “hundir” û ji “peravê” dihatin û hukim dikirin ji xwe re bikirina nimûne. (r. 27)*

Vebêjer di zarokatiya xwe de guh nedida vî zimanê sembola bajarîbûn û dewlemendiyê. Tev lêdanên bi şiv ên Ehmedê Herbî jî ger şensê wî hebûya ew ê dîsa jî zimanê malê hibijarta.

*Bajarvanî û medeniyeta tahsarkî a ya zimanê erebî ne xema min bû min ji binî ve dilê xwe nedibijand kesên ku dixwest bi saya wî zimanê fermî û neteweyî bibûna helahela. Erê, di tevahiya navçeyê de, Ehmedê Herbî seydayê herî hişk û bêhteng bû, ew bi zimanê ku di reh û damarên me de bi me re dipeyvî û bi ser de jî, wî wekî zarokên xwe ji me hemûyan hezdkir. Bi wî re her tişt hêsan bû. Wî bi zimanê taxa me, bi yê bav û bapîrên me tiştên zehmet rave û hêsan dikirin. (r. 28)*

Di beşa diduyan de vebêjer qala yekkirina Sûriyeyê û Misrê dike. Helbet ev rewş halê kurdan xerabtir dike û hundirê welêt bi sixûrên Misrî tije dibe. Hemû partiyên siyasî tên girtin. Ewil rejîma nû bere xwe dide komînîstan û gelek endamên vê partiyê digire û îşekneyên giran li wan dibe. Dûre jî berê xwe dide Kurdan. Zefî û gefî wan salan bîranînên Nûreddîn Zaza jî dipeyitîne. “ Di tebaxa sala 1960an de li tevahiya Sûriyeyê zarokên temenê wan navbera 12 û 15 an de jî tevde wek hejmar bi ser pênc hezarî mirov hatin girtin, mîmkirin û îşkence dîtin. Hin beşek jî vana hat berdan. Ez jî 8ê tebaxa di sala 1960 î de hatin girtin.” (Zaza, 1994, r. 197) Vebejêr jî wiha qala wan rojan dike.

*Di 1958an de, lehengên doza erebîtiyê li Sûriyeyê û li Misrê ji nişkêve xwe kirin yek. Berê, wan çend peymanên eskerî di navbera xwe de saz kiribûn, lê xwestin çend gavên mezintir bavêjin. Di meha duyem ji vê sala 1958an de, herdu parlemanan li hev kir û Nasirê Misrê di 5ê adarê de bû serokê Yekîtiya Komarên Erebi. Di cih de, sîxur û mûxaberatên wî li her qulê li Sûriyeyê belav bûn û ketin dibistanên herêmêmn herî dûr, wekî herêma me.*

*Kêfa mezinên me ji misriyan re nedihat. Ev biyanî ji dawîya dinyayê dihatin, hem emrên xwe li me dikirin, hem nan û ava me vedixwarin. (r. 35-36)*

Ev yêkîtî di 29ê Îlona 1961an de xera dibe. Ewil kêfa Amûdiyan tê ji ber ku polîs, sîxur û mamosteyên misrî vedigerin welatê xwe. Lê kêfa wan zêde neajo.

*Wan jî welat dembest kir û devên herkesî, nemaze yê Kurdan, girtin, çi ye, ne çi ye em peyayên kurdên Iraqê bûn, kurdên ku di îlona 1961an de bi serokatiya Mustefa Berzanî dest bi serhildanê kiribûn. Ji wan tiştan hîna kambaxtir, wan got ku em dûv û teriya cihûyên sîyonîst in. Em jî wisa bûn dijminên mirovantiyê bi giştî û yên neteweya ereb bi taybetî. (r. 39)*

Em dibînin ku ev zext û zor nasnameya neteweyî a Kurd xurttir dike. Ev jî tespîta Abbas Valî tîne bîra me. Nasnameya Kurdî bi înkâr û berxwedana li hemberî wî dirûv girtiye. Ango dîyalektîka înkâr û berxwedan mohra xwe li avabûna nasnameya Kurdî xistiye. (Vali, 2013, r. 47-48)

*Di vê zordestiya dûrê aqilan û kîna dijî me kurdan de, hîsê neteweyî li nav me xurttir dibû. Me bi piraniya xwe ji Mustefa Berzanî û ji pêşmergeyên wî, ji egîdên ku li pêşiya mirinê bê tirs dimeşyan, hez dikir. Min bi xwe, ji Mustefa berzanî hez dikir çunkî wekî Ehmedê Herbî ew jî mele û neviyê meleyan bû. Erê di wan salan de sixûr pir bûn, erê gelac û xêrnexwaz di nav me kurdan de wekî axê bûn, erê tirsê pişt li me dişikand, lê dîsa jî me bi dizîka stranên gelêrî, li awazên kurdî, guhdarî dikir. (r. 39)*

Hin bûyerên trajîk di bîra kollektîf a gel de bi cî dibe û nayê jibîrkin. Yek ji wan trajediyan jî şewata sînemaya Amûdê ye. Ev trajedî jî dibe perçeyekî romanê û hêrsa gel her diçe zêde dibe.

*Ji ber vê malwêranîyê, kîna serdestê nahiyê bêhtir ket dilê her amûdiyî û herkesî mirina wî xwest. Wî civandina pereyan ji bo şoreşa Cezayîrê amade kiribû lê ji binî ve guh nedabû selamet û ewlehiya zarokan. Niştecihên bajêr bi comerdiyeke mezin alîkarî dabûn, lê karbidestên sîyasî yên navçeyê pir ziktêr û çavbirçî bûn û dizanîbûn ku metirsa şewata sînemayê hebû. (r. 42)*

Çawa ev trajedî nayê jibîrkin lehengiya Mihemedê Deqorî jî nayê jibîrkin. Zarokên Mihemedê Deqorî ji êgir xelas bûbin jî bêyî bifikire xwe diavêje nava êgir û zarokan xelas dike. Li vir em dibînin ku hemû zarokên amûdî wek zarokên xwe dibîne. Bixwe netewe wek malbateke fireh tê xeyalkirin.

*Wê êvarê, mirovekî bedew, xortekî bejinzirav bihîst ku agir bi sînemaya amûdê ketibû. Ew bi rê de bû gava pêrgê lawê xwe hat. Law jê re got ku ew xelas bûbû û tiştek bi wî nehatibû. Lê Mihemdê Deqorî soza wî bi enînivîsa wî re bû. "Lawê min, hemû zarok û ciwanên Amûdê wekî te zarokê min in. (r. 43)*

Di 23.08.1962an de bi nimreya 93yan zagonek tên derxistin. Bi vê zagonê biryara jimartineke nifûsê ya awarte li herêma Cezîrê bê çêkirin tê standin. Armanca Rêveberiya Sûriyeyê bi vê serjimartinê tespîtkirina kesên piştî di sala 1945an hatibû Sûriyeyê ye. Malbata vebêjerê me bi zorê be jî mafê hemwelatîbûnê distînin. Lê herkes bi qasî wan ne bi şans e.

*Serhijmara taybetî di çiriya paşîn a 1962an de çêbûbû û serencama wê di nîsana 1966an de hate nasîn. Xêzek sor li navê beşekî mezin ji şênîyên navçeyê ket û nasnameya Sûrî ji wan hate kişandin. Ev bûyer li malên kurdan wekî agirê kulê belav bû. Ji nişkê ve sed û bîst hezar jin û mêr li ser axa Cizîrê bûn însanên neînsan. Ew ji mafên xwe yên medenî man û wekî dewaran, bûn çêre û nêçîra hêjarî û xizaniyê. Tiştê herî dijwar ji bo kurdan ew bû ku wan bêyî paseport û bêyî belge nikaribûn bi tu derê herin. Wan nikaribûn ji wê zindanê derkevin da ku li ser vê erda pelûpûç parsa nasnameyekê, li welatekî din, bikin. (r. 46)*

Nivîskar di beşa sisiyan de jî qala politikayên Fransayê dike. Bi hevpeymanan nû ya navbera Tirkiyê û Fransayê re Kurd dibin du perçe. Malbat, hisim û eşîr dibin du perçe.

*Di sala 1928 de, fransiyên li Sûriyeyê û kemalîstên Tirkiya nû li hev kir û hesinê trêne wêga bû tixûbê di navbera van herdu dewletên nûzade de. Hema fransî bi cih bûn, wan dest bi fîslekiyên xwe kir û hema kurd û ereb û fileh û misilman li hev sor kirin. Da ku tenê di meydanê de xurt bimana, wan milletên din qels dikirin û wisa jî bi hêsanî li ser pişta wan siwar dibûn.*

*Sînorê nû ku fransiyên di navbera Sûriyeyê û Tirkiyê de danîn em kurd kirin du perçe û malên me wêran kirin. Nivê eşîra me li aliyê din, li paş zeviyên bi mayîn û têlên direyî û mîradoran, mabû. (r. 48)*

Ev rewşa nû bi xwe re hin pirsgirêkên mezin jî tîne. Vebêjerê me êdî nikare here serdana gorên merivên xwe jî, ji ber ku li aliyê din a sînorê maye.

*Bi çend kîlometreyan ji me dûr, gora Hesoyê Gabarî, serokê malbata me li welatekî din mabû. Ji bo ku me gora wî ziyaret bikira, gerek em biçûna Tirkiyê, komara ku li ser xweliya Dewleta Osmanî hatibû avakirin. Ji bo wan çend kîlometran, nasname û paseport û vîze ji me re gerek bûn. (r. 49)*

Vebêjer di beşa çaran de qala xaltiya xwe û apê xwe yê ku naxwaze ji trêna dahatûyê bimîne û pêşketinan bêpar bimîne, dike. Di beşa pêncan de jî qala zarokatiya xwe û hevalên xwe û qala têkiliya bav û diya xwe dike. Di beşa şeşan de vebêjer qala pirrengiya dînan û çawa ermenan nêzî xwe dibîne dike.

*Di çavên me kurdan de, di nav hemû filehan de, başên başan bûn û cewhera nîvişkê meşka civaka me bûn. Ew di ser filehên din, wekî aşûrî u suryaniyan , re bûn çunkî kurdiya wan pir xweş bû û gelek caran ji ya me çêtir bû. Paşê, pêwendiyên me yên xwînê bi saya sinetkirinê bi wan re hebûn û ew kirîvên me bûn. Ji bo me, ermen kurd bûn. (r. 97-98)*

Havînan erebên koçer tînan gundê vebêjer. Ew bi keriyên xwe yên pez, bi dewe û keran dihatin û heywanên xwe diçêrandin. Li gorî vebêjer pirsgireka wan bi ereban tune bû û pirsgirêk desthîhatdarî û sepandinên wê ya nedadî bû.

*Belê, em ne dijî ereban bûn û ruhê me ji tukesî nedîçû. Kesên ku rik û fîtnebazî di nav me de diçandin endamên muxaberetan û Partiya Tekane bixwe bûn. Nûnerên dewleta nû her roj bêhtir ew hîs li ba me xurt dikirin ku em ji nijad û olên cihêwaz bûn. Wan kal û bavên me fêrî tirsê kirin û bi zarava kînê di serê wan de xwend. (r. 104)*

Dewlemendiya folklorê ji bo neteweyekê cihê serbilindiyê ye û her netewe xwe bi vî tiştî dipesinîne. Vebêjer jî pir ji guhdarîkirina çîrokan hez dike û bi baweriya wî di warê çîrokbejiyê de kes nedigihîşt toza Xalê Şêxmûs. Helbet şîrdayika wî Fawzo jî ne kêmi xalê Şêxmûs bû. Mezin jî ji çîrokan pir hez dikirin lê wan fedî dikir ku vî tiştî nîşan bidin.

*Wan şerm dikir bigota çiqas bandora destanan li ser wan jî xurt bû. Wekî me zarokan, ew jî bêguman li ser Rustemê Zal, Siyamend û Xecê, Memê Alan û gelek destanên din dîn dibûn. Nîv saeteke paşê, xalê Şêxmus tev kurkê xwe yê reş yê bi hiriya berxan betankirî diket devê derî û tev civata me dibû. (r. 113)*

Vebêjer fahm nake zimanê destan û çîrokên ewqas xweşik çima li dibistanê qedexe ye û bi ser de hemû zimanên din ne qedexe ye.

*Di salên pêşîn ji xwendina li dibistana katolîkan de, ez tê nedigihîştim çima fêrbûyîn bi zimanên din bû û ne bi zimanê çîrokên dayîka Fawzo û efsaneyên xalê Şêxmus bû. Li dibistanê, yekî dikaribû fêrî zimanê erebî, fransî, ermenî bibûya û heta zimanê gêrestêra Merîxê jî, eger ew ziman hebûya, lê nikaribû hînî kurdî bibûya. (r. 115)*

Piştî sala 1946 an li Sûriyeyê rêzedarbeyên leşkerî çêdibin û kî were li ser desthilatdatriyê yên berî xwe ceza dike û wan cihê xwe xweş dikin, wezaret û cihên xweş û bilind di nav xwe de parve dikin. Di 8ê adara 1963 yan Baasî derbeyeke leşkerî dikin û desthilatdariyê dixin bin kontrola xwe. Partiya Baasî bi nijadperestî û şovenîzma Erebi dihat nasîn. Vebêjerê me jî van rojan bi vî awayî qal dike.

*Rojekê ji adara 1963yan, ez neh deh salî bûm dema Partiya Tekane, karîna sîyasî zêft kir û nema berda. Wekî hercarê ba'siyan jî, ango berpirsyarên nû, mejiyên me bi slogan û sirûdên welatperwerî qul kirin. Wan got ku xwedêgiravî ew cara pêşîn bû ku, di dîroka xwe de, welat diket ser riya rast û jixwe em hemwelatî, me yê xwe di nav pêşketin û azadiyan de bişûştana veşûştana. (r. 133)*

Ew azadiya dihat qalkirin ne ji bo Kurdan bû û her ku diçû mafên Kurdan dihat astengkirin. Kurd wek dûvikê cihûyan dihat dîtin. Lê carna li hemberî zextan hinek dengên wêrek jî bilind dibû. Roja hatina Baasiyan wek cejn dihat qebûl kirin û bi awayekî merasimî jî dihat pîrozkirin. Rojek ji wan rojan hin dengên wêrek dirûşmeyên kurdî diqîrin.

*Ûsê Herzan û Ezîzê Îbo xwe çeng kirin ser memberê. Wan berdevkê Partiya Tekane dan alî, bi mîkrofonê girtin û bi kurdî, bi dengê bilind, bi qîrin gotin: “ Bijî kurd û Kurdistan, bijî kurd û Kurdistan” bêjin hema polîs û endamên mûxaberatan xwe avêtin ser wan wekî çawan ewrek kulî xwe davêjin ser du aj û zîlên hêşîn. Li pêşiya*

*hemû amedebûyan, wan ew dan ber kulman û bi dû xwe kişkişandin, birin cendirmexaneyê herî nêzîk, da nîşanî wan bikin ew çî dikarin bînin serê wan. (r. 137)*

Ji rewşa antîdemokratîk cimeata filehan jî para xwe distîne û dibistanên wan tê girtin. Ebûna Kato jî berê xwe dide çiyayên Libnanê ji bo rojên xwe yê teqawitbûnê bibuhurîne.

*Ez bi tevahî çar salan li dibistana filehan mam û em hemû bêgav bûn û çûn dibistana ûmûmî. Bi xurtbûna xwe re, siyaseta erebperestiyê dawîya perwerdehiya taybetî dianî, em hemû dikirin wekî hev û taybetmendiyên me ji holê radikirin. (r. 141)*

Rojekê xalê Farê destê wî digire û derbasî Tirkiyê dibin. Vebêjerê me bi wekhevîna ziman û çandê re diheyire û bawer nake ew sînora derbas kiriye.

*Ew roja pêşîn a îdê bû û em li malan geriyan û me got: “Roja we bi xêr îda we mubarek!” Jin û mêr zarokên li wê derê wekî me, bi ziman û devoka me, bûn, dêm û lêvên wan û şêweya wan a jîyanê di sedî sed wekî yên me bûn. Min bawer nedikir ku min sînora derbas kiribû û ez çûbûm welatekî din. (r. 161)*

Vebêjerê me bi bêwatebûna sînoran pir zû dihese ji ber wê jî lehengên wî yê zarokatîyê Ferecê Şêxê Koro ye. Ferec qaçaxçiyêke bi nav û deng e li Amûdê. Ji bo wî tu sînora tune ye. Ji bo derbasî serxetê bibe jê re pasaport ne lazim e.

*Ferecê Şêxo Koro yek ji wan mêran bû ku perçekirina wê bedenê qebûl nedikir û bi tundî li dijî hebûna sînorê pelepûç radiwestiya. Da ku li ser axa xwe biçûya û bihata, wî xwe li bendî destûra herdû hikumetan ranedigirt û jixwe mêrekî ji reh û tuxmê wî bi dîtina merivên xwe ji paş têlên direyî tucarî razî nedibû. Na, ew nehatibû ser rûyê erdê da ku heqareta leşker û cendermeyan bidîta û hilgirta!*

*Apê Ferecê bi bejneke hûrik bû, lê tesîra wî li ser xeyala min ne kemî ya Rustemê Zal, Mîrza Mihemed û Kawayê Hesinkar bi hev re bû. (r. 161-162)*

Kembera Ereba dibe sebeb ku perçeyek mezin ji erdê bavê wî ji destê wan biçe. Tevî ku wan gelek bertîl didin û pir berx şer jê dikin jî berpirsayar têr nabin û ev hewildan jî badilhewa diçe. Armanca kemberê ew e ku Kurdan bê erd bihêlin ango xizantir bikin û têkiliya serxet û binxetê jî qut bikin.

*Dewletê dest danî ser erd û zeviyên me û Xwedê hiç nîşanên bêhtengiyê nedan xuyakirin. Asiman bi ser serê dagirkeran neket nebû reqreqa tavan, birûsk neket û li kesekî neda û girên gundan ne bûn burkan û çiyayên agirî. Dê û bavên me newêrîbûn bi qasî serê derziyê dengê xwe bikin an nerazîbûna xwe eşkere bêjin. ( r. 171)*

Li xwendegeha navîn, di dawiya pola dehan de, rêveberiya lîseya wan, havînê ew xistin du otobêsan birin kampekê. Di vê kampê de ew ê sê hefte perwedehiya siyasî û leşkerî bidîtan. Femandarekî salmezin û xwedî payeyên bilind sebaba hatina wan a vir ji wan re eşkere dike.

*Wî bi bilingoyekê girt û hema di cih de ji me re got ku em li ser hesabê dewletê nehatibûn seyran û tafîlan. Em xortên bi hêz û afîrîndar ên welêt bûn û welat jî bi saya milên me yê pehn û baweriya me ya xurt bi siyaseta qenc û dûrbîn a Partiya Tekane li ser darê nigan dima. (r. 200-201)*

Vebejêr zimanê Frensî û Helebê hildibijêre ji bo xwendina xwe ya zanîngehê. Herçiqas vêya ne bi dilê meriv, nast û dostên wî be jî. Ew ji zimanê frensî hez dike û wek qonaxek dîbîne ji bo derketina xwe ya Parîsê ango Fransayê. Dema apê wî Evdê dimire li pola sisiyan e li ser vê nûçeyê vedigere Amûdê û biryar dide ku çend mehan li Amûdê bimîne. Liseya El Meerî jî wê gavê mamosteyek zimanê frensî digere. Bi birêveberê lîseyê li hev dikin û xwe bi carekî de li polê dibîne. Ji ber Amûdê biçûk e, zarokan nas dike û bi navê malbatên wan gazî wan dike. Rojek birêveberê lîsê gazî wî dike.

*Ev e, hinan jê re gotibû ku min dersên xwe bi kurdî didan! Min lê vegerand ku ew yek ne ji xûyê min bû û ez tu carî ji sînorên xwe dernediketim. Min dizanîbû ku kurdî di hundirê dibistanê de qedexe bû û min nexwestibû bi seatan dersan bidim da ku biketama pêst û kirasê qehremanekî ku li kuştina xwe digeriya. (r. 245)*

Piştî vê axaftinê cara diduyan dîsa gazî wî dike û dîsa heman hişyariyê dide. Ji bo xelasbûna ji van derdan jî riya endamtiya partiya tekane dide ber wî. Ew jî dev dibistanê berdide û diçe Helebê. Zankoya xwe diqedîne û ji bo masterê serî li zanîngehên Franseyê dide û ji aliyê zankoya Bordeauxê ve tê qebûlkin. Vebêjêrê

me dema bi balefirê ew ê peyayî Fransayê bibe û bi xwe re muhasebeyeke wîjdanî dike û em jî tên dawiya romanê.

*Ez bi kêf bûm ku min xirecir, fesadî û xusranê li pey xwe dihişt. Min feleka ku li dora serê milletê min digeriya di ser guhê xwe re nediavêt, na, lê min ê çi bikira eger ez bimama? Her kesê ku serê xwe li ber Partiya Tekane bilind dikir xwe ya li zindanên kor û tarî didîtin an jî devê wan bi giştî ku li her çar aliyên welêt dihatin vedan de dihatin girtin. Hesinê min belkî qelp bû ne ya qehreman û egîdan bû, lê ew di eynî wextê de jî ne yê xwefiroş û altaxan bû. (r. 261)*

### **3.3. JAN DOST: KOBANÎ**

Roman ji 408 rûpelan pêk tê. Cara ewil di sala 2017an de li Stenbolê ji nav weşanên darayê hatiye weşandin. Edîtoriya wê jî ji aliyê Dawid Yeşilmen ve hatiye kirin.

#### **3.3.1. JAN DOST**

“Ew di 12ê adarê sala 1965 an de li bajarê Kobanî hatiye dinyayê. Xwendina xwe heta lîseyê li Kobanî qedandiye. Ji sala 1985 an heta 1988an li zanîngeha Helebê fakulta zanistê beşa Biyolojiyê xwend, lê tamam nekir. Jan Dost di dehsaliya xwe de dest bi nivîsîna helbestên erebî kir paşê ji panzdesalî de qulipî zimanê kurdî. Çîroka wî ya yekem Xewna Şewitî sala 1993 an di pêşbirka kurteçîroka Kurdî de li Sûriyeyê xelata yekem stand. Her weha li Tirkiyê jî li ser sehneyê hatiye lîstin. Ji bilî wê çîrokê, Jan Dost çend çîrokên din jî nivîsandine, wek ‘Mistek Ax’ ku sala 2007 an li Almanyayê bû kurtefilmek û ‘Rûyekî Şêrîn’ û hinin din. Jan Dost ji sala 2000î de li Elmanyayê dijî û ji Adara 2009 an de hemwelatîyê Almanyayê ye.” (Dost, 2017) Berhemên wî yeên çapkirî ev in.

- 1- Kela Dimdimê (helbest, 1991)
- 2-Mijabad (roman, 2004)
- 3- Sê Gav û Sêdarek (roman, 2007)
- 4- Mîrname (roman, 2008)

5-Martînê Bextewer (roman, 2012)

6-Dîwana Jan (helbest, 2015)

7-Kobanî ( roman, 2017)

### 3.3.2. *KOBANÎ*

Roman ji du cihokên cuda ve diherike. Cihoka ewil çîroka nivîskar bi xwe ye. Birayê wî Xello li Stenbolê ji ber pençeşerê rehmet dike. Nivîskar nagihêje ser veşartina wî. Dema tê Stenbolê diçe mala birayê xwe Seîd û li wir xwehên wî yên kezebşewat li dora wî dicivin. Zavayê wî Tûran jî wêneyên kesên ku hatibûn veşartina Xelo nîşanî wî dide. Wextekê şûnde Jan dikeve nava xeyalan û di nav kaviilên Kobanî de dimeşe.

*Nema guhê min li Tûran e, nema wêneyên ku wî şanî min dikirin xuya dibin, nema dengê giriyê xwehên min ên belengaz ên ku hêdî di ber axaftina wî re dihat, tê guhê min. Huvehuva bayê Stenbolê yê hêrsbûyî jî nema dibihîzim. Ez di gola bêdengiyê ecêb wer dibim. Ez wisa pê dihesim ku giyanê min ji min qut dibe, mîna ku meyweyek ji şaxê xwe bikeve. Giyanê min mîna balindeyê baskivik ji qefesa laşê min direve, baskan li hev dide, difire û di eynî demê de li erda Kobaniyê, li goristana demkî ya li rojavaya bajarê wêran datîne. (Dost, 2017, r. 25-26)*

Cihoka din jî çîroka Hec Mislimê Hemziravê Muhacir û malbata wî ye. Hec Mislimê Hemzirav çar caran dizewice, ji sê jinên pêşî zarokên wî çênabin, ta ku Xanê tîne, ji wê Mihemed Salih(Hemê), Mistefa, Metîn, Lewend, Xedîce, Baran û Rewşenê çê dibin. Hê di destpêka romanê de, li Sûriyeyê hin bûyer diqewimin û dema Hec Mislim diçe mizgefta ba mala xwe gotinên bi vî miqamî li ber guhê wî dikevin.

*Çi li Sûriyeyê diqewime? Wê bi ku ve here ev rewş û li ku bisekine? Xwepêşendanên ku ev bûne sê in li ser hev li dijî rejîmê li bajarên Sûriyeyê li dar dikevin wê çî guhertinê bînin meydanê! Gelo divê Kurd jî beşdar bibin yan na? Du sê kes dema ku bi hev re dimeşyan axaftina wan ew bû, ne zêdetir (r. 10)*

Lewend pêşiya bavê xwe derdikeve û wek her car berê xwe didê xwepêşandana li dijî rijîma Sûriyeyê li dar dikeve. Lê îcar bi awayekî tirsyayî vedigere malê û Hec Mislim jî jê dipirse çi bûye. Ew jî wiha dibersivîne.

*Tiştêk nebû bavo. Em dorê di sê sed însanî bûn. Muxaberatan li hinda Berîdê (postê) da şopa me. Wana heta malê Hemoyî Qêdir rapê me kirin bes kesek negirtin. (r. 15)*

Vebêjer projeksiyona xwe dide ser Hemziravê Mihacir. Hemzirav hê şanzdeh salî ye dema ku şerê Rûs û Osmaniyan dest pê dike û neçarî jî Qersê tèn Elezîzê. Eşîr û malbata wan belewela dibe, hinek di Qefqasê re derdikevin, hinek jî xwe li sînorên Iraq û Îranê qelibandin. Ji ber wê ew, diya xwe û du xwehên xwe tenê dimînin. Bi serhildana Şêx Seîd re jiyana Hemzirav ji binî ve diguhere.

*Dema Şêx Seîdê kal serî hilda bîst û yek salî bû. Wî jî wekî hezaran xwe avêt nav serhildanê, bû qetek jê, bû êzingek di agirê wê de. Diya wî giran nexweş ket, xwehên wî zewicîn û serhildan têkçû. (r. 27)*

Piştî serhildan t êk diçe tu rê li ber wî namîne ji bilî revê. Ew ê jî wek piranî kaçax, fîrar û kesayetên sîyasî berê xwe bide binxetê.

*Wî dîzanîbû ku sînor li başûr e, azadî li başûrê xeta trêne ye ku ew der di destê Fransiyan de ye. Kurmancan nav lê danîbû Binxet. Başûr bin e û bakur ser e di xeyala Kurmancî de. (h.r.)*

Dema Hemzirav ew ê berê xwe bide binxetê vebêjer qala sînorên bêwate û yê ku ji aliyê Sykes û Pîcotê ve hatiye xêzkirin dike. Di çavê wî de binxet jî serxet jî welatê Kurdan e.

*Ewqas serbazên Şêx tert û bela bûn û piraniya wan, her yek di tala xwe re, berî dan başûr, sînorê ku Sykes-Pîcot bi qelama ku hibra wê xwîn bû û bi xêzkêşa ku ji hestiyê xelk bû kişandibûn qut dikirin û digiham cem xizm û merivên xwe yê li biniya xeta trenê. Dawiyê wî jî bi ya diya xwe kiribû û reviyabû. (r. 31)*

Hemzirav xortekî jêhatî ye. Perê bi ba xwe re koxikekî li nêzî gola Mûrşîdpinarê bi kelpîçan ava dike û dikanek piçûk jî li gund vedike. Bajarê Kobanî jî

ermen û kurden reviyayî ava dibe. Di serî de bajar biçûk e û bi salan re her ku diçe mezin dibe û pê re jî karê wî baştir dibe. Lê ew hesreta serxet ji dilê wî dernakeve.

*Pirr caran diçû ber xeta trêne û bi saetan li wî alî temaşe dikir, Gundê Etmankê didît û digot: “ Ya rebî heta vî gundî deh deqe meş in, de îcar ev çi bombe û tîlên rêsayî û leşker in? Haaaa wa ye ez qidqida mirîşkan û barîna kar û bexên gund û xirecira zarokan dibîhizim. Ew der welatê min e ya rebî te ez ji serdana wî bêpar kirime? Ya rebî ma ev edalet e?” Tawilê li xwe dizîvîrî û digot: “ Tobe ya rebî tobe, tobe estexfirillah. Tu min gunehkar nekî ya rebbelalemîn.” (r. 32)*

Vebêjer qala serxwebûna Sûriyeyê dike. Kurd çawa piştgirî dan birayên xwe yên Erebb û Fransiyayê qewirandin. Lê ji bo Kurdan rewş naguhere bi ser de jî êlên ereb ên piştgirî didan Fransiyayê bû desthilatdarên nû yên Kurdan.

*Lê mîna ku li Tirkiyeyê, wisa li Sûriyeyê jî Kurd destvala ji daweta avakirina dewletan derketin. Erebbên êlên Tey û Şemeran, Erebbên Gesî û Cibûr û Şe'arbî û êlên din ku li seranserî sînore Cîzîrê û Kobanî û hîn bi rojava de, ku destbirakê hêzên Firensî bûn, bûn xwediyê welatê ku ji Firansayê veqetiyabû û navê Komara Sûriyeyê lê bûbû. Kurd jî, Kurdên ku li dijî Fransiyayê şer dikirin bûne bin destê wan destbirakên dagirkeran. Ji bindestiyekê dewrî yeke din bûn. (r. 34)*

Hemzirav êdî debar nake û bi pasaporta xwe ya nû dixwaze derbasî serxetê bibe û merivên xwe bibîne. Hemzirav ewil derbasî Ruhayê dibe û ji wir jî berê xwe dide Elezîzê. Erdnigarî erdnigariya berê ye lê mirov hatine guhertin. Pelên asîmilasyonê wan daye ber xwe û bi ser jî ketiye.

*Gelekî ecêb ma dema dît rewiyan otobusê hemû bi Tirkî diaxivin. Wî dizanîbû ku hemû Kurd in. Ji rûyê wan xuya bû, ji axaftina wan a bi Tirkî xuyabû ku ne Tirk in. Di çavên wan de jî tirseke kûr û veşartî hebû. Hemû çav tirsayî bûn. Di bin şefqeyan de serên Kurdî yên tijî hizr û qehr hebûn. (r. 35)*

Li bajêr ne tenê ziman kincên mirovan û elifba jî guheriye. Şûna şal û şapik pantolon û şefqe, şûna tîpên erebbî tîpên latînî girtiye. Bi behntengî diçe mizgeftê ji bo limêja mexrîbê. Li wir jî mele bi Tirkî dia dike. Dema kes li mizgeftê namîne Hemzi-

rav ji mele dipirse çi bi vî welatî hatiye. Piştî mele lê bawer dibe sedama vî tiştî jê re eşkere dike.

*Yanî zimanê xelkê ji devê wan derxistin û zimankê din di devê wan de bi cih kirin. Aramî ji dilê wan derxistin û tirs mîna qetranekê reş niqutandinê. Gurê dijminahiyê berdane nav kerîyê dilan, eşîr li eşîrê sor kirin, bira li bira germ kirin. Ode girtin, civat qedexe kirin. Ma ez çi bibêjim çi nebêjim lo! (r. 37)*

Hemzirav şopa merivên xwe nabîne û bi destê vala vedigere Kobanî. Lê êdî ne Hemziravê berê ye êdî nema diçe civatan û pir bêdeng bûye. Evaran ji jina xwe re digot ez diêşim lê nizam derdê min çi ye. Derdê wê xeyalên wî yên têkçûyî û bêkes û bêkok bûne. Sibehekê destpêka sala 1949an de êdî şiyar nabe û konê xwe ji vê dinyayê bar dike.

*Ev welat êdî ne welatê min e. Li vir kesekî min nemaye û li Kobaniyê jî navê min bûye Hemziravê Mihacir. Ez bêkes im. Tenê mihacirek im. Darek ji kok û rehan qutbûyî me ez. Ez vegerim cem jin û kurê xwe ji hemûyan çêtir e. (r. 38)*

Me gotibû roman ji du cihokan diherike. Ji wan cihokan yek jî xeyalên nivîskar in. Ev her dû cihok carna nêzî hev jî dibên. Dema Jan berê xwe dide nava kavilên Mihela Seyda ev herdû cihok tevîhev dibe.

*Daxwaza dil bi ser dikeve. Tirs têk diçe bêyî ku li ber xwe bide. Ez bi pêş de diçim. Ez van malan yek bi yek nas dikim. Ji dûr ve li cihên wan dinihêrim û di dilê xwe de dibêjim: Ev mala cîranê min Hec Mislimê Hemzirav e, ev li mala hemberê wê mala Xaltiya Xeco ye. (r. 44)*

Jan di nav kavilan re tê ber mizgefta bavê wî lê meletî dikir. Tê bîra wî ji bo bavê wî ji lêpîrsîna dewletê xelas bibe li ser menberê xutbe bi erebî dida xwendin û li mihrabê jî bi dengê nizm bi navê darsa îne bi kurdî waaz dida. Jan hê wê çaxê fahm nedikir çima zimanê kurdî qedexe ye.

*Erebî eşkere, bi mikrofonê, bi navê fermî: “Xutbeya îne” û li jora mênberê li ser piyan tê xwendin. Kurdî jî di mihrabê de, bi dengê nizm ku gava bawesînk digeriyan kesên li rêza dawî dengê bavê min nedibihîst, li jêr û rûniştî tê xwendin! Min ji zaro-*

*katîyê ve bala xwe dabû wê yêkê. Min fê m nekiribû çima wisa ye. Ez bûm xort jî min nizanîbû çima. Ez bi hewceyî wêrana bajarê xwe bûm, bi hewceyî sûtandina hêlîna xwe bûm da ku têbigêhêjim çima Erebiya ku xelk jê fê m nakin li jor, ji pê û di mîkrofonê de ye, lê Kurdiya boz ku dilê wan lê rehet dibe, li jêr, rûniştî û bi dengê nizm e. (r. 58)*

Lewend dema 2004an serhildana li Qamişlo deh salî bû. Hê wê çaxê diçû ji xwe re li ciwan û sloganên xwepêşandaran guhdarî dikir. Lewend niha hivdeh salî ye û îcar ew tevî xwepêşandan dibe û sloganan diavêje.

*Her roja î nê ew tev li xwepêşandanan dibû. Pankart çê dikirin, alayên Kurdî yê n kesk û sor û zer li cem hevalê xwe Guloyê Şamliyan ku kurê terzîyekî bû didirûtin. Bi xortên mihelê re, berî ku xutbeya î nê dest pê bike, ji mal derdiket û wan bi hev re berê xwe didan qada ku lê diciviyên û ji wê derê xwepêşandanên wan ê n bi ala Kurdî û pankartên bi Erebi û Kurmancî berê xwe didan kolanan. (r. 62)*

Di nav xwepêşandanan de hinek kom derdikevin û li sloganên wek ‘Roja me berdîn’, ‘Roja me tarî nabe’ diavêjin. Hêdî hêdî Kurd wek fikir dibin du qet. Lewend jî yek ji wan hildibijêre.

*Di dirêjîya sîorê bakur ê di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de Kurd bûne du qet, qetekî dixwest xwe tev li refên ciwanên Sûriyeyê yê n serhildêr bike, qetekî jî dixwest rêya xwe ya taybet ku nav lê kiribû rêya sêyemîn, bi tena serê xwe biajo û berê hêrsa Kurdan ji ser rejîmê dagerîne û berê wê bide bakur. Lewend tev li qetê ku bûbû he-mahengê ciwanên Sûriyeyê bû. Ew bû yek ji wan ciwanên ku her î nê li dijî rejîmê radibûn ser piyan û kolan bi dengê azadiyê û rûxandina rejîma Bees dihejandin. (r. 64)*

Lewend û çend hevalên xwe yek ji wan xwepêşandanan de tê girtin. Lê êdî sekin jê re tune ye çawa derdikeve dîsa tevî dibe. Bi ser de ew û hevalên nû hatine berdan pêşengiya vê meşê dikin. Bi alên xwe, pankart û sloganên xwe armanca xwe eşkere dikin.

*Alên Kurdî bilind li ba dibûn, sloganên ku bi xetên ciwan hatibû nivîsîn doza naskirina gelê Kurd di destûrê de wekî duyemîn netewe dikirin, doza naskirina zimanê*

*Kurdî wekî zimanekî fermî di destûrê de dikirin, û zengelokên xortan diqîryan: “Azadî”, “Azadî” û “Bijî yekîtiya gelê Kurd” û “yek e yek e yek e gelê Kurd yek e” Bang û qêrîn heta serê Kaşê Miştenûr û Feyda Hemamê diçûn. (r. 65)*

Nozdeh tîrmehê ji nişkê ve şopa rejîmê li bajêr namîne. Rêveberiya bajêr dikeve destê hêzên kurd. Kes nayê kuştin û hêzên rejîmê bi xwe vedikişin. Pişt re wenyên dîktator û bavê wî yê dîktator tê şewitandin. Li avahiyên fermî yên bajêr alayên kurd li ba dibin. Lê vebêjer ji vê rewşê bi gûman e.

*Cara yekem bû di tarîxa bajêr de ew ji hêla Kurdan ve dihate birêvebirin. Aleke kesk û sor û zer li ser avahiya seraya hikûmetê ku Frensiyan ava kiribû li ba bû. Xelk him bi kêf bûn him jî bi tirs. Kurd ji tecrubeyên xwe fêr bûne ku ji azadiya xwe bi guman bin, jê bitirsin. Azadî ne tim xêr e. Tecrubeya wan wiha digote wan. Çimku gelek caran di dîrokê de dubare bûye ku, piştî serxweşiya demeke kurt bi meya azadiyê, bêtareke mezin hişê Kurdan tîne serê wan û ew xwe dîsa di bin destan de dibînin. (r. 67)*

Desthilatdariya nû êdî destûr nade xwepêşandanên îniyê. Ciwanên rûyên nixumandî bi kevir, dar û qemçî dixwazin xwepêşandaran belav bike. Her dû alî bi hev pev diçin. Ji nişke ve dengê gulleyan bilind dibe û hevalê Lewend, Welat dikeve erdê. Wî digihînin Entabê lê xelas nabe û rehmet dike. Piştî mirina Welat, Lewend dizane ya ew ê tiving li hemberî birayên xwe rake yan jî derkeve derveyî welêt. Bavê xwe jî qaneh dike û diçe herêma Kurdistanê ya Iraqê. Li wir dikeve nava çapemeniyê lê ev kar ne li gorî dilê wî ye. Pişt re em ê hîn bibin ku Lewend wê bibe peşmerge.

Jan di xeyala xwe de him di nava kaviên Kobanî de digere him jî ji bîranînên zarokatiya xwe de wer dibe. Qala tirsê di dilê zarokan de hatiye çandin dike. Wek zarokê fahm nake çima nikare derbasî aliyê din ê sînorê be.

*Lê me dizanibû ku tiştek heye nahêle ew li vî alî peya bibin û nahêle em jî xeta nalet derbas bikin û herin wî alî. Mezinan ji me re digot xwe zêde nêzî kî trênan nekin wê ava keliyayî biavêjine ser we, wê bombe bi we de biteqîn, wê eskerên Tirk gulleyan berdin we, wê, wê, wê... Tirs tirs tirs. Sînorên tirsê bûn ew. Em jî di nav beriya tirsê*

*de mezin bûn. Giyanên me bi tirsê hatine avdan. Bi dilopiya şîr a yekem re me tirs jî mêt. (r. 79)*

Hemê ji bavê xwe tika dike ku destûra stendina xerrazeyek ango makîna bîr-kolandînê bide. Piştî wextekî Hec Mislîm qaneh dibe û xerrazeyek dîstînin. Li ser viya Hemê diçe Tûnisê. Ewil karê wî pir baş e heta Essûmayê nas bike. Essûma keça klûba nivê şevan e. Lê nikare bi dilê xwe û her li pey wê ye. Karê xwe dispêre xebatkarên xwe û bi hevalê xwe Ziyad Bin Tacî re xwe bera nav kêf û şahiyên şevên Tûnisê dide. Helbet perê wî diqedin û êdî zirar dike. Di van rojan de bavê wî telefonî wî dike û jê dixwaze zû were ji ber birayê wî Mistefayê leşker bi giranî birîndar e. Birayê wî miriye û dixwazin jinbiraya wê Eyšê lê mahr bikin. Çiqas li ber xwe dide jî nikare bi bavê xwe, neçar dimîne û bi jinbira xwe re dizewice. Bi navê Zozan keça wan û bi navê Siyamend kurekî wan çêdibin.

Xedîce keça Hec Mislîm e. Ew li Dusseldorfê li klînîkekê ye û ji doktorê li hemberî xwe re qala jiyana xwe dike. Ewil jê re qala çîroka evîna xwe dike. Li Helebê beşa zimanê îngilîzî dixwîne. Li wir dilê wê dikeve mamosteyê xwe yê ku navê wî Amed e. Demeke xweş bi Amed re dibuhurînin. Heta Amed dawa zewacê li malbata xwe dike. Ew rengdêra mihaciriyê wek toka lanetê her tim li stûyê wan e.

*Di nav Kurdên Sûriyeyê de ji kesên ku ji ber Herba Cihanê ya Yekemîn daketibûn binê xetê re dibêjin Mihacir, wan wekî kesên bêeşîr dihesibînin û di bin xwe re di gateke civakî ya jêr de dibînin. Min jî digot qey ew mesele ji nav me rabûne. Lê min nizanîbû ku malbata Amed wê min ji asta xwe nebîne û bi tundî li hember kurê xwe rabe. (r. 117)*

Amed jî li ser helwesta tund a malbata xwe, hinekî sist dibe. Dilê Xedîce dişikê. Dûre diçe bi Îbram re dizewice. Bi navê Dara kurekî wan çêdibe. Welatê ku di xwepêşandinê de hatibû kuştin merivê Îbram bû. Xeterya DAÊŞê jî hîs dike û ji Xedîce dixwaze herin Ewropayê.

*Rewş bûye golek genî ku di bin kayê de ye Xeco. Em ji vî bajarî herin berî lehî li me jî biqelibe. Li hundirê mala me xwediyê me me dikujin, xwîna merivên min ên li Tilxezalê hîn zuha nebûye. Li derve malê jî neyarekî hov ê ku wekî xezebeke ketiye vî*

*welatî. Hundir zilm e, dora me DAÊŞ e û bakiurê me jî Tirkîyê ye. Aramî li ku ma?*  
(Dost, h.b. r. 121)

Xedîce û malbata xwe diçin li Stenbolê bi cih dibin. Îbram dîsa israr dike ji bo biçin Ewropayê. Rojekê li qayikeke balonî siwar dibin ji bo biçin Nemsayê. Mixabin qayîka wan diqelibe. Dara û Îbram dimirin. Xedîce jî bi brîndarî ji aliyên hêzên Yewnanîstanî ve tê xelaskirin. Lê dinihêrin rewşa wê nebaş e bi saya komeleyên alîkar ên koçberan ew tînin klînîka niha lê ye. Ji ber telefona wê di bêrika Îbram de mabû, nikare xwe bigihîne malbata xwe jî. Bi ser de îlacên wê jî melekeyên hişê wê sist dikin. Rojekê ji klînîkê derdikeve ber bi çemê Rheinê ve dimeşe. Tê ser pirekî li ava cemîdî a çemê temaşe dike. Ji avê dengê Darayê xwe dibîhise, lê kesî nabîne û xwe hinekî din jî xwar dike. Destê wê ji derabzîna pirê vediqete û ji pirê wer dibe.

Jan dema di nav kavilan re dimeşe tê li ber deriyê Ana Îso, şîrdayîka xwe. Kurê wê Mahmûdê Kosî wek navê kod Akîf hevalê wî yê zarokatiyê ye û ji bira wêdetir e. Her du bi hev re dibistaneke kurdî vedikin û zarokan perwerde dikin.

*Akîf hemû pêdiviyên mektebê wekî qelem û defter û tebeşîr û textereş kirrîn û anîn me li sêzdeh xwendekaran belav kirin. Me her yek ji wan navekî Kurdî jî li wan kir û me dest pê kir ew sêzdeh zarok fêrî tîpên Kurdî yên Latînî kirin.* (r. 140)

Jan qala piştî salên heştayî şûnde çawa di nava Kurdên Sûriyeyê de hestên neteweperweriyê bilind dibe lê wan wek zarok guh nedinan vê rewşa nû, dike.

*Pêla neteweyiyê li Kobaniyê xurt bûbû, Kurdîtiya hişk û tûj êdî boyaxa xwe li Mihela Seyda jî vedabû. Loma zehmet bûbû ku Ereb û Kurmanc, çendî ku nêzîkî hev bin jî, bi hev re karibin bijîn. Em û ew malek bûn, li Mihelê heta nivê şevê em bi zarokên wan re dileyîstin, em diçûn ser Kaşê Miştenûr, diçûn Gola Kaniyê li rojavaya Kobanî. Em bi hev re diçûn ber xetê me li trêna Tirkan dinihêrî, em diçûn Kaniya Ereban û Bendê me nêçîra masiyan dikir û avjenî dikir. Me ne Erebtî zanîbû ne jî Kurdîtî. Nasnameya me zarokatî bû, ciwan û bê girêk bû ew nasname.* (r. 145)

Metîn êdî li ber karê xwe pir nasekine û ne jî lê miqate ye. Her tim bi hevalan diçe ya civînan ya jî xebatan. Helbet ev rewş Hec Mislîm aciz dike û dibe sebeb ku

pê re bixeyîde. Lê Metîn ji vê rewşê aciz dibe û rojekê ji malê derdike û hew vedigere. Dibe gerîla û navê wî êdî dibe Cûdî Kobanî.

*Xwe mîna perikekê sivik dîdit, lê xurt mîna çiyayekî. Ji qeyd û bendên malbatî, gundîtî, eşîrtî, ol û hemû qeydên din ên ku mirov di bin barê wan de nikare bimeşe, ew êdî rizgar bûbû. Tirsîna mûxaberatan rejîma Sûriyeyê di dilê wî de nema bû. “Êdî dewlet û artêş ji me ditirsin” wî gava ku li ser zinarekî rûnişt û li jêr ber bi aliyê Cizîrê de nihêrî, ji hevalê xwe li rex xwe re got. (r. 153)*

Piştî serhildana Qamişlo di serî de rejîm wek nerm bûbû tê xuyakirin. Lê piştî xetere ji holê radibe zext û zorê li ser Kurdan zêde dibe. Êdî cenazeyên eskerên Kurd tîr herêmên Kurdan. Hincet jî nêzî hev in. Xwe kuştiye, ji banê ketiye, qeza derbas kiriye h.w.d. Yek ji wan kuştiyan jî kurê Hec Mislim Mistafa ye. Ji wî re dibêjin kurê wî xwe kuştiye û cenaza wî didin malbatê.

*Bi destpêka sala 2005an re, deh meh di ser Serhildana Qamişloyê re derbas bûbûn, wisa Kurdan nav lê kiribû û êdî rewş ne baş bûbû. Rejîma Sûriyeyê çavsorî li xelkê sivil ê herêmên Kurdî ji Efrînê heta Derikê dikir û heta li serbazên Kurd ên di nava artêşa xwe de jî zext û çavsorî dikir. Êdî cenaze ji bajarên Sûriyeyê yê dûr dihatine Efrîn, Kobanî, Amûdê, Qamişlo, Dirbêsî, Serê Kanî, taxên Kurdan ên li Şam û Helebê, li Reqqayê, li Hisîçayê û li bajarên din jî. (r. 155)*

Rewşena panzdeh salî jî tiving digire destê xwe û tev li YPGê dibe. Çiqas biçûk be jî êdî tevahî Sûriyeyê bûye qada şer. Ji bilî dengê tivingan tu deng nayê bihîstin.

*Êdî pêdivî bi kesên ku şer bikin hebû, atmosfer atmosfera şer bû û nema êdî rê ji bo tişteki din hebû. Li tevahiya Sûriyeyê hêzên çekdar û şervan desthilatdar bûn. Civaka sivil, tevgera siyasî, sazîyên medenî hemû bi şûn de çûn û hatin çewisandin. Xwepêşandan neman, lê êdî şer hebûn. Li herêmên Kurdan jî ev rewş bû. Êdî deng dengê tivingan bû. Nema dengê din hate bihîstin. Dengê xwînê bû. Dengê xwînê jî di serdemên weha de ji her dengê din bilindtir e. Dijmin heye, şer divê û xelas. Şîrove nema lazim in. Gotin hemû vala ne. Şer e û hew. (r. 166)*

Yek jê kurê Hec Mislim jî Baran e. Di nav zarokan de yê herî cihereng ew e. Dêrdê wî yê siyasetê tune ye. Li bexlemeya xwe dide, alkola xwe vedixwe û bi hezkiriya xwe a bi Sosinê re bi reya telefonê bi seatan diaxive. Xeyala wî ya mezin jî tomarkirina cdyek e. Ji bo wê jî divê biçê Hewlerê lê rêya Hewlerê ji Reqayê derbas dibe ya ku niha di destê DAEŞiyên de ye. Li Lewend digere haya wî pê dixîne ku ew ê bê ba wî. Him jî dixwaze Sosina xwe birevîne û berê xwe bide Herêma Kurdistanê ya Iraqê. Bexlemeya xwe û şûşeyek vodka jî bi xwe re dibe. Di rê de DAEŞiyên rê li ber minubusê digirin. Ji ber navê wî yê kurmancî rihdirêjan bi xwe ew wek kafir tohmet dikin. Bi ser de jî bexleme û şûşa vodka yê dibînin. Minubus bêyî Baran diçe. Rihdirêj ew li cîpa xwe dikin û di rê de telefona wî lê dide û telefonê jê digirin. Di nav wênayan de wenyê Rewşenê dibînin di nav cilên YPGyîyan de. Êdî riya vegeerê namîne û bi awayekî hovane serê Baran jê dikin.

DAEŞ her ku diçe nêzî Kobanî dibe. Xelk ji tirsan malên xwe diterikînin û dibin koçber.

*Êdî DAEŞ nêzîk dibû. Ji rojavayê ve ji hêla Cerablûsê ve kişiyên, ji başûr û ve ji hêla Sîrrîn û Eyn Îsê ve daketin, ji rojhilat ve jî ji Til Ebyedê hatin û gind dane ber xwe. Gund yek bi yek û bi lezeke ecêb keştin destê DAEŞ'ê. Di sî û şeş seatan de nêzîkî çarsed gundî çûn.*

*Hin ji xelk bê hemdî xwe vedigeriyan û berê xwe didane Kobanî û nema dizanîbûn ku berê wam ketiye ku? Bi hezaran li ber sînor kom bûbûn, tî, birçî, westiyayî û kêmxew. Gelek ji wan pereyên xwe xistibûn boxçeyên biçûk û qewîn pê girtibûn. Ji kêmxewan dihatin ku bikevin jî lê tirsan ku pereyên wan werin dizîn wekî gur bi çavekî radiketîn û bi yekî jî payî diman. (r. 207)*

Rewşena ku çend roj bû serî li mala xwe nexistibû bi cîpeke doçka li ser bû, tê ber mala xwe. Di cîpê de birayê wî yê gerîla Metîn heye. Dayîka wî, ew hembêz dike û maçî dike. Di wê kêliyê de Hec Mislim jî tê, ew jî digihe ser kurê xwe. Dengê teqînan êdî ji nêz ve tê. Hemê jî bi pîkaba xwe tê ku bav û diya xwe bibe. Ew jî çawa Metîn dibîne ew hembêz dike. Rewşen û Metîn diçin eniya şer û Hemê jî bav û diya xwe li pîkabê dike, berê xwe dide sînorê. Ji ber erebeyan derbasî aliyê din ê sînorê

nakin. Hemê bi diya xwe re li Kobanî dimîne. Hec Mislim jî bi bûka xwe ya heml û bi her du neviyên xwe re derbasî aliyê din ê sînorê dibe.

*Li Kobaniyê nifira mezin ku yekê li yê din bikira ew bû: Pergala te bela biyo. Lê devê gelekane nedigeriya ku wê yekê bibêjin, li dewsa wê digotin: Pergala te bela nebiyo.*

*Pergal!*

*Pergala welatekî bela dibû wê rojê. Ji gundên rojava û başûr û heta navenda Kobaniyê xelk li wê derê kom bûbûn û mîna kerwanekî li pey hev derbasî wî aliyê sînor dibûn. (r. 234)*

Lewendê pêşmerge dema li bavê xwe digere û dibîne ku bavê wî pir bi hêrs e. Lewend kêman jî devê bavê xwe dijûn û gotinên xerab bihîstibû. Lê piştî van meseleyan kengî li wî bigeriya gotinên xerab û dijûnan dikir. Xulkê wî pir teng bûbû. Lewend pir dixwaze wek pêşmerge derbasî nava Kobanê bibe lê gor lihevkinê, peşmergeyên jî wir in, nikarin biçin Kobanî. Lê koma Lewend berê xwe dide eniya şer a li nêzîkî Şingalê ye. Dema êrîş dibin li ser DAEŞiyên li wir bi giranî birîndar dibe û dûre jî rehmet dike. Beriya êrîşê çeperên DAEŞiyên bike û rihê wî bi hestên tolhildanê dagirtiye.

*Dilê Lewend lê da. Pîr bi lez lê da. Êdî ew bi wan dijminên xwe re rû bi rû dibe. Êdî dema tolhildanê ye. Wê heyfa Şingalê jî ya Kobanî jî hilîne. Heyfa bi sedan gundên Kobaniyê ku di du rojan de hatibûn dagirkin hilîne, heyfa warê Êzdiyan ê pîroz hilîne. Yan wê bi ser bikeve yan jî wê axê bi xwîna xwe pak bike. Ev hizr hatin bala wî, diranên xwe bi ser hev de şidandin û tiliya xwe danî ser tetîka tivingê. (Dost, h.b. r. 246)*

Vebêjer îcar projeksiyona xwe dide ser Rewşenê. Ew rojnivîskên xwe yê şer dinivîse ji dildarê xwe Mîran re.

*Ez çiqasî serbilind im ku min tiving rakiriye û piştgiriya vî bajarê xwe dikim. Piştgiriya warê evîna xwe û te dikim. Û berî her tiştî piştgiriya diya xwe û xelkê vî welatî dikim. (Dost, h.b. r. 250)*

Di vê parastinê de ne tenê ye. Ji her derê lê Kurd dijîn hatina ba hev û mil dane hev. Amade ne ku rihê xwe ji bo vê axa pîroz bidin. Yekîtiya neteweya Kurd gihiştiye asteke bilind.

*Min ji bîr kir ez ji te re hinekî qala grûba xwe bikim.*

*Grûba min: Ji Qoserê hevala Nazik Qoserî, ez jê re dibêjim Koçerê, ji Ranyayê hevalê Raperîn, ji Ormiyeyê hevala Zelal Dimdim, ji Hekariyê jî komandarê grûba me Alan Şirnex û ji Efrîn û Derîk û Qamişloyê jî sê heval hene. Ji Kobaniyê ez û du hevalên din in. Bi rastî jî ev heval wek malbata min in. Wan malbata min a koçberbûyî ji bîra mim birine. (r. 251)*

Her ku dere xelesa li dora koma Rewşenê teng dibe û DAEŞiyên xwe nêzî koma wan dikin. Bi wesayîten bombekirî pêş tên. Mixabin gelek hevalên di komê de ne dimirin û yek ji wan jî Rewşen e.

Xanê û kurê xwe li Kobaniyê dimînin bi niyeta sibê dîsa berê xwe bidin sînor û bi pîkaba xwe derbas bibin. Lê wiha nabe derî tê girtin û ew jî li Kobaniyê dimînin. Her ku diçe rewş xerabtir dibe. Heta rojekê DAEŞ digihêje ber mala wan lê bi tesadufî xelas dibin. Mixabin ji hewanê xelas nabin. Diya Hemê di bin betonanan de dimîne. Nikare tiştek jî bike. Hemê cara dawî li bavê xwe digere û êdî xeber jê naye standin.

*Anê amê. Seqif bi ser da ketiye. Hewanek li malê me ket. Anê di bin betonê de, dimrê bavo. Anê dimrê ejî nikam tiştekî bikim. Bavo deng ji anê qut bû. Deng îdina nê. Anê mir bavo. Anêêêê. (r. 324)*

Metîn jî di êrîşeke DAEŞiyên de dimire. Hec Mislîm nikare ji binê ewqas eşan rabe û hişê xwe wenda dike. Eysê bi her dû zarokan û bi halê xwe yê heml li ber xwe dide.

*Xezûrê wê êdî nema vala dibû serê xwe bişo. Kon jê re bûbû mîna rêwîxaneyekê ku tenê lê dinivîya. Hin caran jî şevder dima kesî nizanîbû bi ku de çûye. Sibehê xelk ew li ber sînor di xew de dît. Solên wî di bin serî de, bêjîng di destan de, çend potik û qerpal li xwe gerandine û berê xwe daye Kobaniyê. Rêya wî dirêj bûbû. Egal û des-*

*mal danîbûn û li şûnê şefqeyek dabû serrê xwe. Şefqeya li serî û ew sako û kiras û qayîşa di bin sako de li newqê gerandî û kurkê reş ê bi ser de zêde balkêş bûn. Gelek heval û cîranên wî pê dikeniyên. Hinek jî xemgîn dibûn û dixwestin li ber dilê wî bidin. Lê heyhat. Xemgînê kurmîkek bû ji binê de rehên hebûna wî dixwar. Jana penaberiyê, dîtina wêrana bajêr agirekî nepenî bû qiçeqiç ji giyanê wî dianî. (r. 371)*

Qolinc û jana welidandinê bi Eysê digire. Eysê ji Siyamend re dibêje bira here gazî cîrana Fata Kanî bike. Fatê rewşê fahm dike û diçe Zilxoya pîrik tîne. Qerîna zaroka nûzayî û xortê baz dide tevlîhev dibe. Eysê navê zaroka xwe datîne Hêvî.

*DAEŞ derket. Kobanî rizgar bû.*

*Û bi bayê bezê berê xwe da konên din û hey ew bang dubare dikir. Jinan lîland. Him ji kêfa selametiya Eysê re him jî kêfa bihîstina xebera rizgarbûna Kobaniyê re ku ew bûbû serê pênc mehan li bendê bûn. (r. 374-375)*

Xelkê Kobanî vedigerin bajarê xwe yê wêranbûyî. Eysê jî bi her sê zarokên xwe vedigere. Çi dike nake xezûrê wê pê re venagere. Eysê diçe Mihela Seyda ya ku hê cenaza xwesûya wî di binê betonan de ye. Ji xwe û ji zarokên xwe re di nava kavi-lan de cî çêdike û lê dimîne. Roja makîne tê ji bo cenazeya xwesûya wê derxînin, xezûrê wî jî vedigere. Serê sibehekê gurmegurmek ji derî tê. Çawa derî vedikin çekdarên DAEŞê gulle li odê direşînin. Hec Mislim, Eysê û Zozanê di cih de dimirin. Siyamend jî birîndar e û bi zikxişkê diçe ba zaroka şîrmij. Behna wê bi adetî diçe û tê û di xew de ye. Di nav ewqas miriyan de Hêviya şîrmij, dahatûya neteweya xwe hê sax e. Çi biqewime jî hêvî her tim heye û ew ê her hebe. Roman bi vî awayî diqede.

### **3.4. BÊWAR BRAHÎM: LÎ BÎN SÎWANA XWEZIYAN**

Roman ji 266 rûpelan pêk tê. Cara ewil di sala 2021an de li Stenbolê ji nav weşanên avestayê hatiye weşandin. Edîtoriya wê jî ji aliyê Şener Özmen ve hatiye kirin.

### 3.4.1. BÊWAR BRAHÎM

“Di payîza 1973ê de li Girbawî (Qamişlo) ji dayîk bûye. Xwendina xwe ya seretayî li gund kir. Ji zarokatiya xwe ve mijûlî huner û nivîsandinê bû, lê ji sala 1990î tevli pîşegariya nivîsîna bi zimanê kurdî û erebî bû û pê re jî hewldana berdewamiya xwendina akademî kir. Gelek gotar û helbest di kovar û rojnameyên bi kurdî û bi erebî de belav kir.” (Brahîm, 2021) Berhemên wê yên çapkirî ev in.

1- Nameyek ji bo qedere (helbest, 2002)

2-Li Bin Sîwana Xweziyan ( Avesta, 2021, 266 r.)

3-Payîzokîne Çavşil Ji Dilê Xewnê ( Lîs, 2014, 366 r.)

### 3.4.2. LI BIN SÎWANA XWEZIYAN

Roman pîranî li Qamişlo û dema şerê navxweyî yê Sûriyeyê derbas dibe. Lehengên romanê pîranî nûciwanên kurd in û naverok jî bêguman ramanên wan û bûyerên li dora wan diqewimin in. Yek ji wan xortan Barzan e. Barzan nû ji zindanê derketiye û hêdî hêdî hîni jiyana nû dibe. Sedema girtina xwe bi hezkirina welêt girêdide.

*Diviyabû hezkirina min ji welatê min re ewqasî ne şêrîn ba, diviyabû hinekî kelê ba, an jî zêde şor ba da fişra xwîna min bilind û ez çavtirsandî bûbama û wisa ez ne dihatim girtin û ev dijminahî di navbera min û darên hinaran û destên diya min de çênedibû. (Brahîm, 2021, r. 11)*

Barzan derdike derve ji bo biçê mala Xerîbo. Xerîbo jî li derve ye û dilezîne ji bo zû bigihije malê û Barzan li derve nemîne. Piştî şerê li Sûriyeyê xizanî li nava bajêr zêde bûye. Xerîbo jî dema dimeşe dîmenên feqiriyê dilê wî dieşîne. Bavê Xerîbo jî wek pîrî kesan ji ber şer berê xwe dabû Ewropayê.

*Nikarîbûn min ji vir bibin, xewnerojkên min zora wan birin, ez di himbêza vê xakê de me û ez bêriya wê dikim ku ez jê dûr bikevim wê çi bê serê min? Ev tizbiya bavê min e, rojekê ev tizbî dûrî tiliyên wî neket, lê roja li riya pênaberiye siwar bû newêrîbû bi xwe re bibe, da kes wî bi gunehê terorê tawanbar neke. (r. 18)*

Xerîbo li Bilûro digere ji bo were mala wî. Di rê de rastî Xalê Şerefo tê. Xalê Şerefo kesekî pir feqîr e û ji zarokatî ve karê boyaxkirina solan dike. Sê keç û kurekî wî hebû. Kurê wî li Minbîcê dimire. Herçiqaqas her tim stranana bibêje û rûken xuya bibe jî ji ber lawê xwe î mirî bi ser de jî pirî caran nikare nan bibe mala xwe û zarokên wî birçî dimînin dilê wî diperite. Xerîbo dema ew dibîne, destê xwe diavêje bêrika xwe lê Xalê Şerefo tu car tiştêkî wiha qebûl nake. Xerîbo neçarî ew li ber qehwê dihêle û him dimeşe û him jî difikire.

*Dilopên xunava ku bi bêdengî ji ezman dibariyan, hiştin ku pêkên min bi bêdengî li ser peyarêkên vî bajarî ne dîn û ne hişmend bimeşin. Vê cengê nemerdi bi yek bajarî re nekir, li aliyekî mirov û bajarên ser û ber şehîd ketin, li aliyê din netewe, xak û mirovahî sekeratê dikin. (r. 23)*

Barzan û Bilûro di heman wextî de digihên malê. Dema Xerîbo derî ji wan re vedike û dibîne herdû jî ji ber berfê bûne du hirçên spî û pîrçînî bi Xerîbo dikeve. Li ser viya Bilûro henekan dike û ji Xerîbo re dibê binê serê te germ û nerm e. Xerîbo dizane hevalê wî naxwaze henekan bike, dixwest bi erd û ezman ve bipijiqe û bike qêrîn.

*Barana berf û xwînê bi ser dêmê welatê me de diherike, welatê ku bûye mîna zarokê matmayî, dêmgirniyî û nizane ku mirin diranên xwe lê qîç dike û em bêdeng in em nikarin bilivin. Welatê ku bûye mîna keştiyeke şikestî û di nava bahozên deryayê de windayî dike ku noq bibe û her bê hêvî nabe çavê xwe li peravên felatê digêrîne. (r. 25)*

Di vî beşî de qala çîroka biêş a Ferîd tê kirin. Dawetek li ber mala wan heye û tevde diçin. Di dawetê de bombe diteqe û keça wî Hêla, kurê wî Alan û jina wî rehma met dikin. Ew jî ji mirinê xelas dibe. Helbet li ber jina xwe û kurê xwe dikeve lê êşa Hêla girantir e. Piştî vê bûyerê her tim bi Hêla re diaxive di hişê xwe de.

*Tu çû û te Alan jî bi xwe re bir, Alanên me mane ji windabûnê re, mane ji noqkirinê re mane ji kuştinê re, ev qeder bela xwe ji van Alanan venake her li pey şikenandina wan e. Teqez niha tu û Alan li daweta Hêmin govendê dikin, xwezî hema yek xulekê min te di govendê de bidîta, va ye kirasê te yî pembe li şûna te maye. (r. 31)*

Piştî mirina Hêla êdî nikare li malê rûne. Her serê sibê diçe li ser gora malbata xwe û bi wan re dipeyive. Êdî civata wî bi dînan re ye ji ber ku Hêla pir li wan miqate bû û ji bavê xwe re digot.

*-Yabooo, ev dostên te yê dîn, ji mîletên koledar ku ji zordaran re derin sicûdê paqijtir in, ew weliyên xwedê ne.*

*Min ji te re got:*

*Keça min şaş nebe, ev dîn ji beşek bûn ji wan koledarên ku nikaribûn zora zorê bibin ta zordariyê ew dîn kirin. (r. 35)*

Pir xeyalên Hêla hebû lê ya mezin nivîsîna çîroka bû. Ferîd jî dixwest vê miraza keça xwe bîne cih. Deftera wê girtibû û hatibû ba dînan ji bo çîrokên wan biniwîsîne. Yek ji wan dînan jî Şêxo ye. Şêxo li şamê xwendekar bû. Ew jî dide pêy xewna azadiyê. Ew hesabê şerê bi hemû milîsan kiribû lê tenê tiştê nekiribû. Ew jî dizên azadiyê bû.

*Lêê derba xedar ku ji nişka ve li pişt me ket derba dizên azadiyê bû, em ji wê derbê bê hiş ketin, kêlika me çavê xwe vekir em di binê erdê de bûn. Riya veşerê ji xwe li pişt me şewîtî bû û em jî pê re şewîtîn, yê di bin êşkencê de şehîd ketin, yê reviyên û di konên penaberiyê de dîn bûn û yê bi rê de wînda bûn, tew yê weka min li vir man, ne sax in û ne mirî ne, ne dîn û ne jî baqil in. Dizên azadiyê li her deverê hene hay ji wan hebin, carna ku hişê min bîaqil dibe, gelek tişt tene bîra min. (r. 43-44)*

Piştî taştê dixwin, Barzan, Xerîbo û Bilûro ji bo Avan bibînin, diçin Tirbesîpiyê. Her çar heval bi otomobîlê bakurê Sûriyeyê gund bi gund digerin. Ji ber we jî di roja xwe de venagerin Qamişloyê. Bav û diya Barzan ditirsin dîsa tiştê bê serê wî lê digerin û jê dixwazin êdî vegere. Barzan di dilê xwe de dibêje.

*Tirs, axxx ji derdê vê tirsê, tiştê mala me xerab nekir jê pê ve. Tirs ji rastiye, tirs ji rûbirûkirinê, tirs ji mirinê. Ez ténagihim çawa vê tirsê hêlînên xwe di hinavên me de avakirine? Çi maye em li ser wê û ji bo wê bitirsin? Tirs û taristan şevên xwe bi agirê cengê ronî dikin û seqema zivistanên xwe bi zêmar sazilanên kezêbşewatan germ dikin. (r. 51-52)*

Avan ji Elmanyayê vegeyriyaye welatê xwe. Herkes bi vî tiştî diheyire ji ber ku pîranî kes dixwaze biçe Ewropayê. Avan otomobîlê dide sekinandin û jê pêya dibe. Mistek ax digire destê xwe û behn dike.

*Her bihostek ji xaka me gencîneya almas e, lê em bêxwedî ne, em bi nirxê vê buhabûnê nizanin. Xwediyê zêviyên petrolê parsa çend lîtir mazot dikin, xwediyê zêviyên genim parsa çend kulm ard dikin, yên nehêjane çaroxên bapîrên me kerameta me bînpê dikin, di bazarên xelkê de em mane ji kirîn û firotinê re. Xelk ji min re dibêjin tu dîn î, tu çima vegeyriya? Xelk bi karwanan xwe li deryayên mirinê dixin da bigihên Ewropayê tu piştî çil salî tu li riya vegeerê siwar bûyî, tu ji bo çi hatiyî? Ev hevoka tu çima vegeyriya, min çiqasî diêşîne, zimanê xelkê zêviyên rîman in û li ser pehnayên piştên bê pişt têne çandin û mixabin çiqasî çînîna wan zehmet û zor e. (r. 53)*

Em dikarin bibêjin roman li ser du malbat û xortên wan diçe. Yek ji wan malbatan, malbata Çiya ye. Sê bira ne. Cembelî, Cemîl û Çiya. Her sê bira li heman avahiyê, li qatên cuda rûdinin. Barzan kurê Cembelî yê tenê, xwişkên wî tevde zewicîne. Esrar keça Cemîl e û birayên wê tevde koçber bûne, li ba wan in. Gulan, Îlon û Xeyal jî keçên Çiya ne. Ev malbat ji aliyê gel ve tê hezkirin û di nava xwe de tifaqa wan jî xurt e. Lê piştî şerê li Sûriyeyê jina Çiya dixwaze biçe Ewropayê û ji ber wê jî ew û mêrê xwe keçên xwe pev diçînin. Çiya gefên giran li jina xwe dixwe.

*Bila bi tena xwe biqewire lê berî bînpêka mala min derbas bike wê her sê telaqên wê di destê wê de be. Wey bavoooo, eşqa Ewropa li me xistiye, welatê xelkê ji xelkê re ye. Siwarê li hespê xelkê peya ye, xwedîtina li welatê xelkê windabûn e. Qeeeyyy nişkekî zarokan li wir li me xwedî derkevin êêê jê pê ve dibin zarokên xelkê. Em berdîberdayî bûne, mal û milkên xwe ji xelkê re dihêlin û diçin bin konên parsê rûdinin, bi nan ûzîkê dijîn. (r. 63)*

Her çar heval diçin gundê Girxweziyê ba Mam Babo. Yek ji malbata girîng a romanê malbata Mam Babo ye. Ew malbat bi wêrekî, destfirehî û esilbûna xwe tîn nasîn. Malbateke qelabalix e lê em ê bêtir navê Kovan û Motkayê bibihîsin. Ew ê Barzan li wir rastî hevalê xwe yê zindanê li Kovan were. Em ê ji devê Kovan sedema girtina wî hîn bibin. Wan rojan erdên xwe ji keviran paqij dikirin. Kovan û Felek jî

dildarên hev in. Ew û dotmama xwe Felek ji ber kar behna xwe didin û li ba hev rûdinin. Di wê kêliyê de nîştasihên kembera ereb êriş dibin ser wî lê gule li Felek dikeve û di cî de dimire. Li ser viya diçe heyfa xwe hiltîne û heft mêt ji wan dikuje. Mam Babo çiqas bi ser de hêrs dibe jî Kovan nareve û helbet tê girtin.

*Di wê girtinê de, min xulekekê jî xwe kujer nedît û bi çavê tawanbaran li xwe mêze nekir. Min kirasê cegerdariya bapîrên xwe li giyanê xwe pêça û da pey doza şeref û manê. Min Barzan li wir dît, çend salên wî derbas bûbûn û hê nehatibû dadgehkirin. Ew derket û ez mabûm li benda sêdarkirinê ta êrişekê girt ser zindanê û yên girtî tev reviyân, min jî yek nekir du, yekser min berê xwe da Girxweziyê. (r. 74)*

Dûre Motka jî tê tevlî civatê dibe. Motka birayê Kovan e. Kovan, ew wek rêberê xwe yê jiyana xwe dibîne. Motka ji Barzan re dibêje.

*Barzan, hûn nişên nû kelegerm in, Xwedê dinya di heft rojan de ava kir, hûn dixwazîn welatekî herifî di rojekê de ava bikin. Di dîroka cengan de tiştê herî xerab ku çêkirina derewan, belavkirina gotegotan û dexs û kînê tev di dest ên xwedî berjewendiyên mezin de ne. (r. 79)*

Civat hinek bi wî miqamî didome lê taliya talî em armanca xortan ji devê Motka dibîhizin. Armanca wan avakirina lobiyeke Kurdan e û ev lobî him li hundir him jî li derve bixebite. Destê wan li ser dilê wan e ji ber ku ditirsin Mam Babo henekê xwe bi wan bike lê berevajiyê vî tiştî çêdibe. Mam Babo sond dixwe çî ji destê wî bê ew ê bike û sebebên wî jî wiha îfade dike.

*Li kêleka wan şoreşên çekdarî pêwîst bû şoreşên ramyarî û zanyarî jî derketibana, encax xwendin û zanîn dikarin doza pêvajoya me bi aştiyane bi ser xîne. Îro cengeke bê hedan ev welat daye ber agirê xwe li şûna ku xort sengerên şerekî ne şerê me şehîd bikevin, bila ew xort bibin stêrên ronîdayî ne rijiyayî, encax bi ronahiyê wan ev welatê tarî vêkeve û herifandina wî li ser milên wan ava bibe. (r. 81)*

Wextekî dilê Simîka Sor dikeve birayê Mam Babo. Hema demildest Mam Babo birayê xwe dişîne dervê welêt ji bo ji vê belayê xelas bibe û Simîka Sor jî ji gund diqewirîne. Piştî Simîka dizewice şeş heb kurê wê çêdibin. Her pênc kurê wê

ji hev xerabtir in. Zilm û tahde li xelkê dikin û gelê Qamişlo xwe ji wan dûr dixin. Lê tenê Rêber yê ku zanîngeh xwendiyê ji wan cuda ye û ji kirinên malbata xwe aciz e.

*Ez ji diya xwe hez nakim, tew bav û birayên min ez karim bi salan xwe dûrî wan bikim. Ev kuflet mîna ajalên goştخور in, nikarin bê xwînrijandin bijîn, nikarin bê şer rakevin, şer û pevçûn ji wan re dermanê xewê ye berî razanê vedixwin. Roja kesî xerîb tine be tev li min dibin yek, roja ez ne li mal bim her heft bi xwe şer dikin. (r. 86)*

Motka, Avan, Kovan û Mam Babo berê xwe didin Qamişloyê. Mam Babo di rê de dixwaze biçe li ser gora hevalê xwe Mîrza. Dema diçin goristanê dengê giriye keçikekê tê. Ew keçik Heqnas e û êzidiyê Şengalê ye. Cîranên wan ên Erebbê dibin li ser wan û wê dibin Reqayê. Bi awayekî xwe xelas dike û direve ji bo here ser gora hezkiriyê xwe Behzad. Heqnas difikire ku kurê Mîrza, Behzad miriye ji ber wê jahr vedixwe û li wir ji ser hişê xwe diçe. Xort Heqnasê dibînin û ew dibin erebbê û bi lez berê xwe didin nexweşxanê. Beriya jahrê vexwe him dilorîne him jî derdê xwe dibêje. Nivîskar komkujiya kurdên Êzidî dike beşekî romana xwe û bi awayî dixwaze bîra kollektîf zîndî bihêle.

*Tu bi qedrê riya dûr bike ku nêzîk bibe kêlîkekê serê xwe rake û mêze bike bê birayên te yên misilman çi felek li me gerandin? Dê û dot hetikandin, mêr û law qelandin. Ez çavşînka te yî xwezayî me, ez ji wan re bûm sebî. Sebiya cengên ji bêxwedîtî me, ji Şingala şewîtî min revandin û li Reqaya nedîtî nebihîstî bi cî kirin û mîna ajalekê li ser sing girêdayî xwedî kirin, kevjalên ku diranên wan mîna şîlfên keran û rû bi pirç , can û bedena Heqnasa te talan kirin, çavşînka te yî xwerist vemirandin. (r. 99-100)*

Wexta Îlon li Şamê ye bavê wê û apê wê Cembelî dihatin serdana wê. Apê wê Cembelî dixwest biça gora Selahadînê Eyûbî ji ber ku wî wek semboleke dîroka kurdan dîdit lê bavê Îlon xwe ji ber serdanê dida alî û jê re digot.

*Keko, ti xêra wî li me nebû, bajar û keleh ji xelkê re ava kir û miletê wî hê di koxikên ji kelpîçan de ne, şûr û stêr û balende danîn ser milên serbazên xelkê û milên piraniya xelkên me ji bêr û tenekeyên çîmento kurmî bûn û heqê nanê sibehê bi zor*

*peyda kirin. Dewlet ji xelkê re ava kir û bi çiyarêz li pişta wan, lê em piştîkeştî man tam em felc bûn. (r. 108)*

Koma wan pêşengiyê dide Barzan lê ev jî barekî giran e. Dema ditengije gotinên Kovan ên zindanê tîne bîra xwe.

*Barzan hemberî navê xwe be. Bi erkê barê xwe zanibe, em ne tawnbar in em ne diz in em ne kujer in da em ji ber xwe şerm bikin. Heke kuştinê xwe li ser me ferz kiribe jî em bûn û em ê bibin kujerên dizên xaka xwe. Em dozkarên azadiya dîl in, em parêzerên xaka bêkes û bêxwedî ne, em berxwedêr in di ber çarenivîsa mafê hebûna xwe de. (r. 117-118)*

Derengê şevê deriyê Cembelî lê dikeve. Cembelî kurê xwe şiyar dike û dişîne mala apên wî. Ditirse dibê belkî ji bo Barzan hatibin. Dema dibe sibê bavê wî jê re meselê dibêje. Cihê Behzad dîtine, ew ê mêvanê doh Behzad xelas bike. Çend roj şûnde herkes li Mala Mam Babo dicive. Behzad xelas bûye û ew jî li civatê ye. Barzan û Behzad jî hevalên hev ên zindanê ne. Behzad qala giringiya kurdperweriyê dike.

*Barzan, me rojekê neda pey hizrên komonîst, lê bi hûrbînî me hizir û ramanên wan dixwendin û pê re jî xetîra şoreşgerî û kurperweriyê dil û hinavên me de roj bi roj gur dibû. Em di nav tevgera azadî serxwebûnê de çêbûn û mezin bûn lê rojekê me nexwest ziyan bigihê miletê Sûrî, ku em dihatin girtin laşê me di zindanan de ji lêdanê mîna hêtekî diherifî û em xayin nediketîn, ta zindan bû mala me û me riya mala xwe wenda kir. (r. 144)*

Behzad ji Barzan dixwaze ew jî biaxive ka mafdar e yan na. Barzan jî gotinên Behzad dipejirîne qala giringiya ger meriv nikaribe agirê cîranê xwe bitefîne divê meriv agirê mala xwe ango ya welatê xwe bitefîne, dike.

*Em nijadperestên vê xakê û vî miletî ne, me doza rêveberiya ti êl û olan nekir. Me ala Allah û Ekber bilind nekir. Xwedê nehewcedarî ti alan e bi navê wî li ba bibe, Xwedê nehewcedarî ti artêş û şoreşan e ku hêjar û feqîr, jin û zarok jê re bin qurban.....*

*Di vê cengê de divê em şiyartir û hişmendîtir bin û em jî ji wan ji xwe re nekin derd, ku agir têkeve mala cîranan û vemirandina wî agirî ji me nehat, divê em ber bi mala xwe ve bibezin û hewldana parastina wê bikin da ew agir derbasê mala me nebe. (r. 145)*

Di riya çûna Ewropayê de bavê Xerîbo, jinapa Barzan û dotmama wî Xeyal û çend kesên din ên cîranên wan rehmet dike. Xerîbo jî li ber darbesta bavê xwe pê re dikeve civateke xeyalî.

*Waaa yabooo. Tu bi qedrê wê hezkirina te ji min hez dikir ji her tiştî bêhtir, ji Xwedê re bêje, bila li me bê rehmê, bila dilê xwe li me sayî bike, bila me bi agirê kîn û xezeba zalim û çete û patexuran nesofîne. Ev welat di bin hilgirtina van darbestan de piştqop bûye, heke ew neweste bi Xwedê em westiyên. Tu ji bîr neke yabooo. Me di bîra xwedê de bihêle da em ji bîra vê cengê û vê xezebê derxîne, dibe ku mirin û kuştin ji hinekî xelkên vî welatî jibîr bikin û hinek jiyên li me vegere. (r. 150)*

Mirina Xeyal bondoreke mezin li Îlonê dike. Kovan jî jiber wê naxwaze wê tenê bihêle. Îlon gazinan ji dewleta Sûriyeyê dike ji ber qet kurdan nas nekirin û qebûl nekirin.

*Sûriya. Sûriya Mîletê Sûrî yek in. Vedenga dengên di bîrdanka min li hev vedigere. Me ji her pêkhatiyên bêhtir ji Sûriya hez kir lê ne Sûriya ne mîletê Sûriya ji me hez nekirin, em kurd in û vê kurdûna me em ciyawaz hiştin û deriyê me bi kilîtekê ma. Mezinên me digotin ha ji deriyên pir kilît hebin malan talan dikin. Ji tîrsa vê pîrkilîtiyê û talankirinê me kilîta kurdîniyê di binê rihê xwe de veşart, da ji me nekeve, di bin lêdanên sitemkariyên zalim de neşkê û di rê û şivîlekên koçberiyê de wînda nebe. (r. 164)*

Heqnas û Behzad cara ewil hev dibînin. Behzad biryara destpêkekê nû dide û her dû berê xwe didin derveyî welêt. Di wê navberê de Simîka û zarokên wê dixwazin pêşî li yekîtiyê û şoreşa Kurd bigirin.

*Biranoooo, dilpakiyê li ser kesî nekin. Ne jin, ne mêr û ne zarok. Em zarokên Simîka sor in, bi farisan re faris in. Ferman hatiye mohra kurdîniyêdi goga zemînê nemîne. Zimanê wan seqet bikin, zarokên wan nehên bihêlin, malbatan ji hev tar û mar bikin.*

*Divê ji birçîna bimirin û nabe têr gepek nan bixwin ji xwe feqîrtiya wan diwartirîn çek e di destê me de. (r. 198)*

Piştî êrîşa zarên Simîka Sor û desthildaran; Barzan, Amê Çiya û gelek kesên din tê girtin. Motka pir li ber rewşê dikeve û nizane girtî li ku ne Şamê ne an cihekî din e. Apê Cemîl jî li ber dilê wî dide û qala xetereya şêrê birakujiyê dike.

*Diyar e ev xak û ev welat ji desthilatdariya dagirkeran felat nabe? Dagirkerên me dixwazin me bi hev bidin kuştin, lê bila bizanibin ku em amede ne xwe bi destên xwe bikujin beriya em xwe bi xwe hevdu bikujin. Nikarin bi aqilê me bilîzin û me razî bikin ku şerê birakujî şoreşeke neteweyî ye an civakî an çî be. Yê ku dest têwerdanê di şerê birakujiyê de bike ew bi xwe lîstok e di destên dagirker û faşîstan de û mezintirîn xiyanetê di heqê wî welatî de dike. Doza neteweyî paşdemayî bûye û doza partîtiyê û berjewendîtiya kesane bi pêş de dimeşe, bi rastî heke nêta me ji avakirina welatan re sayî be divê berjewendîtiya vi welatî di ser her tiştî re be. (r. 202)*

Çend roj li ser girtinan derbas bûye. Îlon her nifiran li xwe dike. Çawa destûr daye ku ala rogeş bikeve binê lingan. Yek jê sembola girîng a netewetiyê al e û em dibînin Îlon ji ber al bînpê bûye pir xemgin e. Bavê wê jî bi van gotinan li ber dilê wê dide.

*Keça min wê hizrê neke ku zalim karibin di zordariya xwe de berdewam bin, wê hizrê neke ku ti zor û agir karibin roka ala me vemirînin. Li ser alê netirse keçoka bavê xwe. Vê alê bi barê dehan şoreşên doza azadî û serxwebûna me hilgirtiye ser milê xwe û amade ye ta roja qiyametê di bin barê me û doza me de berz û serbilind bimîne, ti alî nikarin wê ji serkûpên çiyayên dost daxînin û ti dest nikarin wê ji serkûpên çiyayên dost daxînin û ti dest nikarin pêdariya wê bişkînin. (r. 209)*

Esrar ji ber êşa girtinan û bi taybetî ji bo Barzan pir xemgîn e. Ji ber wê destûr ji nexweşxanê dixwaze tê malê. Beriya biçe mala xwe seriyek li mala apê xwe dide ka xebereke xêrê heye an tune ye? Suprîzek li benda wê ye. Apê wê û Barzan hatine berdan. Esrar ji Barzan tika dike, êdî derkeve derveyî welêt. Barzan vê peşniyarê naxwaze carekî din bibîhize.

*Tu keçapa min î, tu giyan û dilê min î, tu xewna jiyana min î. Lêêê, bi xwîna qurbanîyên her şoreşeke me yên tekçûyî û yên serketî, tu careke din qala derketinê ji min re bikî min bihesibîne yekî xerîb ne me hev dît û ne hev bîna, ne tu keçapa minî ne ez kurapê te me. Bihesibîn ez mirî me navê min jî li ser zîmanê xwe bi lêv neke, bi destûra te be û wê çaya fûriyayî di pey min re bîne. (r. 237)*

Xalê Ferîd ji bo rihê Hêla şa bike mala xwe bexşî dibistanê dike. Xerîbo, Avan û Rodî jî dest bi lêkirina dibistanê dikin û Xalê Şerefo jî dikin nobedar. Apê Çiya, Gulan û Îlon dişînin derve ji bo xebatan. Yên mayî jî di hundirê welêt de dişuxulin û roman bi van gotinan bi dawî dibe.

*Wê rojek bê, çerxa felekê fetl û dewra xwe yî çep ji ser me biguherîne û biharên me bê şer û bê xwîn û bê agir wê aram û dilşad û geşbîn bibin. (r. 266)*

### **3.5. JANA SEYDA: JINEKE MIRÎ LI CIHANGIRÊ**

Roman ji 140 rûpelan pêk tê. Cara ewil di sala 2021an de li Stenbolê ji nav weşanên avestayê hatiye weşandin. Edîtoriya wê jî ji aliyê Şener Özmen ve hatiye kirin.

#### **3.5.1. JANA SEYDA**

“Di sala 1976an de li Amûdê hatiye dinyayê. Ji destpêka salên 90î ve şî’r û nivîsên wê di gelek kovar rojnameyên kurdî û erebî de derketine. Berhemên wê yên çapkirî ev in.” (Seyda, 2011)

- 1- Şeva Dawî (helbest, 2001)
- 2- Destê Sibê (helbest, 2004)
- 3- Berêvarî (helbest, 2007)
- 4- Palyaço (helbest, 2011)
- 5- Jineke Mirî Li Cihangirê (roman, 2021)

### 3.5.2. JINEKE MIRÎ LI CIHANGIRÊ

Roman ji du milên cuda pêk tê. Milê ewil çîroka Evînê ye. Evîn li avahiyeke çarqatî ya li taxa Cihangirê dimîne. Evîn derbara rabirdûya xwe de tu tişt nizane û xewnerêşkan dibîne. Evîn bi du xebatkarên mafên mirovan Hêlîn û Pedroyê îspanî dimîne. Milê din jî çîroka Dîlberê ye. Beşek çîroka Evînê vedibêje beşa din çîroka Dîlberê vedibêje. Di destpêka romanê de Evîn li nava ciyan dirêjkiriye û difikire.

*Her ku dixwazim bersivê wê wergirim, berê xwe didim cîranên xwe yê malê û ji wan dipirsim: Ez kû û kengî hatime vê derê? Zimanên xwe dibin û tînin lê di dawiyê de bersiva min nadin! Ya rast ez jî nema zêde pirsên wiha ji wan dikim tevî ku hebûna min î li vir weke nîşana pirsê ye, her ku diçe mezin dibe? Mezintir dibe?.. (Seyda, 2021, r. 9)*

Rewşa Evînê a giyanî nebaş e. Dermanê psîkolojîk jî bi kar tîne û her tim xewnerêşka jineke mirî dibîne.

*Nayê bîra min çawa min dest dabû laşê wê yê sar weke sarincokê, an çawa min destê xwe li ser damara stûyê wê danîbû yê ku te digot qey jê bûye û ji laşê wê hatiye veqetandin an kirasê wê yê gulgulî ku ji xwînê bûbû rengê tenha, an gustîlka wê ya ku tiliya girdekî de bû. Nizanim jî çawa ez ji wê odeyê reviyabûm û hilkişiyabûm jor û dema li jor çav li Hêlînê ketibûm, min xwe avêtibû hembêza wê û jê re mesele gotibû, lê wê ji min re dubare kiribû ku tişteki wiha tune ye, paşê dermanê min î xewê dabû min, ez jî razabûm heta niha. (r. 10)*

Evîn bi tirkî nizane û Evîn di wê baweriyê de ye ku Helîn û Pedro di nava xwe de li ser wê dipeyivin û hin tiştan jî ji wê vedişêrin. Wê sibê Evîn beriya biçê kenarê deryayê dixwaze oda xwe û alavên xwe bide hev. Ewil dixwaze çentê xwe veke û kincên xwe di dolabê de bi cî bike. Çente vedike û li rastî kirasekî bixwîn tê.

*Ev kirasê min e ? Na... Ev kirasê wê ye, yê Wê jina ku li bexçe di wê odeyê de miriye! Min kiras dawêşand, bîneke tûj û tund jê fûriya û tişteki ji nav ket, ringîniyek ji zemîna odeyê hat. Min xwe tewand da ku lê bigerim, gustîlkek bû, min ew rakir, qatekî qalind ji gemarê li ser çêbûbû. Çavên min xewirîn, madê min ji bîne li hev ket.*

*Min bi nenûkên xwe ew qat xeritand, min gustîlk xiste nav destê xwe û xweşik lê nêrî; di hundirê wê de wiha dinivîsand: Evîn... (r. 15)*

Di beşa din de em Dîlberê nas dikin. Dîlber biçûka malbata xwe ye û sê bi-rayên wê yên din jî hene. Bavê wan Sadiq û diya wan jî Hemdiye ye. Kembera Ereb wek her kurdên Sûriyeyê bandoreke mezin li jiyana wan dike û ew jî neçar dimînin warê bav û kalên xwe biterikînin.

*Miradê Nûrî, bapîrê Dîlberê, axayê gundekî ji gundên Dêrikê bû, ew bi dotmama xwe Besnayê re zewicibû û tenê lawek jê re çêbûbû, navê wî kiribû Sadiq. Piştî çêbûna Sadiq bi du salan, hikûmeta Sûrî ew ji gund derxistibûn û erd û milkên wî li ser hinek malbatên ereb belav kiribûn. Dema bendav li ser çemê Feratê hate avakirin; xanî û zeviyên erebên wê deverê ji ber bilindbûn û firehbûna çem noq bûbûn. Êdî cih û war ji wan re nemabûn, lê hikûmeta Sûriyeyê bi comerdiyeye nesebiqê ew ereb di war û erd û zeviyên kurdan de bi cih kirin û kesê ku qebûlnekir ji wê deverê bi darê zorê hate derxistin û bi hukmekî îlahî yê wê hikûmetê hin kurd li Cezîrê bê milk û mal man û hinên din jî bê nasname. (r. 18)*

Miradê Nûrî piştî neçar dimînin ku ji gundê xwe derkevin, tên li derdora Şamê bi cih dibin. Mirad û malbata xwe bîstvaniya bîstanên malbateke ereb a dewlemend dikin. Malbat tenê dawîya heftê tên bîstanê. Odeyeye biçûk jî didin bîstvanên xwe. Herçiqaq Mirad şikuriya xwe ji halê xwe re bîne jî xanima wî Besna ne di heman fikrî de ye û ji devê wê em giringiya nasnameyê dihesin.

*Mirovê bê nasname bê hebûn e, van bênamûsan em bênamûs kirin, lê wê Saqidê me heyfa me ji wan hilîne, wê erdê me vegeîrîne, tu qet xwe aciz neke, wê ev tir ji wan ereban re nemîne! (r. 18)*

Lê jiyana li gor dilê Besnayê nameşe û Sadiq dibe sût. Hînî araq û jinên laş-firoş ên Şamê dibe. Bavê wî jî ji ber ihtîmala ger bizewice belkî aş bibe, diçe keça cîrana xwe Hemdiyeyê dixwaze. Ev tişt ne bi dilê Sadiq e û ew jî wê şevê lêdixe, diçe Şamê ji bo araq û keçikan. Dema Sadiq nîvê şevê vedigere tê mala xwe. Lê dema ew li derve ye ji ber kabloya elektrîkê agir derdike. Li ser banê wan jî depoya mazotê heye. Agir digihe wir û piştî jî xwe bera nav odeya malbata Miradê Nûrî

dide û herdû jî rehmet dikin. Bavê Hemdiye Sadiq ew tenê nahele û li mala xwe dizimîne. Dema herkes belav dibin û dema Sadiq û ew tenê dimînin jê re dibêje. Em jê têdigihijîn ku zewaca ji neteweya xwe girîng tên dîtin.

*Doh rehmetyê bavê te hate ba me û Hemdiye ji te re xwest, me jî negot, na, ma emê zaveyekî ji te baştir li ku bibînin.? Malûm e em ji warên xwe derketine û di nav xerîban de ne, wê ji bo me pir zehmet be ku em malbateke kurd î ji xwe razî weke ya we bibînin û keça xwe bidinê. Keça min bê dê mezin bûye û êdî di temenê zewacê de ye, me qelenê wê jî çil hezarî xwestibû, lê em merivê hev in birazê, piştî mirina dayik û bavê te bi vî awayî em jî barê te giran nakin, hema tu dikarî bi destê wê bigrî û wê bibî. (r. 23)*

Xwediyê bexçe çarsed hezar lîre heqê xwînê dide Sadiq û wî jî çil hezar dide bavê Hemdiyeyê. Sadiq êdî li wir namîne û mala xwe bar dike dibe Qasiyûnê. Ew tax jî nêzî Şamê ye. Di serî de Kurd li wir pir in heta penaberên Felestîni werin.

*Kurdên ku jiyana xwe bi wan re parve dikirin hinekî xwe ji wan disitirandin, piraniya wan jî ji kurdan aciz bûn ji ber ku wan kurd weke cihûyan didîtin û kêneke mezin li hemberî wan hilgirtibûn bi behaneyê ku kurd dixwazin Israîla duyem ava bikin. Lê vê meselê nikaribû rê li ber evîne bigirta, gelek keçên kurd bi xortên felestîni re zewicîn û gelek xortên kurd keçên felestîni ji xwe re anîn. (r. 25)*

Di beşa din de Evîn çiqas bi îddîa bibêje ku ev kiras û gustîlk bixwîn in jî Hêlîn ew qaneh dike ku tiştê wiha tune ye û li ber çavên wê wiha çêdibin. Di beşa din de jî beriya Mirad û Besna rehmet bikin, çûyina wan a xwazgîniyê tê qalkirin. Besna hin kaxêz dide Hemdiyeyê. Em ji gotinên Besnayê carekî din têdigêhijin ku Şamê wek welatê xwe nabîne û dilê wê hertim li ser gundê xwe ango welatê xwe ye.

*Keça min, ev tapûyên erd û milkên min in, hemû milkên min î ku hene tê de hatine nivîsandin û mohrkirî ne. Ji destê min bigire bila kesek nebîne, eger Sadiq bibe zîlam bide wî an na bide zarokekî xwe, bila milkê me ji kesekî re nemîne, çi dibe bila bibe divê keda bav û kalên min ji gewadan re nemîne! Ku em bênamûs bimirin jî bila nêviyên me serbilind bijîn, sîrrê di navbera min û te de jî bila ev keça min, veşêre bila ne Sadiq û ne kesekî din pê bihese. (r. 36-37)*

Evîn dixwaze şêva vî bajarî jî bizane, ji bo wê jî diçe ba Helînê û jê destûrê bixwaze. Evîn ne li odê ye û skrîna komputerê wê vekirîye. Li ser skrînê jineke di nav xwîn de mayî heye û Helîn bi hêrs tê komputer digire. Evîn şaşmayî dimîne ji ber ku jina li ser skrînê, ew jina ku di xewnerêşkên xwe de dibîne ye. Lê Hêlîn dibê karê min li ser xebata jina ye lewma normal e fotografên bi vî awayî li ba min hebin. Dûre Helîn ji ber bêdestûr ketiye oda wê bi ser wê de hêrs dibe. Evîn jî derdikeve û li ber derî rastî Gul tê. Gul jî keçikeke Kurd e û li qata dawiyê rûdine. Evîn pirsê barê dibe û dîre bi hev re diçin. Demeke pir kin de civata wan tijî dibe. Lê bala Evînê dikişîne ku yên li masê giş kurd in lê bi tirkî diaxivin.

*Civata li ser maseya me hemû kurd bûn, lê herkes bi tirkî diaxivî û carcaran ji bo min diqulipandin li ser qanala zimanê kurdî. Civata me ji kurdên Wanê Amedê, Mêrdînê, Mûşê, Bîngolê, Rihayê û kurdên ku li bajarên Tirkan bi cih bûbin pêk dihat.*  
(r. 41)

Dîlber evîndarê lawikê cîranan dibe û bi awayekî bavê wê jî dibihîze. Li ser viya pir hêrs dibe û li keça xwe dixê û wê dide leşkerekî kal ê payebilind wek jina sêyem. Her tişt di demeke pir kin de tê halkirin û Dîlbera panzdeh salî dibe bûk. Beriya ereba bûkê here, diya wê nivîstek bi zincîra zêr pêvekiri dide keça xwe.

Evîn dixwaze biçe ji Gulê bipirse, ji bo çî Hêlîn ew bi dû wê de şandibû. Ji bo wê jî diçe qata dawî û li deriyê Gulê dide û jê mêrikek derdikeve û pişt re sê heb din jî ji deriyên din. Her çar êrîşî wê dikin û Evîn jî bi qêrîn û girî heta jê tê direve û li jêr rastî Pedro tê. Di nav herikîna romanê de Evîn pirî caran xewnerêşka him jineke mirî û him jî çar zîlamên erîşkar dibîne.

Helbet zewac ne bi dilê Dîlberê ye û ji mêrê xwe jî hez nake. Ew jî vê kêmasiyê bi xwendin û gerê tije dike. Beşa felsefê qezenc dike û dest bi xwendinê dike. Evîn jî biryar dide ku li Engîn bigere. Engîn, wê şeva ku bi Gulê re çûbû barê naskiribû. Lê digere û ji bo hevdîtînê li hev dikin. Evîn nizane ew ê çawa li Metroyê siwar bibe û ji şansê wê re xortek û jinikeke îxtiyar bilêta wê dibirin û jê re dibin alîkar. Dê û kurik jî ereb in û herdû jî ji Sûriyeyê ne. Her dû alî jî ji welatê xwe hatine dîrxistin lê îcar cudahiyeke heye. Ereba li vir ne neteweya desthilat in lê dîsa jî hînbûyînen kevn zû bi zû nayê jibîrkirin.

*Em bi hev re ketin rê, diya kurik pirsê navê min kir, min got: Navê min Evîn e. Pirsê ku ez ji kû me, min got: Ji Sûriyeyê û pirsê dîyem ew bû ku ez kurd im an na. Min got: Erê kurd im. Min bala xwe dayê ku tahlîyek kete ser rûyê wê dema min gotina “erê kurd im” got. Kîna ku li her du çavên wê peyda bûbû weke agirekî bûtîna wê êrîşî ser rûyê min kir, min jê pirsî: Tu jî kurd î? Got: Xwedê neke. (r. 73)*

Ew û Engîn li kafeyê rûdinin. Dûre zilamek din jî tevî civata wan dibe. Dema Engîn Evînê dide nasandin, dibê ew ji Rojavayê ye. Ev nav Evînê diheyirîne.

*Min xwest ku sererast bikim, min got: Ez ji Sûriyeyê me ne ji Rojava! Engîn got: Evîn gelek tişt hene tu nizanî, vêga navê bakurê rojhilatê Sûriyeyê cihê ku kurd lê dijîn Rojava ye. (r. 75-76)*

Evîn zorê dide Engîn ji bo ku behtir tişt jê derbara xwe de hîn bibe. Engîn jî mecbûrî tiştê dizane, jê re dibêje. Rojekê doktor Ahmet Kaya tê ba wan û ji wan alîkariyê dixwaze ji bo jineke bîrewerîya xwe dest daye û ji bilî navê xwe tiştêk nizanê. Doktor dibê ger li malekê bimîne, ew ê çêtir be. Li ser viya Pedro û Hêlîn dibin dilxwaz ji bo wê biezimînin. Helbet van agahîyan ji bo Evînê ne bes e û biryar dide ku biçê ba Doktor Ahmet Kaya.

Li Sûriyeyê şer dest pê kiriye. Derdor tê bombekirin an jî teqînên mezin pêk tê. Diya Dîlberê pir dixwaze zarokêk ji keça wê çêbe lê Dîlber guh nade vê daxwazê. Rojekê diya wê zarokêkî şeş mehî ya ku hemû malbata wî di bombebaranê de miribû, tîne ji bo Dîlberê. Dilê wê pir bi zarokê sêwî dişewite û piştî pevçûnên mezin bi merê xwe zarok dide qebûlkirin û di deftera malbatê de jî dide qeydkirin. Dîlber navê zarok datîne Alan. Şerê li nava Sûriyeyê gur dibe û hêdî hêdî herkes dibe koçber û welatê xwe diterikînin. Di serî de birayên Dîlber diçin Beyrûdê. Piştî diya wê jê re Alan tîne û jê jî xatir dixwaze ji bo ew ê biçin Beyrûdê. Lê piştî çend rojan de vera dê û bavên wê lê ne bombebaran dibe û kevir li ser kevir namîne. Çi dike nikare hîn bibe ku ka bav û diya wê xelas bûye an na. Teseliya wê Alan e û alîkarê wê Hogir e. Hogir kurdekî ji kobanê ye û leşkerîya xwe li ba merê Dîlberê dike. Piştî şer giran dibe rojan merê wê nayê malê û bi her tiştê Dîlber û Alan re Hogir eleqedar dibe. Dilê Dîlberê dikeve Hogir lê Hogir bersîveke erênî nade wê. Mêrê wê sibehê zû bi Hogir û zilamekî din tê. Dibê dive demildest ji Sûriyeyê birevin an jî bi malbatî em ê

bên kuştin. Mêrê wê pasaport û zêr didin wê û jê re dibêje qet meraqan neke min hertişt plan kiriye. Hogir, Alan û Dîlber ji bo ji Sûriyeyê derkevin didin ser rê.

Evîn ji ba Engîn vedigere diçe Cihangirê. Ji xwe re li cafeyekê rûdine û li ser xwe difikire lê çî jî bike nikare tiştê ji rabirdûya xwe bîne bîra xwe. Vedigere ba Hêlîn û Pedro. Ji wan re dibê ez ê sibê biçim ba Doktor Ahmet Kaya. Evîn dema li Îstiklalê dimeşê dîsa xewnerojkan dibîne. Li ber derî zilamek dibîne û zilam jê pîrsa navekî dike û ew jî dikeve şikê ku ew kes polîs e û daye pey wê. Bi awayekî xwe davêje pasajê bi tesadufî rastî Gulê tê û Gulê ew qaneh dike ku kes li pey wê tune ye.

Rêya ereba Dîlberê wan ji aliyê kesên çekdar ve tê birîn. Li pasaportê dinêrin û ew kesên çekdar jî hevalên mêrê wê ne. Ew kesên çekdar ji bo behna xwe bidin, ew dibin mala xwe. Li wir Hogir qala xwe û evîndara xwe Evînê ji Dîlberê re dike. Li zanîngehê çawa dilê wan dikeve hevdu lê piştê Evîn çawa diguhere û berê xwe dide nav refên hêzên çekdar ên Kurd.

*Mirov rojê carekê tê guhertin; doh hez dikir û îro hez nake, doh sax bû îro miriye. Fikrên mirovan, fîzîka wan, awirên wan, hest û evîn û kîn û vîna wan her di guherandinê de ye. Min biryara xwe daye û bi vê biryarê qedera xwe û gelek jin û keçên weke xwe diguherim, ez bi doza welatekî ve hatime girêdan û heta ev welat neyê rizagarkirin wê girêdana min bi kesekî din ve tunebe. (r. 116)*

Dîlber fahm dike ku Hogir hê jî ji Evînê hez dike û ev rewş dilê wê diêşîne. Bi ser de Hogir jê re dibêje, kesê ku plana derxistina wê ya ji Sûriyeyê organîze bike Evîn bi xwe ye e û ev bêtir dilê wê diguvêşîne. Li gorî planê Evîn û hevalên wê, ew ê Alan, pasaport û zêrên wê ji pêşiya wê derbasî Tirkîyê bikin û dema gihan hevdu jî Alan û eşyayên wê bidinê. Bixwe mêrê Dîlberê jî plana li Tirkîyê çêkiriye. Dîlber têdigihije ku Hogir pê re nayê. Hogir jê re dibêje ku Evîn mafdar e ku mirov her tim tê guhertin. Hogir ew ê li welatê xwe li Kobanê bimîne ji bo axa xwe biparêze.

*Diya min û xwehên min reviyar, war terikandin, bajerê min li ber kêr û şûrên zigurdan weke berxikekî hate şer jê kirin û hertiştên me, heta bi gora bavê min tune kirin, min jî xwe bi çîrokên pozbilindiyêke bêwate dixapand! Wan hertiştê me talan kirin, wêran li her deverê çêkirin, lê Kobanê bi saya kobaniyan ma, bi saya kesên ku weke*

*min xwe veneşartin û nereviyan! Ez ê vegerim da ku tiştê mayî winda nekim û di serî de giyanê xwe. (r. 126)*

Evîn diçe ba Doktor Ahmet Kaya lê bersiva pirsên xwe nabîne. Doktor jê re qala başiya jibîrkirina tiştan dike.

*Doktor wisa berdewam kir: Ez çima van tiştan ji te re dibêjim Evîn? Min got: Ez nizanim! Got: Derfeteke te heye ku tu vê stresê qet neji; rabirdûya te nayê bîra te û pêşeroja te serbixwe ye, ne girêdayî tiştêkî bihuriye, tu ji me hemûyan bişanstir î, tu tenê dikarî di roja xwe ya îro de bijî...ji ber vê jî baş bijî Evîn. (r. 129)*

Evîn û hevalên wê tîn ber ereba Dîlberê. Hogir, Alan ji hembeza Dîlberê digire dide hembeza Evînê. Dîlber û Hogir jî ji bo biçin li ber deriyê sînorê dikevin rê. Hogir tiştêk ji Dîlberê dixwaze.

*Dîlber daxwazeke min ji te heye. Û bi wê hevokê re gustîlkek ji tiliya xwe derxist û dirêjî wê kir: Vê gustîlkê bide Evînê. Dîlberê jê re got: Ez ê çima bidimê, ma te wê nebînî? Hogir got: Di vî welatî de mirov nizane bîstekê din çî biqewime, ji ber vê yekê ez rica dikim, vê gustîlkê bide Evînê, min navê wê li ser neqîşandiyê, bila biza-nibe ku ew her tim bi min re bû. (r. 135)*

Dîlberê gustîlka Hogir dixwe tiliya xwe û berê xwe dide deriyê sînorê. Beriya ku xatir bixwaze ji çar aliyan çar zilamên rihdirêj bi tekbîran êrîşî wan dikin. Serê Hogir jê dikin û tecawizî Dîlberê dikin. Her çar êrîşkar li erebeyan siwar dibin û laşê Hogir ê bêserî jî bi xwe re dibin. Dîlberê xwe diavêje li ser serê Hogir û dixwe hambêza xwe û dûre ji ser hişê xwe diçe. Wê rojê kes wan nabîne lê sibeha din grûbek ji komeleyeke mafê mirovan li gel bijîşkên bê sînor di wir re derbas dibin.

*Tirs û xirecîreke mezin ketibû nava grûbê. Doktorek nêzî Dîlberê bû, destên wê yên girêdayî vekirin û ew qulipandine ser piştê, serê Hogir ji ber sînga wê gindirî û xwîna wî li ser kirasê wê ma. Doktor destê xwe li ser damara stûyê wê danî û gazî ekîba xwe kir: Weriiiiin, weriîin jinik dijî, bilezînin. (r. 137)*

Demildest Dîlberê dibin konê nêzî wir danîbûn. Em di vî beşî de têdigêhêjin ku Evîn û Dîlber heman kes in ya ku çîrokên wan ji du milan ve dihat vegotin. Dîlber

pir ji Hogir hez dikir û dixwest bibe yara wî. Dîlber ji xwe pir bawer bû ku ew ê qet neguheriya û her tim ji Hogir hez bikira. Ji ber van fikran dema hêdî hêdî tê ser hişê xwe, tenê navê Evînê tê bîra wê.

*Dengin ecêb ji Dîlberê derdiketin digot: Dayê! Doktor Ahmet veciniqî û ji Hêlînê re got: Ew dipeyîve, bi kurdî dipeyîve. Doktor beziya ber serê wê û jê pirsî: Dengê min tê te? Dîlberê got: Erê. Doktor got: Navê te çi ye?*

*Dîlberê di nav taya xwe de û zingîniya ku ji serê wê dihat, li ber kenarê mirinê an li ber kenarê jiyane got: Navê min... navê min... navê min Evîn e.*

*Piştî ku Dîlberê got navê min Evîn e ji ser hişê xwe çû. Roja din ekîba doktor Ahmet Kaya ku ji Hêlîn, Pedro, Gul û Engîn pêk dihat Dîlber hilgirtin û bi minûbûseke taybet vegeriyan Stenbolê. (r. 138)*

Hêlîn ji Dîlberê re dibê Doktor Ahmet ji me xwest ku tiştek ji te re nebêjin heta tu hinek werî ser hişê xwe. Hêlîn beriya xatir ji Evînê bixwaze çentê wê dide. Çentê ku tê de kirasê bixwîn û gûstîlk hebû. Helîn nivişta bi zîncîreke zêr ver girêdayî jî dide wê. Pişt re niviştê vedike û tê de tapûyên erd û malan dibîne û di wan kaxezan de navê Miradê Nûrî li ber çavên wê dikeve. Biryar dide ku ji vir dest bi lêkolîna rabirdûya xwe bike û roman bi vî awayî diqedê.

## ENCAM

Me bi rêya vê xebatê xwest ku di romanên Kurdên Sûriyeyê de Rabêja Neteweperweriyê vekolin. Di her pênc romanên me de cihwar herêma Kurdan bû. Bi saya wê jî em bi rehetî têgihîştin ku Kurd xwe çawa pênase dikin û 'yê din'ên Kurdan kî ne. Di hemû romanên de 'yê din' ên Kurdan Ereb bûn. Ev jî tiştêkî asayî ye ji ber li Sûriyeyê neteweya desthilat Ereb in. Kurd xwe ji Ereban vediqetîne û xwe xweyîyê erdê xwe dibînin. Ereben li herêma Kurdan dijîn piranî xebatkarên dewletê ne – mamoste, karmend, leşker û muxaberat h.w.d- û Kurd wan ne wek xweyîyê van erdan wek mêvan û biyanî dibînin. Bixwe di her çar romanên de Kembera Ereb mohra xwe li naverokê xistiye. Di *Tirsa Bê Diran* de gundê Mûsa jî dikeve ber pêla kembera Ereb. Di *Piçek Jiyan Qetek Asîman* de vebêjerê me gazin ji xwedê dike ji bo çi li hemberî zilmê bêdeng e û erdên wan jî dikeve ber Kembera Ereb. Di *Jineke Mirî Li Cihangirê* de kalik û pîrika Dîlberê ji ber kembera Ereb koçberî Şamê dibin û ji axa xwe dûr dikevin. Lê heta mirinê jî tapûyên erdê xwe vedişerin û beriya bimirin jî didin bûka xwe, bûka wan jî dide nêviya wan. Di *Li Bin Sîwana Xweziyan* de jî dotmama Kovan ji aliyê niştecihên kembera ereb ve tê kuştin û helbet ew jî heyfa xwe ji wan hiltîne. Di romanên de dewleta Sûriyeyê, Kurdan wek perçeya xwe ya eslî nabîne û wan wek cihuyan dibîne ango bi çavê dijminahî nêzî Kurdan dibe û ev jî nasnameya Kurdî bêtir xurt dike.

Nivîsîna Kurdî bi serê xwe helwesteke neteweyî ye. Bixwe ziman wek hêmanekê neteweyî derdikeve pêş. Yek jê girîng a cudahiya Kurd ji Ereban jî ziman e. Di her pênc romanên de di avakirina nasnameya neteweyî de ziman amûreke girîng e. Ewîl lehengên romanên dema biçûk in fahm nakin çima zimanê wan qedexe ye pişt re jî li hemberî vê qedexeyê têdikoşin. Di romana *Kobanî* de Jan û hevalê xwe bi dizî zarokan hînî xwendin û nivîsîna Kurdî dikin. Di *Li Bin Sîwana Xweziyan* de lehengên romanê dixwazin dibistaneke Kurdî vekin. Di *Piçek Jiyan Qetek Asîman* de dema vebêjer li Amûdê dersê dide ji ber li polê bi Kurdî dipeyive giliyê wî tê kirin. Di *Jineke Mirî Li Cihangirê* de, Dîlber dema li Tirkiyê ye fahm nake hevalên wê yên Kurd çima bi zimanê xwe neaxivin. Tiştê herî balkêş jî Dîlberê bireweriya xwe wenda kiribe jî û tiştê neyê bîra wê jî zimanê xwe ji bîr nekiriye. Bi saya zimanê wê

herkes dizane Kurd e. *Tirsa Bê Diran* de Mûsa bi xwe her tim hewl dide dîroka ne-fermî ji zarokên Kurd re vebêje û Qado jî rojnivîskên xwe bi Kurdî dinivîse. Bi ser de Leyla ji bo pirsê evînê wiha bersivê dide Mûsa: ‘Cihê Kurdî qedexe be, xewnên me jî qedexe ye û ji ber wê jî evîn xewn e.’

Di her pênc romanên de jî metafora hevpar tirs e. Tirsa ji rejîm, partiya teka-ne, muxaberat, zindan, mamosteyên fermî, serok û kuştinê. Ne pêkan e ku li welatê dîktator hebe tirs jî tune be. Bi ser de ev welat bi polîtîkayên şovenîst birêve biçe. Tirs ji bo endamên neteweyên kemar dibe reflekseke jiyânî. Bixwe di *Tirsa Bê Diran* de Mûsa xwe wek ‘zarokê tirsê’ û welatê lê dijî jî wek ‘welatê tirsê’ bi nav dike. Di *Piçek Jiyan Qetek Asîman* de vebêjer tu car fahm nake li hemberî koçerên ereban bav û kalên wan çima ewqas tirsonek in. Li gorî vebêjer dewleta nû bi awayekî pergali tirsê di dilê wan de bi cî dike. Dema vebêjer mezin bibe ew ê jî bi vê tirsê re rûbirû bimîne û bêgavî welatê xwe biterikîne. Di *Kobanî* de dema Jan di nav kavilan de digere û tirsên wî yên zarokatiyê tê bîra wî û dibêje: ‘Em jî di nav beriya tirsê de mezin bûn. Giyanên me bi tirsê hatine avdan. Bi dilopiya şîr a yekem re me tirs jî mêt.’ Di *Li Bin Sîwana Xweziyan* de serlehengê me Barzan tirsê dê û bavê xwe fahm nake û sedema malxerabiya neteweya xwe bi tirsê girê dide û qet fahm nake û tirs çawa hêlînê xwe di hinavên wan de çêkiriye. Di *Jineke Mirî Li Cihangirê* de, Dîlber herçiqas bîreweriya xwe wenda kiribe jî mixabin tirsê ji bîr nekiriye. Piraniya caran him di xewnerojkên xwe de him jî xewnerêşkên xwe de zilamên rihdirêj êrîşî wê dikin. Lê cihên tirs hebe bi awayekî dîyalektîk berxwedan jî derdikeve holê. Di *Tirsa Bê Diran* de Mûsa piştî bûyerên Qamişlo bi serhildana gel re diheyire. Fahm nake kesên ji bo mirîşkekê yan ji bo du kiruşan gef li hev dixwarin îro tev bûne yek û peykerên tirsê yek bi yek hildiweşînin. Di *Piçek Jiyan Qetek Asîman* de, vebêjer qala cejna roja hatina Baasiyan dike û vê rojê çawa Êzîzê Herzan û Ezîzê Îbo mirinê didin ber çavên xwe. Her du xort mîkrofonê ji berdevkê partiya tekane digirin û dirûşmeyên kurdewar diavêjin. Di *Li Bin Sîwana Xweziyan* de serlehengê me Barzan xelasiya ji tirsê û taristanê di agirê cengê de dibîne. Di *Jineke Mirî Li Cihangirê* de, Hogir ji bo welatê xwe biparêze, biryar dide li Kobaniyê bimîne.

Di her pênc romanên de metaforeke hevpar a din jî sînor e. Ji ber ku cihwarên romanên yan Qamişlo yan jî Amûdê ye ango bajarên nêzî sînorê ne. Leheng tu car

mantiqa telên dirêyî û sînorê fahm nakin. Serxet jî wek binxet wek erdnigariya Kurdan tê dîtin. Sînorên bi pênûsê hatiye xêzkirin nayê nas kirin. Ji ber vê êşê di *Tirsa Bê Diran* de Mûsa mejiyê xwe diçelqîne û dikeve pêy Sykes û Pîcotê ji bo heyfa xwe hilîne. Vebêjerê *Piçek Jiyan û Qetek Asîman* piştî telên direyî tê danîn û bêyî pasaport çûyin qedexa dibe, êdî nikare biçe gora kalê xwe û merivên xwe. Ji ber hêrsa telên dirêyî lehengê vebêjer ê zarokatiyê qaçaqxîyê navdar Ferecê Şexo Koro ye. Di *Kobanî* de Hemzirav wek eslê xwe ji Qersê ye û ji ber tevli serhildana Şêx Seîd bûyê direve binxetê û heta mirinê jî bi hesrata serxet diêşe. Him di *Li Bin Sîwana Xweziyan* de him jî di *Jineke Mirî Li Cihangirê* de gazin ji sînorên çêkirî tê kirin.

Hersê roman *Li Bin Sîwana Xweziyan, Jineke Mirî Li Cihangirê û Kobanî* piştî sala 2012an hatine nivîsîn. Di sala 2012an de herêmên Kurd lê dijîyan ket destê hêzên Kurd. Ji ber wê di van hersê romanên de leheng dixwazin li welatê xwe bimînin û şer bikin ji bo azadiya xwe. Di *Li Bin Sîwana Xweziyan* de, bi ser de Avan ji Elmanyayê vedigere welatê xwe ji bo xizmeta neteweya xwe bike. Ji ber wê piraniya kes bi çavê dîn lê dinêrin ji ber çawa xweşiya Elmanyayê berdaye hatiye nav xizani û şer. Li gorî Avan Elmanya ji bo perehezan, bêkesan, şevwaran û rêwindayan re xweş e. Di *Li Bin Sîwana Xweziyan* de derketina derweyî welat wek şermekî mezin tê dîtin û lehengên dixwazin biçin Ewropayê giş jî di behran de difetisin. Di *Jineke Mirî Li Cihangirê* de, Dîlber ji ber jina fermanerekî muxalif a Sûriyeyî ye bêgav e derkeve derveyî Sûriyeyê. Lê Hogir ji bo giyanê xwe biparêze biryar dide tevli hêzên Kurd bibe û bajarê xwe Kobaniyê biparêze. Bixwe Evîn him dev ji zanîngehê û bi ser de dev ji dilketiyê xwe Hogir berdide û diçe tevli hêzên Kurd dibe. Di *Kobanî* de roman ji du cihokên cuda ve diherike. Cihoka ewil çîroka nivîskar bi xwe ye û ji ber wê jî vebêjer Jan li Wuppertala Elmanyayê dijî. Cihoka din çîroka malbata Hec Mislimê Hemzirav e. Him kurê wî Metîn û keça wî Rewşen Kobaniyê naterikînin û Kobaniyê diparêzin. Lê romanên din de her du serleheng enînivîsa nivîskarê xwe dijîn û bêgavê derdikevin derveyî welêt. Di *Tirsa Bê Diran* de Mûsa fahm dike ew ê bê girtin bi awayekî xwe digihîne Elmanyayê, di *Piçek Jiyan û Qetek Asîman* de vebêjer jî bi heman saîkan berê xwe dide Fransayê. Bi awayekî zelal em dibînin ku romanên piştî salên di 2012an de hatine nivîsîn de êdî leheng li ser axa xwe dimînin û li ber xwe didin.

Kurtasî em gihîştin encama ku Kurd xwe ji Ereban cuda dibînin û yek jê se-dama girîng jî zimanê wan e. Sînor jî di çavê lehengên romanana de çêkirî ne. Di nava romanana de simbolên netewetiyê -al, sirûd, şexsiyetên neteweyî h.w.d.- jî zêde zêde hatine bikaranîn. Ji ber van tespîtan em dikarin bi eşkere bibêjin ku romanên Kurdên Sûriyeyê di nava xwe de rabejê xurt a neteweperweriya Kurd di hundirîn.



## ÇAVKANÎ

- Ahmedzade, H. (2004). *Ulus ve Roman*. (wer. A. Z. Gündoğan) İstanbul: Pêrî.
- \_\_\_\_\_ (2011). *Romana Kurdî û Nasname*. (wer. F. Adsay) İstanbul: Avesta.
- Alakom, R. (2011). *Xoybûn Örgütü Ve Ağrı Ayaklanması*. İstanbul: Avesta.
- \_\_\_\_\_ (2012). *Eski İstanbul Kürtleri*. İstanbul: Avesta.
- Alan, R. (2013). *Folklor û Roman -li dor texeyyulên berê reçên îroyîn-*. İstanbul: Peywend
- Altuğ, S. (2012). *Dünden Yarına Süriye Kürdistanı*. (M. Yeğen, Hevpeyvîner) Kürt Tarihi Dergisi j. 3.
- Altuğ, S. (2013). *Berê Sînor Nebû Serxet û Binxet Yek Bû*. Kürt Tarihi Dergisi j. 4,
- Anderson, B. (2020). *Hayali Cemaatler*. (wer. İ. Savaşır) İstanbul: Metis.
- Aydoğan, İ. S. (2014). *Guman2*. İstanbul: Rûpel.
- Barth, F. (2001). *Etnik Gruplar ve Sınırları*. (wer. A.Kaya & S.Gürkan) İstanbul: Bağlam.
- Bourse, M. (2009). *Mezliçe Övgü*. ( wer. I. Ergüden) İstanbul: Ayrıntı.
- Bozarıslan, H. (2005). *Yazılı Kürt Tarihi Söylemi Üzerine Bazı Hususlar*. amd. A. Vali dnd., *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri* (r. 35). ( wer. F. Adsay & Ü. Aydoğmuş & S. Kılıç) İstanbul: Avesta.
- Brahîm, B. (2021). *Li Bin Sîwana Xweziyan* . İstanbul: Avesta.
- Breuilly, J. (1993). *Nationalism and the State*. Manchester: Manchester University Press.
- Celîl, C. (1998). *1880 Kürt Ayaklanması: Şeyh Ubeydullah Nehri* . İstanbul: Perî Yayınları.
- Dost, J. (2017). *Kobanî*. İstanbul: Dara Yayınları.
- Ergün, Z. (2017). *Nerit û Helbest*. İstanbul: Nûbihar.
- Hobsbawm E.. (2017). *Milletler ve Milliyetçilik*. (wer. O. Akınhay) İstanbul: Ayrıntı.
- \_\_\_\_\_. (2020). *Giriş: Gelenekleri İcat Etmek*. E.Hobsbawm & T. Ranger amd. (wer. M. M. Şahin) İstanbul: Agorakitaplığı.
- Eriksen, T. H. (2002). *Etnisite ve Milliyetçilik*. (wer. E. Uşaklı) İstanbul: Avesta.

- Fuccaro, N. (2012). *Sömürge Yönetimi Altındaki Suriye'de Kürtler ve Kürt Milliyetçiliği: Siyaset, Kültür ve Kimlik*. S. Verroj dnd., *Geşepêdanên Rojhelatanavîn, Sûrye û Kurdistana Rojava* (r. 87-118). İstanbul: Doz.
- Gellner, E. (1992). *Uluslar ve Ulusçuluk*. (wer. B. Ersanlı & G.G. Özdoğan) İstanbul: İnsan.
- Hassanpour, A. (2005). *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*. (wer. İ. Bingöl & C. Gündoğan) İstanbul: Avesta.
- Husên, F. (2014). *Piçek Jiyan Qetek Asiman*. İstanbul: Avesta.
- Jameson, F. (1986). *Third World Literature in the Era of Multinational Capitalism*. Social Text j. 15.
- Jusdanis, G. (1998). *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür Milli Edebiyatın İcat Edilişi*. (wer. T. Birkan) İstanbul: Metis.
- Jwaideh, W. (2009). *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi*. (wer. İ. Çekem & A. Duman) İstanbul: İletişim Yayınları.
- Kedourie, E. (2004). Orta Doğu'da Etnisite, Çoğunluk ve Azınlık. amd. M. J. Esman & I. Rabinovich dnd., *Orta Doğu'da Etnisite, Çoğunluk ve Devlet* (r. 47). (wer. Z. Avşar) İstanbul: Avesta.
- \_\_\_\_\_. (2017). *Avrupa'da Milliyetçilik*. (wer. Haluk Timurtaş) İstanbul: Köprü Kitapları.
- Lucas, G. (2017). *Roman Kuramı*. (wer. C. Soydemir) İstanbul: Metis.
- Maalouf, A. (2012). *Ölümcül Kimlikler*. (wer. A. Bora) İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.
- Malmîsanij, M. (2006). *Türkiye Ve Suriye'de Kürtçe Kitap Yayıncılığının Dünü Ve Bugünü*. İstanbul: Vate.
- McDowall, D. (1996). *Kürtler*. (wer. Z. İnanç) İstanbul: Avesta.
- Montgomery, H. (2007). *Suriye Kürtleri 'İnkâr Edilen Halk'*. (wer. Ü. Aydoğmuş) İstanbul: Avesta.
- Natali, D. (2009). *Kürtler ve Devlet: Irak, Türkiye ve İran'da Ulusal Kimliğin Gelişmesi*. (wer. İ. Bingöl) İstanbul: Avesta.
- Olson, R. (1992). *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları Ve Şeyh Sait İsyanı (1880-1925)*. (wer. B. Peker & N. Kıraç) Ankara: Öz-Ge.

- Onen, R. (2018). *Ziman Ê Netewesazê-Lêhûrbûnek Li Ser Kovara Hawarê*-. İstanbul: Peywend
- Özkırmılı, U. (2016). *Milliyetçilik Kuramları*. Ankara: Doğu Batı.
- Pertev, R. (2018). *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî (1898-1946)*. İstanbul: Avesta.
- Schmidinger, T. (2016). *Suriye Kürdistanı'nda Savaş ve Devrim Rojavadan Sesler, Analizler*. (wer. S. Altınççek) İstanbul: Yordam.
- Seyda, J. (2011). *Palyaço*. İstanbul: Avesta.
- \_\_\_\_\_. (2021). *Jineke Mirî Li Cihangirê* . İstanbul: Avesta.
- Smith, A. D. (2013). *Milliyetçilik, Kuram- İdeoloji-Tarih*. (wer. Ü. H. Yolsal) Ankara: Atıf.
- \_\_\_\_\_. (2017). *Etno-Sembolizm Ve Milliyetçilik*. (wer. B. F. Çallı) İstanbul: Alfa Araştırma.
- \_\_\_\_\_. (2017). *Milli Kimlik*. (wer. B. S. Şener) İstanbul: İletişim.
- Somersan, S. (2004). *Sosyal Bilimlerde Etnisite ve Irk*. İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi.
- Taştekin, F. (2016). *Rojava:Kürtlerin Zamanı*. İstanbul: İletişim.
- Tejel, J. (2015). *Süriye Kürtleri*. (wer. B. Koç) İstanbul: İntifada.
- Temo, M. (2012). *Rûpelên Zemîna Welatekî Bê Welat. amd.S. Verroj dnd., Geşepêdanên Rojhelata Navîn, Sûrye û Kurdistanana Rojava* (r. 31-86). İstanbul: Doz.
- Vali, A. (2013). *Kürt Tarihi Kimliği ve Siyaseti*. (wer. İ. Bingöl) İstanbul: Avesta.
- Yıldırım, K. (2015). *Kürt Tarihi Ve Coğrafyası-1*. İstanbul: Şemal.
- Yusiv, H. (2006). *Tirsa Bêdiran*. İstanbul: Avesta.
- \_\_\_\_\_. (2017). *99 Morîkên Belavbûyî*. İstanbul: Peywend.
- Zaza, N. (1994). *Bir Kürt Olarak Yaşamım*. Sweden: (wer. A. Karaçoban) Mezopotamya Publishing.
- Zeraq, D. (2018). *Bêjara Neteweparêz Di Kovara Hawarê De*. Ankara: Lîs.

## Çavkaniyên li ser Înternetê

Hür, A. *Selahaddin Eyyubi'nin Çocukları: Suriye Kürtleri.*

<https://www.marmarayerelhaber.com/ayse-hur/29288-selahaddin-eyyubinin-cocuklari:-suriye-kurtleri> (dîroka jêgirtinê: 15-12-2021)

Sebrî, O. (2003, 06). *Osman Sebrî/ Bîranînên Min.*

<http://www.amude.net/epirtuk/osman-sebri-biranin.pdf> (dîroka jêgirtinê: 10-10-2021)

